

# NŮDEM

No 34 2000

Kovara



# NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî



Xwedî û berpirsiyarê giştî

Chief Editor

## Firat Cewerî



Hejmar: 34 sal 9

Havîn: 2000



Şerdên abonetiye (salek)

Swêd: 240 Sek

Skandinaviya: 280 Sek

Ewrûpa: 100 DM

Amerîka, Australîa,

Kanada: 50 \$

Institution: 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê:

Louis Janmot (1814-1892)



Çap:

Nina Tryckeri



Pergala bergê û rûpelan:

Nûdem



Adres:

NÛDEM, Box: 177

177 23 Järfälla-Sweden



E-mail: nudem@telia.com



Tel û Fax: 8-580 131 62

8-583 564 68

Malpera Nûdemê:

www.welcome.to/nudem

# NAVEROK

- 4 Rola Cafêyên kulturî ❖ **FIRAT CEWERÎ**
- 6 Cafê Nûdem ❖ **SOHBETEK LI SER WERGERÊ**
- 24 Kengê em ê bêne ba hev ❖ **BERKEN BEREH**
- 25 Bê ravekirin ❖ **ROJEN BARNAS**
- 26 Întelektuelên kurd û lobizm ❖ **S. SULEVANI**
- 31 Welatê kurdan ❖ **ŞAKIR EPÖZDEMİR**
- 34 Berê min ketiye Xozatê ❖ **ARJEN ARÎ**
- 36 Ergativ ❖ **S. UNUS**
- 43 Piçik piçik dijîm ❖ **ÎRFAN AMÎDA**
- 45 Ziman xweş be ❖ **ŞAKIRÊ B. SOREKLÎ**
- 46 Tewang di zimanê kurdi de ❖ **MÛRAD CIWAN**
- 60 Strana biharê ❖ **KAWA NEMIR**
- 61 Di bêdengiya şevê de ❖ **LORÎN STRAN**
- 63 Li Bahdînan havîneke germ ❖ **NEJDET BULDAN**
- 72 Yekîtiya kurdan ❖ **SILÊMAN ALÎ**
- 76 Gundo ❖ **SERKAN BIRÛSK**
- 79 Bîra Dinyayê ❖ **ŞEREFXAN CIZÎRÎ**
- 89 Zerê min de mendê rêçê awiranê to ❖ **ROŞAN LEZGÎN**
- 90 Hevpeyvîn bi Sûzan Samancı re ❖ **ABIDÎN**
- 94 Dayîka Hîvda ❖ **SUZAN SAMANCI** Wergêr: **SERKAN BIRÛSK**
- 97 Gaziyek ji qederê ❖ **BÊWAR ÎBRAHÎM**
- 99 Hehecikên payevaniya te ne ❖ **MERVANÊ KELEŞ**
- 105 Ewrê reş ❖ **FIRAT CEWERÎ**
- 109 Rev -2- ❖ **SILÊMAN DEMIR**
- 119 Jana hezar salan ❖ **JÎR DILOVAN**
- 120 Rênasans ❖ **RÊNAS JIYAN**
- 122 Derbe ❖ **SALAHATTÎN BULUT**
- 125 Keça delal Mereş ❖ **ZERDEŞT HACO**
- 126 Ij we ra wişt ❖ **PERWÎZ CÎHANI**
- 130 Beşa pêşîn: Qirden ❖ **YAQOB TILERMENÎ**
- 136 Kitêba Arjen Arî ❖ **S. DEMIR**
- 139 Bi kurtî danasîna kitêban ❖ **NÛDEM**

# ROLA CAFÉYÊN KULTURÎ



*Kultur bi riya vekirina Cafêyan geş dibe*

Oscar Wilde

## FIRAT GEWERÎ

**M**e di hejmara 33an de bi navê "Café Nûdem" îlaneke biçûk dabû. Vê îlanê bala gelek xwendevanên me kişandibû û meraq kiribûn bê Café Nûdem çi ye, heger Café be, li ku vebûye û mirov çawa dikare xwe bigihîniyê. Gelek kesan jî bawer kiribûn ku Café Nûdem li Diyarbekirê vebûye û loma kêfxweşiya xwe anîbûn zimên. Rast e, min gelek caran bi devkî û


nivîskî behsa Café Nûdemê kiriye. Ji destpêkê ve armanca me ew bû ku em bi weşandina kovara Nûdemê re li Diyarbekirê Cafêyeke kulturî jî vekin. Dema ku ez behs dikim hê destpêka salên 90î bû. Me haziriya xwe welê kiribû, me ê Nûdem li Diyarbekirê derxista û bi wê re jî Cafêyek bi navê *Café Nûdem* vekira. Cafêya ku em lê difikirin, ne celebê qehweyên welêt bû. Wê ew jî mîna qehweyên welêt bibûya cihê hevdîtîne, lê wê hevdîtîneke cihê ba. Wê bibûya meydana fikir û ramanên cihê, meydana kultur û edebiyatê, navnîşana çavkaniya afirandina berhemên nemir. Wê Café Nûdem di navbera Rohilat û Roava de bibûya pira têkilî û danûstandinan. Wê li wir fikir bihata afirandin, fikir bihata mînaqêşekirin. Wê bîngêhê entelektueliyeke nûjen ku berê wê bi salên 2000î ve ba li wir bihata avêtin. Wê Nûdem jî li wir derketa, li Diyarbekirê... Ji ber ku di dîrokê de hertim kovar, rojname û

kitêbên kurdan li derveyî sînorên welêt, li biyanîstanê derketine û kapasîteya entelektueliya kurdî di sînorê surgunê de fetisî ye û loma di civata me de birînên kûr vebûne. Me dixwest em bi gavin nû ve tradisyonê bişikînin û vî zimanê ku di kirasê belengaziyê de jar û dîl hatiye hiştin, ji nû ve wejînin, xwîneke nû bidîne û bi awayekî spehî û xemilandî li xwediyên vegefrînin.

Li gelek welatan siyaset, felsefe, edebiyat û huner li Caféyan hatine minaqeşekirin û ji Caféyan berê xwe dane civatê. Loma, Caféyan gelek caran xewên karbidestan li wan revandine û ew di nava tirsê de hiştine. Hê di salên 1670ê de li Londrayê birêvebirên hukûmetê bi îddîyên ku li Caféyên Londrayê siyaset tê minaqeşekirin û di encama minaqeşeya siyasî de rexneyên tûj li hikûmetê tên girtine, wan avêtine ser hin Caféyan û azadiya wan bi sînor kirine. Herçiqaq li Venedîgê di sala 1645, li Londrayê di sala 1652 û li Parîsê di sala 1672an de Cafê vebûbin jî, lê Caféyên ku paşê li Viyanayê vebûne bêtir kulturî bûne; navnîşana şair, çîroknivîs, romanivîs, gotarnivîs û rojnamevanan bûne. Gelek şairan li Caféyan şîrên xwe dinivîsandin; an jî şîr, çîrok û gotarên di kovar û rojnameyan de dihatin weşandin, li Caféyan dihatin nixandîn, li Caféyan li ser wan dihat minaqeşekirin. Li gora çavkaniyên nivîskî di sala 1900ê de li Viyanayê hezar û dused Cafê hebûne. Li gelek ji van Caféyan rojnameyên çendrûpelo û kovarên edebî derdiketin. Wekî din gelek ji van Caféyan aboneyên bi sedan kovar û rojname bûne. Di sala 1913an de Cafê Central ya li Viyanayê aboneyê 251 kovar û rojnameyên bi zimanên cihê cihê bûye.

Belê, armanca me vekirina Caféyêke weha bû.

Lê ez nizanim ka gelo em ê rojek ji rojan bikaribin bingehê fikreke weha li welêt bavêjin an na, lê qet nebe em niha dikarin li Cafê Nûdema xwe ya mitewazî ku li Jakobsberga Stockholmê ye û cihê çûyin û hatina nivîskar û entelektuelên kurdan e, dest bi sohbet û gotûbêjên li ser mijar û babetên cihê bikin. Me di vê hejmarê de dest avêtiye wergerê. Ji ber ku yek ji armancên Nûdemê jî bi riya wergerê geşkirina edebiyata kurdî û vejandina zimanê kurdî ye. Mêvanên me yên ve hejmarê Elîşêr, Emîn Narozî, Serdar Roşan û Xebat Arîf e. Van wergêrên kurd her yekî di warê xwe de bi çendan berhem wergerandine zimanê kurdî. Lê em dizanin bi çendan wergêrên kurd yên din jî hene ku kedeke mezin dane wergerê û bi çendan kitêb wergerandine zimanê kurdî. Mixabin, ne mimkin e ku mirov di rûniştinekê de hemû pisporên şaxekî bicivîne, lê wê rûpelên Nûdemê ji nêrîn û fikrên wan re vekirî bin.

Heta hejmareke din û mijareke din bimînin di xweşiyê de... 



## ***Café Nûdem***

**FIRAT CEWERI:** Belê, ev sohbeta me ya pêşî ya Café Nûdemê ye û em ê di rojên pêş de li ser babetên cihê sohbetên cihê li dar bixin. Lê mîna cenabên we jî pê dizanin ev rûniştina me ya pêşî li ser wergerê ye.

Ez dixwazim em sohbeta xwe bi pirsra "werger çi ye?" dest pê bikin. Pirsra min ne ji yekî re ye, lê ji hemû civatê re ye. Kerem bikin...

**ELIŞÉR:** Weger gava mirov tişteki ji zimanekî werdigerîne zimanekî din e. Lê ez dixwazim vê jî bibêjim, mîna ku zimanzanan jî dane xuyakirin, gava mirov ji zaravayekî werdigerîne zaravayekî din, ew nabe werger. Bi vê ve girêdayî, tiştê ku ez jî dikim ne werger e; tişteki di navbera tîpguhêzî û wergerê de ye.

FC: Baş e, heger ne werger be, çi ye?

E: Ez nizanim tu navî lê bikim, lê li gora nêrîna min gava mirov ji karê min re bibêje werger şaş e, wek min got, tişteki di navbera werger û tîpguhêziyê de ye.

FC: Yanî mîna rehmetyê Sebrî Botanî digot, tu "nan bi nanî dixwî".

E: Dibe ku mirov navê tîpguhêziyê lê bike çêtir e.

FC: Lê tu ne bi tenê tîpguhêziyê dikî, tu di şûna hevoksaziya soranî de ya kurmancî bi cih dikî.

E: Rast e, gava ez hevokeke soranî mîna ku heye biguhêzim, di kurmancî de tu maneyê nade, li gora hevoksaziya zaravayê kurmancî şaş dibe. Ez wê hevokê diguhêzim kurmancî, yanî ez bi awayekî adapteyî kurmancî dikim.

**SERDAR ROŞAN:** Werger ne ew e ku mirov bi tenê ji zimanekî wergerîne zimanekî din, gelek ziman hene ku zaravayên wan hene. Gava mirov ji zaravayekî wergerîne zaravayekî din, ew jî dibe werger. Mirov dikare navê wergera ji zaravayekî bo zaravayê din lê bike.

FC: Hin fikir hene ku wergera ji zaravayekî bo zaravayê din şaş dibînin. Mîna hûn dizanin zimanên welatên Skandinavyayê mîna zimanên serbixwe tên dîtîn. Yanî swêdî, norwecî, danmarkî, îslândî. Zimanê finî dûrî van zimanan e lê evên din kêm zêde mîna hev in, carinan ji zaravayên kurdî jî bêtir nêzîkî hev in. Loma hin alim û zanayên van zimanan wergera ji zimanekî bo zimanê din rast nabînin. Ew dixwazin kitêbên wan bi zimanên orjînal di navbera van welatan de belav bibin. Heta mirov gelek caran li kitêbfiroşên Swêdê pêrgî kitêbên bi zimanê danmarkî û norwecî jî tê. Lê hinek vê fikrê şaş dibînin û dixwazin xwendevan bi riya wergerê ji zimanên cihê cihê bixwînin.

**EMÎN NAROZÎ:** Baş e, mîna tê zanîn ziman jî tînguhêzin. Di hin zimanan de guhertinên ewqasî pir çêdibin ku nivîşk ji nivîşê din fêm neke. Wek em bêjin bi zimanê osmanî û tirkîya îro. Gelo mirov dikare ji teksteke ku ji zimanê osmanî wergeriyabe tirkîya îro navê wergerê lê bike?

SR: Bi ya min ew ne werger e. Mirov nikare ji wê re bibêje werger. Ew mirov tekstekê di ber çavan re derbas dike. Wek ku mirov teksteke kurmancî ya kevin di ber çavan re derbas bike û hebekî zimanê wê zelal bike, bike ku nivîşê îro jê fêm bike.

FC: Hin hevalên din jî hene ku bi karê tîpguhêziyê dadikevin, lê em ê sohbeta xwe bi tenê di wergera ji zaravayekî bo zaravayê din de bi sînor nekin. Berî ku em derbasî wergera bi giştî bibin, ez dixwazim ji Xebat Arif bipirsim. Kek Xebat, gava tu berhemên ku ji soranî li kurmancî hatine wergerandin dixwîni û wan didî ber hev tu çî kêmanî an biserketinê tê de dibînî?

**XEBAT ARIF:** Bi ya min tiştê ku kek Elîşêr dike, ew cûrekî wergerê ye, ger ne werger bi xwe be jî, celebekî wergerê ye. Ji ber ku ew ne bi tenê tîpguhêziyê dike, lê werdigerîne, adapte dike, gava berhema ku kek Elîşêr wergerandiye li xwediyê wê were vegerandin wê xwediyê wê jê fêm neke.

FC: Ez dixwazim em vegerin destpêka pirsê xwe. Pirsên mîna edebiyat çê ye? Felsefe çî ye? Şiir çî ye? Roman çî ye? Çîrok çî ye? bi salan e tînen kirin û tînen minaqeşekirin. Gelo werger çî ye? Çima pêwîstî bi wergerê hatiye dîtin?

SR: Werger ew e ku mirov tiştêkî, teksteke edebî, felsefî an jî teknîkî ji zimanekî werdigerîne zimanekî din. Yanî şaxên wergerê yê cihê cihê hene. Wergera romanê heye, ya çîrokê heye, ya şîrê heye; an jî wergera tekstên fakta heye. Lê divê zanebûna mirov di derbarê van şaxan de hebe. Divê haya wergêrê romanê ji romanê, ya wergêrê çîrokê ji çîrokê û ya wergêrê şîrê jî ji şîrê hebe. Herweha kesên tiştên fakta werdigerînin divê haya wan ji fakta hebe. Herçî wergera berhemên edebî ne bi awayekî din jinûvenivîsandina wan e. Divê ew berhem kêma zêde bişibe berhema zimanê orjînal.

E: Tiştên ku min xwendine û tiştên ku di bîra min de mane, berî zayînê bi hezar û heştased salî wergerê li Babîlê dest pê kiriye. Ew jî wergera fermanên hukumdaran bûn. Ji ber ku hingî li Babîlê gelek milletên cihê hebû û gelek ziman dihatin axaftin. Ji bo ku hukumdar bikaribe qanûnên xwe bigihîne hemû millet û zimanên cihê û qanûnên xwe bi wan bide qebûl kirin, wî ew qanûn werdigerandin zimanên cihê.

FC: Werger karekî cidî ye, berpirsiyariyeke cidî jê re divê. Şaşiyêke ku di wergerê de were kirin dikare bibe sebebên gelek serêşî û zeraran. Gelo gava mirov bi karekî weha cidî dadikeve, divê mirov li çî miqatebe? Di wergerê de divê mirov çî bingeh bigire?

EN: Herçiqas îro li ba me werger ew e ku tu tekstekê ji zimanekî wergerîne zimanekî din, an jî kitêbekê ji zimanekî wergerîne zimanekî din, lê di eslê xwe de wergerê berî wê dest pê kiriye. Yanî wergera devkî berî ya nivîskî dest pê kiriye. Wergerê, di navbera zimanên cihê de wek tercumanîyekê dest pê kiriye. Di dema kevin de, di wextê misrî, akadî û sumerîyan de gava wan milletên din dîl girtine



hewcedariya wan bi wergêran jî çêbûye, wergêr gihandine ji bo ku bikaribin qanûnên xwe bi wan bidin qebûlkirin û herweha wan hîn nîzama welêt û leşkeriya welêt bikin. Wekî din jî ji bo ku wan adapteyî civaka xwe bikin, bi riya wergerê ew bi kultura xwe jî perwerde kirine. Bi kurtî, wergerê hê berî nivîsê dest pê kiriye.

FC: Van gotinên seydayê Narozi tiştêk anî bîra min. Mîna hûn dizanin di swêdî de du gotin hene "tolk" û "översättare". Tolk ew e ku mirov bi devkî ji zimanekî werdigerîne zimanekî din. Yanî gava kurdekî ku bi zimanê swêdî nizanibe here nexweşxanê û yekî din jî pê re here derdê wî yê bi kurdî wergerîne zimanê swêdî da doktor nexweşiya wî fêm bike. An jî yek here dikanekê û bi zimên nizanibe lê yekî din ji dikandêr re wergerîne û pê bide fêmkirin.

Lê ji aliyê din ve jî "översättare" heye ku berhemekê ji zimanekî werdigerîne zimanekî din. Bi ya min ya dawî ye ku mirov dikare jê re bibêje werger. Yanî wergera ku mijara me li ser e. Em dibînin ku di swêdî de ji bo wergerê du gotin hene, lê ez bawer dikim di kurdî bi tenê yek heye, an jî ez tenê bi yekê dizanim.

Tiştê ku tu behs dikî nabe edebiyat, ew wergera bi devkî ye; ya gotina nenivîsandî ye...

EN: Dema ku ez behs dikim, hingî edebiyata nivîskî tunebû, an jî pir kêmbû. Hingî jê re wergera gotinê, çîrokê, edebiyatê digotin, ez nizanim; lê şiklekî wergerê bû. Yanî wergera ku niha tê kirin tunebû, li gora texmîn û zanîna min ew vê paşeyê derketiye. Elîşêr jî behsa wergera di dema Babîlan de kir, lê wergera ku em îro dizanin, bi derketina tekstê, bi derketina nivîsê dest pê kiriye. Dema incîl hat wergerandin, dema ereban berhemên Greklenda antîk wergerandine zimanê xwe. Di-be ku berî wê demê jî werger hebe, lê li gora zanebûna min wergera ku em îro dizanin wê demê dest pê kiriye. Di wergera devkî de, ku em navê tercumanîyê lê dîkin, xebateke zêde jê re navê, lê herçî wergerandina teksteke nivîskî ye, an jî wergerandina berhemeke edebî ye, jê re xebat û zanebûn divê, jê re ked divê, fikir divê...

SR: Ji bo ku ev mijar baş were fêmkirin, ez dixwazim nixteyêke girîng destnîşan bikim, bi kurtî behsa ferqa di navbera "tolkning" û "översättning" de bikim. Niha tolkning ew e ku tu informasyona ji zimanekî werdigerîni zimanekî din. Tiştê girîng di vir de ew e informasyona ku tê wergerandin were fêmkirin. Lê di tekstên edebî de ne weha ye. Hîn qaîdeyên taybetî ji bo tekstên edebî hene. Di wergerandina berhemên edebî de form heye, stîl heye, termînolojiya ziman heye, esetêrîka tekstê bi xwe heye. Divê haya mirov ji van hebe, lê di "tolkning" de ne welê ye. Wek min got "tolkning" guhastina informasyonê ye. Çi ye, tu ê herî doktor û bi zimanê xwe bibêji serê min diêşe, wê yê din jî wergerîne bêje serê wî diêşe; yanî ev

bi tenê wergerandina informasyonê ye. Lê di tekstên edebî de ne ewçend hêsan e, gelek faktorên ku divê mirov li ser bifikire hene. Lê dawiyê kêm zêde herdu jî digihîjin hev, herdu jî wergerandina zimanekî bo zimanê din e.

XA: Di wergerê de ferqek di navbera teksta prosa de û ya şîrê de heye. Mirov rûdine û berhemeke prosayî; çîrok an jî romanekê werdigerîne. Lê wergera şîrê ne ewçend hêsan e. Herkesî li ser li hev kiriye ku şîr nayê wergerandin, lê ji nû ve tê nivîsandin. Loma êdî ew ji wergerê derdikeve, dibe "talkning". Talkninga di vir de, di maneya şiroveya kurmancî de ye. Yanî wergêr wê şîrê wernagerîne lê şirove dike.

EN: Belê, wek şirovekirina felsefê, kitêbên pîroz... Yek Sartre wernagerîne, lê şirove dike. Di vir de şirove manekirina teksta orjînal e, tefsîra wê ye. Ya dudan jî, ez nabêjim werger û talkning yek e. Lê ez dikarim bibêjim bingehê wergera nivîskî ya devkî bi xwe ye.

FC: Tercumeya bi maneya wergera devkî hê jî li Kurdistanê heye. Dibe ku me hemûyan jî wergera bi vî babetî kiribe. Gava kurê malbatekê biçûya eskeriyê an jî devereke dûr û ji malbata xwe re nameyek binivîsanda, ger dê û bavê lêwîk nexwende bûna, wan bang zarokê xwende dikir û name pê dida wergerandin. Lê bi ya min ev nabe edebiyat, nakeve beşê edebiyatê.

E: Rast e, ferqek di navbera werger û şirovekirinê de heye. Werger ew e ku mirov bi tekstê ve girêdayî dimîne, lê şirovekirin, mirov li gora xwe, li gora têgihîştin û zanebûna xwe dike.

FC: Hin nivîskar hene ku baweriya wan bi wergêran nayê, loma xwe hîntî zimanin din dikin û berhemên xwe bi xwe werdigerînin, an jî bi wî zimanî dinivîsînin. Du nimûneyan ku tavilê tîn bîra min Beckett û Kundera ye. Digel ku fransî ne zimanê herdiwan e jî lê dîsa wan hin berhemên xwe bi fransî nivîsandine. Heta Mîlan Kundera azadiyeke weha ji xwe re dibîne ku dikare li gora zimanan di wergerê de hin tiştan ji berhemê derxe an lê zêde bike. Ev ew bi xwe dike, berhema wî ye dikare bike, lê azadiya wergera berhemên prosayê bi sînor e; herçî şiroveya şîrê ye bi awayekî din e. Dive şirovekar xwediyê zanebûneke kûr û ruhekî şairane be. Ji ber ku ew fikir, xewn, xeyal, wêneyên nediyar û sembolan werdigerîne... Lê li gora xwe û li gora têgihîştina xwe werdigerîne.

Gelo mirov dikare li gora xwe û li gora têgihîştina xwe çîrok, an jî roman wergerîne. Yanî li gora xwe şirove bike?

SR: Bi raya min mirov nikare berhemeke prosayî li gora xwe şirove bike. Di navbera wergera şîrê û prosayê de ferqeke bingehîn heye. Niha nayê bîra min, lê ca-

mêrekî gotibû, şîr bi tenê fikrekê dide mirov, yanî di derheqê naveroka xwe de fikrekê dide mirov. Rast e, ziman û stîleke şaîr ya taybetî heye, lê yê ku wê şîrê werdirîne, an jî şirove dike, li gora têgihîştin û zimanê xwe dike. Ya rastî wernagerîne, li gora xwe şirove dike.

Herçî wergera çîrok û romanên e, divê mirov sadiqê tekstê be. Ew serbestiya ku mirov dikare di şîrê de bi tekstê bilîze, biguhere, di çîrok û romanê de nîne.

Gava behsa wergerê dibe, divê ev jî neyê jîbirkirin, mirov tu carî nikare teksteke edebî; çî roman, çî çîrok, ji sedî sed mîna orjînalê wergerîne. Gava berhemeke edebî gotin bi gotin were wergerandin, hingî tama xwe ya edebî winda dike, dibe tiştêkî din... Ji ber ku di zimanê her miletî de, di her kulturê de uslûbeke edebiyatê heye, term hene, îdyom hene; heger kesê ku werdigerîne haya wî ji îdyoman, ji termînolojîya wî zimanê ku werdigerîne, ji kultur û rabûn û rûniştina wî miletî tunebe, kê mî zêde bi herdu zimanan jî baş nizanibe wê nikaribe bi ser bikeve.

Gava mirov ji zimanekî werdigerîne û pêrgî îdyomekê tê, divê mirov baş bigere û li gora wê îdyomê îdyomeke zimanê ku mirov werdigerîniyê peyda bike. Heger di wî zimanî de îdyomeke welê nehat peydakirin, mirov hingî dikare îdyomeke nêzîkî wê bi kar bîne.

FC: Di eslê xwe de werger ne bi tenê wergera berhema edebî ye, wergera kulturekê ye jî. Wergera rabûn û rûniştin, xwarin û vexwarin û toreya wî miletî ye jî. Em bibêjin ger mirov romanekê çînî wergerîne kurdî û di romanê de taswîra keç û xortekî spehî bike ku wê herin restorantê û wê êvarê ji kêfa evîna hev re goştê mar, an jî goştê psîk û kûçikan bixwe. Ji ber ku li Çînê ev ji xwarinên sereke têne hesêb. An jî em bibêjin nivîskarekî swêdî di romana xwe de behsa cejna Noelê dike, behsa xwarina Noelê dike; serê berêz, celebê goştê berêz bi awayekî estetîk li ser masê hatiye xemilandin, mêvan bi kincên spehî li dor masê rûniştine û bi zewq wê xwarinê dixwin. Nivîskar bi celebekî welê behs dike ku dilê xwendevanê berhema orjînal diçe wê xwarinê. Ji ber ku xwendevan bi wê xwarinê mezin bûye, ew xwarin gelek caran li mala wê/wî hatiye çêkirin, di zaroktiya xwe de gelek caran xwariye, dizane bêhna wê û tehma wê çawa ye. Lê gava sehneyeke weha wergera zimanê welatekî îslam, wê bibe awayekî din. Gelo di vir de divê werger çî bike? Sadiqî tekstê bimîne an jî li gora xwe adapte bike?

SR: Gava ez behsa sadiqbûna li hemberî tekstê dikim, ez nabêjim divê ji sedî sed werger têkilî teksta orjînal nebe. Belê, mirov dikare hin guhertinan tê de çêbike. Bivê neyê di wergerandina berhemeke de hin informasyon lê kê mî zêde dibe. Herçî pirsê kulturê ye, rast e, carinan hin tiştên ecêb dikarin derkevin pêşberî mi-

rov. Heger berhema ku tê wergerandin ji bo mezinan be, xem nake, mirov dikare cihêtiyên kulturê jî -mîna kultura xwarinê- wergerîne, lê heger berhem ji bo zarokan be, divê mirov hebekî lê miqate be, hin tiştan biguhure û li gora kultura ku berhem werdigeriyê adapte bike. An jî bi gotineke din, mirov kirasekî nû lê bike ji bo ku pêşiya antîpatiyê bigire.

FC: Bi raya min ji berdêla guhertina tekstan, ji berdêla guhertina kultura xwarinê, mirov kirasekî nû yê edebî lê bike wê çêtir be. Ez bawer dikim wê di vir de ferqeke mezin di navbera edebiyata mezin û zarokan de tunebe. Edebiyat edebiyat e û edebiyata baş jî divê gerdûnî bibe, yanî sînoran gav bike û bibe malê mirovatiyê. Ger em werin ser têgihîştina mirovan ya kultura gerdûnî, em ê bibînin ku bi qasî ku mirov di vê cîhana global de hevdu nas dikin, evqas jî biyaniyên hev in, dîne hev, kultura hev, zimanê hev nas nakin. Dibe ku profesorekî swêdî nizanibe ku li hin deverên Kurdistanê, ji bo dermên be jî, goştê jîjoyan tê xwarin. An em nizanin li hin kulturên dûr mirovên wan welatan çî dixwin, çawa li xwe dikin, rabûn û rûniştina wan çawa ye. Ji xwe armanceke edebiyatê jî ew e ku di globalîzma dinyayê de çand û zimanên cihê bigihîne hev, di pirçandîya dinyayê de toleransa kulturî xurttir bike.

EN: Gava xwendevan di berhemeke edebî de pêrgî kultureke cihê were ez bawer nakim, ku wê jê vecinîqe, an jî jê re pir ecêb were. Ji ber ku dinya biçûk bûye û mirovên dinyayê jî cîhana xwe ya biçûk digel kultur û zimanên cihê nas dike. Ev jî bivê nevé bi riya şoreşa informasyonê, yanî bi riya çapemeniyê mimkin bûye. Loma bi raya min pêwîst nake ku mirov berhemeke edebî ji ber kulturên cihê sansur bike, an jî lê kêm û zêde bike. Heger di berhemeke edebî de behsa serê berêz û xweşbûna goştê berêz tê kirin, divê wisa were wergerandin. Ji xwe gava mirov berhemeke jî zimanekî werdigerîne, ne ku mirov bi tenê zimên werdigerîne, herweha mirov kultura wî welatî jî werdigerîne. Vêca heger mirov berhemê di sansureke wisa de derbas bike, mirov ê berhemê birîndar bike û mirov ê têkeve pêşberî hevnasîna kulturên cihê.

XA: Ji ber ku wergêr di navbera kulturên cihê de tercumanîyekê dike, loma rola wergêr di nasandina kulturên cihê de mezin e. Bi ya min di wergerandina berhemeke edebî de berpîrsiyariyê mezin dikeve ser stûyê wergêr. Divê wergêr bi xwe di warê çand û zimanên cihê de têgihîştî be. Gava haya wergêr jî çandên cihê hebe, wê di wergerandina berhemê de jî bi awayê xwe wê yekê diyar bike.

FC: Rast e, divê haya wergêr ji kulturên cihê hebe, bi taybetî kultur û zimanên ku wergêr jê werdigerîne û werdigerîniyê. Lê ez dixwazim vê bipîrsim, gelo di wer-

gerandinê de çî problem û zehmetî derdikevin pêşberî we?

XA: Di wergerê de gelek zehmetî derdikevin pêşberî min. Hin zehmetî hene ku ez bawer dikim derdikevin pêşberî hemû wergêrên kurd. Bo nimûne gava ez tişteki werdigerînim, ez gelek caran li gotinan digirim, gotinên ku di ferhengan de jî nînin. Ez hingî dipirsim, ji der û dorê dipirsim, ji mirovên cihê dipirsim û loma wergera berhemekê dikare ji bo min demeke dirêj bikêşîne. Lê dîsa jî ez li gora zanebûn û têgihiştina xwe wê berhemê bi awayekî adapteyî zimanê kurdî dikim. Lê herçî şîr e, ez wê bi awa û uslûba xwe şirove dikim û digihînim xwendevanên kurd.

EN: Ji ber ku ez bi piranî tekstên dîrokî werdigerînim kurdî, loma gelek zehmetî derdikevin pêşberî min. Gelek term û gotin, navên welatan, navên cih û deverên cihê, navên serdar û leşkeran li gora berî bi hezar salî, an jî bi kêmanî berî bi çend sed salan in, ew îro hatine guhertin û bi awayekî din têne bilêvkirin. Divê ez lê bigirim û navên wan yên îro derxim. Hin navên siyasî û îdariya hingê ku bi salan e ez lê digirim lê min hê jî ew nav peyda nekirine. Ya din jî tunebûna ferhengên kurdî ne. Bi rastî em di wî warî de gelek zehmetiyan dikişînin. Gava gotinek an jî termek ji me re lazim bibe, em nikarin hema rahêjin ferhengekê û maneya wan term û gotinan jê derxin. Loma ez carinan bi saetan, bi rojan li maneya gotinekê digirim û ji nas û dostan dipirsim heta ku ez maneyeke nêzîkî wê gotinê bibînim.

FC: Baş e, gava gotinek an jî termek ji we re lazim bû û we di ferhengan de nedît, we ji der û dorê jî pirsî we dîsa bersiva wê nedît, gelo hûn hingî çî dikin? We kitêb hemû wergerandiyê lê hûn li çend gotin û terman asê mane, gelo hûn di rewşeke wisa de çî dikin? Hûn hingî tişteki li gora serê xwe çêdikin, an jî hûn di ser re gav dikin, hûn çî dikin? Kekê Elîşêr...

E: Bi vê pirsê te ve girêdayî bîranînek hat bîra min. Ez di salên heştêyî de bi wergerandina romana Îbrahîm Ehmed *Jana gel* ve mijûl bûm. Hingî ferhengên soranî kêmbûn, bo nimûne ferhenga Mam Hejar hê derneketibû. Ez hingî di gotinekê de asê mabûm. Di romanê de gotineke bi navê "porî heng" derbas bûbû, ku min jê fêm nedikir bê dihat çî maneyê. Ji ber ku Îbrahîm Ehmed xelkê Silêmaniyê ye min got ez ê maneya vê gotinê ji yekî xelkê Silêmanuyê bipirsim. Min hingî yekî ji Silmaniyê peyda kir û maneya "porî heng" jê pirsî. Wî jî got ku "porî heng" tê maneya "hûtê behrê". Ji ber ku hûtê behrê û ew tiştê ku min werdigerand li hev nedikir, tu têkiliyê hûtê behrê bi teksta min re tunebû. Lê min paşê ji yekî din pirsî, yê diwem jî ji min re got ku "porî heng" mêşa hingiv e. Min got yaho, piştî ku mêşa min bû hût ez hew vê romanê werdigerînim. Bawer bikin min roman wê lê hişt, heta ku carekê rehmetyê Îbrahîm Ehmed hat Swêdê. Hingî yek jê re goti-

bû ku Elîşêr romana *Jana gel* werdigerîne kurmancî. Wî ji xwest min bibîne. Hingî min jê re got, ezbenî, piştî ku hût hat bû mêş ez *Jana gel* wernagerînim. Ew jî keniya û got, na, divê tu wergerînî, min jî dest pê kir û dîsa wergerand. Yanî di wergerê de carinan mêş dikarin bibin hût, lê divê mirov lê miqate be û pir serê xwe pê re biêşîne da hût hût bimîne û mêş jî mêş...

SR: Rast e, di wergerê de gelek problemên welê dikarin derkevin pêşberî mirov. Lê divê ez di vir de mikur werim ku karê ez pê dadikevim, ez di çarçoveya zanîna xwe de, di çarçoveya zimanê kurdî yê nivîskî de, di çarçoveya ferhengên kurdî ku îro li ber destên me hene dikim, wergera min di wê sewiyeyê de ye. Vêca wergereke welê çiqas biserketî ye çiqas nebiserketî ye, ez nizanîm. Lê ez baş dizanîm ku kêmasî tê de heye. Ji ber ku problem derdikevin, gotinên nû derdikevin, term û îdyomên nû derdikevin, mixabin carinan dîtina wan zehmet e. Bivê nevé, gava ez term û gotinên ku ez lê digirim di ferhengan de nabînim û gava ez ji der û dora xwe jî dipirsim, ez bersiveke ku min têr dike nagirim, ez hingî li gora zanebûn û rêgihîştina xwe werdigerînim.

FC: Gelo dibe tiştekî ku te li gora serê wergerandibe û piştî bi salan tu di ferhengan de an jî bi devkî pêrgî gotina rast hatibe û te gotibe xwezî min ew bi kar neaniya heger îro bûya min ê ev bi kar bianiya, an jî ez ê di çapa dudan de vê gotinê bi kar bînim; yanî poşmaniyeke weha di mêjiyê te de bihuriye?

SR: Bivê nevé wê kêmasiyên wergerên me hebin. Ez li ser xwe bibêjim, ji ber ku ez vî karî bi awayekî amatorî dikim, helbet wê kêmasiyên min hebin. Em vî karî li dibistanan fêr nebûne, em li mala xwe û li gora imkanên xwe yê şexsî fêr bûne. Lê hêviya me ew e ku wê nivîşê pêşerojê vî karî baştir bikin, ew ê bi awayekî profesyonelî vî karî bikin û kêmasiyên me jî ew ê bibînin û rast bikin. An jî heger emrê me têr bike em li kêmasiyên xwe vegevin û wan rast bikin. Lê ez dikarim vê bibêjim, heta ku ev kar karê amatorî be, em ê nikaribin xwe ji kêmasiyan pak bikin.

XA: Bi ya min divê wergêr zimanê ku werdigerîniyê ji hemû zimanan baştir bizanibe. Heger mirov ji swêdî, tirkî an erebî berhemekê wergerîne kurdî, divê mirov zimanê kurd baş bizanibe. Qet nebe divê mirov kurdî ji van zimanan baştir bizanibe. Ji aliyê din ve divê haya mirov ji pêvajoya pêşketin û guhertina zimanê mirov jî hebe. Bo nimûne ew zimanê ku di salên heftêyî de li başûrê Kurdistanê dihat bikaranîn, îro pir hatiye guhertin, gotin û termên nû lê zêde bûne. Wek wergêr divê mirov bala xwe bide van guhertinan jî. Heger mirov ji guhertin û pêşketina zimanê xwe bêhay be, wê hingî di wergerê de jî seqetî çêbibe.

FC: Ezbenî, ev pirsra min jî dîsa ji civatê re ye; gelo weşanxane ji we dixwazin di-

bêjin ji me re vê kitêbê wergerînin, an hûn bi xwe kitêbekê werdigerînin û ji bo çapê li weşanxaneyan digerin? An jî çima hûn werdigerînin?

E: Meseleya wergerê jî mîna gelek meseleyên kurdan ên din in. Naxêr, tu weşanxane ji me kitêban naxwazin û em li gora wan wernagerînin. Ji ber ku em vî karî mîna karekî weltparêziyê dibînin û em ji xwe re li gora dilê xwe dikin. Em ji vî karê xwe tu fêdeyêke aborî nabînin û tu weşanxane jî tu pereyî ji bo vî karî nadin me. Karê me karê fisebîlulah e. Bêguman, heger ev karekî ticarî bûya wê gelek baş bûya, wê karê he baştir bihata kirin. Wê hingê werger bi pêş de biçûya, ziman bi pêş de biçûya û wê tiştên bi qîmettir derketina ortê. Niha, rastiyeke heye, meseleya wergerê, an jî nivîskariyê, dîsa bi meseleya kurdan ya siyasî ve girêdayî ye. Ev meseleya wergerê meseleyeke ferdî ye, fedekariyê ferdî ye. Mîna min got, ez vê yekê ji xwe re mîna berpirsiyariyê kurdewariyê dibînim. Gava ez rojê du saetên xwe bidim wergerê û tiştêkî ji soranî wergerînim kurdî, ez ji aliyê manewî de rehet dibim, ez ji aliyê ruhî ve xwe rehet hîs dikim. Ez hingê bawer dikim ku ez di navbera başûr û bakur de dibim pirek û ez herdu beşên welêt bi hev didim naskirin. Ez dizanim ku li başûr gelek tişt derketine lê negihîştine bakur, ez hewl didim ku li gora hêz û taqeta xwe wan tiştan biguhêzim kurmançî û hevvelatîyên xwe yê kurmançî jê haydar bikim. Ji ber ku bi qasî ku zimanê kurdî li bakur hatiye qedexekirin li başûr nehatiye qedexekirin û loma li başûr gelek kitêbên hêja derketine. Vêca ez ji bo xwe berpirsiyariyê welatparêzî dibînim ku van kitêban biguhêzim zaravayê kurmançî û pêşêkêşî kitêbxaneyê kurmançî bikim.

EN: Kêma zêde ji bo min jî eynî ye. Ez bi xwe jî vî karê wergerê ji ber welatparêziya xwe û ji bo bipêşdaxistina zimanê kurdî dikim. Me her yekî bîst-sih salên xwe dane siyasetê û em ji ber wê siyasetê ji cih û warên xwe derketine, em derbêder bûne û em nikarin vegerin welatê xwe û siyasetê bikin, lê em bi riya wergerê dixwazin tiştêkî ji miletê xwe re bikin. Gava em li vê biyanîstanê du rêzan dinivîsin an rûpelekî werdigerînin kurdî em ji aliyê wijdan ve rehet dibin, em dibêjin va ye me ji bo zimanê xwe û miletê xwe tiştêkî kir; em nehatine ku xwe li ser piştê dirêj bikin û dev ji her tiştî berdin, em xwe rehet hîs dikin. Ya din jî ez bi xwe meseleya zimên pir girîng dibînim, ji ber ku ji çar aliyan ve êrîş têne ser zimanê me û loma divê zimanê me xwe li hemberî van êrîşan biparêze, em jî dixwazin zimanê kurdî li hemberî van êrîşan biparêzin.

Ya dudan jî, gava min xwend, min dît ku zimanên ku mîna zimanê me qels mabûn û di dîrokê de tade lê hatibî kirin bi riya wergerê ji nû ve hatine vejandin û li ser lingan mane. Piştî avabûna îslamê ereban bi riya wergera berhemên antikê

hem zimanê erebî dewlemend kirin hem jî kultur û zanebûna antîkê guhestin zimanê erebî. Miletên din jî bi wergera incîlê û bi wergera berhemên din zimanê xwe dewlemend kirine. Ji bo pêşdexistina zimanekî werger bingeh e.

FC: Tiştê ku bala min dikişîne, te di xebata wergerê de bêtir bala xwe daye ser tekstên dîrokî û bi taybetî jî yên dema îslamê û yên li ser kurdan. Çima?

EN: Rast e. Ev meraqa min ya şexsî ye. Min dixwest ez bizanibim ka gelo berî hezar salî, an jî berî pêncsed salî kurd di çi rewşê de bûn, çawa dijiyan, serdest bûn an mîna îro bindest bûn, çima îro di vê rewşê de ne û hwd. Ev ji bo me meraqeke mezin bû, loma min giraniya xwe da ser wî beşî û ez îro jî her li ser wê xebatê berdewam im.

SR: Her insan dixwaze di wextê xwe yê vala de bi tişteki dakeve, an jî mijûliyeke wî heye. Yê min bi xwe jî wek hobî ye. Gava ez kitêbekê dixwînim û kêfa min jê re tê, ez dixwazim ew kitêb bi kurdî jî hebe û ez dest bi wergerandina wê dikim. Tiştên ku ez werdigerînim jî bi giranî çîrok û roman in, yanî berhemên edebî ne. Wek min got, ji ber ku ez ji wan hez dikim û ez dixwazim ew bi kurdî jî hebin, loma ez wan werdigerînim.

XA: Bi rastî yê min jî kêm zêde bi vî awayî ye, yanî gava ez tişteki dixwînim û jê hez dikim û bawer dikim gava ez wergerînim wê hinekî din jî jê hez bikin, ez hingî werdigerînim. Ne ku hinek ji min re dibêje vê berhemê wergerîne û ez dest bi wergerandina berhemê dikim. Ez hem bi xwe werdigerînim û gelek caran jî ez pereyên xwe lê didim û berhemê çap dikim.

FC: Bi destûra we be ez dîsa dixwazim vegerim ser problema wergerê ya bingehîn. Di wergera kurdî de problema bingehîn çi ye?

SR: Bi raya min gava mirov dest bi wergerê dike divê mirov lê bifikire, gelo heger nivîskarê teskta orjînal bi kurdî binivîsanda wê çawa binivîsanda, wê zimanekî çawa bi kar baniya, wê kîjan term û îdyom bi kar bianîna. Bi ya min di wergerê de ya girîng ew e ku ez tiştên ku bi zimanê orjînal hatine nivîsandin bi zimanê kurdî ifade bikim, bikim ku kurd bi zimanê kurdî jê fêm bikin û ji xwendina wê zewqekê bistînin; ew hingî dibe wergereke biserketî. Lê du-sê problemên din hene ku di wergerê de derdikevin pêşberî mirov ew jî tunebûna ferhengên baş in, divê hem ferhengên baş yên kurdî-kurdî, hem jî yên bi zimanên din û kurdî hebin. Ya din divê haya mirov ji termînolojiya zimanan hebe; hem zimanê ku mirov jê werdigerîne hem jî zimanê ku mirov werdigerîniyê. Divê mirov hevoksazî û hevokan nas bike. Mirov bizanibe kîjan sîfat e, kîjan lêker e, kîjan adverb e û hwd. Ji ber ku carinan di hevoksaziyê de giranî li ser termeke giramerî ye, gava mirov bi maneya ter-



man nizanibe û haya mirov ji rêzimanê tunebe, wê hingê karê wergerê gelek zehmet be. Min berê jî îşaret kiribû, heger mirov berhemeke edebî bi kêfxweşî wergerîne mirov nikare ruhekî baş bidiyê. Divê ji mecbûriyetê bêtir kêfa mirov ji wî karî re were. Gava di wergerê de kêfxweşî tunebe, mirov nikare berhemê bixemilîne, estetîka wê zebt bike.

FC: Rast e, li dinyayê gelek werger hene, ku ew bi xwe kitêbên ku ew ê wergerînin hildibijêrin, lê belê werger mîna karekî profesyonel, bi weşanxaneyan ve girêdayî ye û bi piranî weşanxane kitêban tesbît dikin û ji wergêran doza wergerandinê dikin. Ji ber ku ew wergêr bi peran werdigerînin, yanî ew li ser karê xwe yê wergeriyê dijîn, karekî din nakin. Loma wergêr gelek çaran mecbûr dimînin ku kitêbên ne li gora nêrîn, îdeolojî an jî felsefeya xwe wergerînin. Wek nimûne, wergêr dikare mirovekî realîst be, ji edebiyata realîst hez bike, lê weşanxane jê wergerandina berhemin surealîst an jî naturalîst dixwaze. Gelo di vir de heger wergêr bi xwe jî berhemê hez neke, an jî berhemê durrî felsefeya xwe bibîne wê zêde tiştekî baş jê dernekeve?

SR: Na, mebesta min hezkirina ji edebiyatê bi giştî ye. Yanî heger wergêrek ji romanê hez bike wê romanê baş wergerîne, heger jî çîrokê hez bike wê çîrokê baş wergerîne, heger jî şîrê hez bike wê şîrê baş wergerîne. Lê problema ku te anî zimên, ew e ku hinek dikarin ji romanên romantîk hez bikin, lê romanên dîrokî werdigerînin. Bi baweriya min di vî warî de baweriya wergêr çî dibe bila bibe bê ku bi teksta orjînal bilize, bê ku lê kêma û zêde bike divê wisa wergerîne. Mixabin ku di vî warî de nimûneyên xerab hene. Hin kitêbên ku hatine wergerandin, bi piranî jî kitêbên siyasî ku tiştekî ne li gora îdeolojiya xwe an jî tiştekî li dijî dewleta xwe tê de dîtîbin, ew tişt jê derxistine û li gora xwe tiştin lê zêde kirine. Di vir de nimûneyên herî berbiçav tirk in. Kitêbên ku tirkan wergerandine tiştên li ser kurdan jê derxistine, bi gotineke din ew berhem sansur kirine. An jî tiştên baş ku ji bo kurdan hatine gotin, guhertine, kirine malê tirkan. Bêguman ev nimûneyên xerab in, divê di wergerê de neyên kirin.

FC: Sohbeta me îro bêtir li ser wergera ji zimanên din bo zimanê kurdî ye. Lê mîna we jî anî zimên, wergerandina berhemekê wergerandina kultura wê berhemê ye jî. Gelek millet hene ku em wan jî edebiyata wan nas dikin. Şêweyê edebiyata wan ya bilind ew jî li ber çavên me mezin û bilind kirine, mirov hurmetekê ji wan re nîşan dide. Ez dixwazim werim ser vê, gelo heger Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî di dema xwe de li zimanên din hatibûna wergerandin, wê dinyayê îro bi çavêkî çawa li kurdan bineriyay?

E: Bêguman heger Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Hecî Qadirê Koyî an jî Goran di dema xwe de li zimanên ewrûpiyan hatibûna wergerandin, qet nebe wê di nava cemaeta rewşenbîrên van welat de bi çavêkî din li kurdan bihata nihêrîn, wî îmajê kurdan bihata guhertin. Lê em bala xwe didinê ku îro jî ev tişt tune, berhemên kurdî îro jî bi zimanên ewrûpayî an kêma in an jî qet nînin. Mixabin me do jî xwe bi dinyayê neda naskirin û em îro jî xwe nadin naskirin.

FC: Baş e, haya we ji dîroka wergera bo zimanê kurdî heye? Wergera kurdî kengî dest pê kir, çawa dest pê kir? Destpêka wergera bo zimanê kurdî çi celeb kitêb bûn? Kitêbên edebî bûn, an kitêbên dînî bûn, çi celeb edebiyat bû?

XA: Heger ez li ser başûrê Kurdistanê bipeyivim, tiştê ku ez dizanim wergerê bi edebiyarê û bi şîr û çîrokê dest pê kir. Piraniya wan jî ji farisî û erebî dihatin wergerandin, lê kêma jî ji îngilîzî dihat wergerandin. Yêna ku li başûr dest bi wergerê kiribûn Şêx Nûrî Şêx Hesên, Ebdullah Goran bû, ku xwe bi karê wergerê ve mijûl kiribûn û berhemên edebî werdigerandin kurdî. Heger mirov li başûr behsa wergera cidî bike, ez dikarim bibêjim ku di salên pêncî de dest pê kiriye. Lê paşê, di salên heftêyan de karê wergerê bi awayekî berfirehtir dest pê kir. Bi taybetî di wan salan de gelek xwendevanên kurd ji bo xwendinê çûbûn Sovyetê, gava ew vegehiyan Kurdistanê, wan gelek tiştên heja ji rûsî wergerandin kurdî. Niha jî werger tê kirin û ji zimanên cihê cihê berhemên edebî tên wergerandin.

E: Tiştê ecêb ku di medreseyan Kurdistanê de kitêbên ku bi erebî dihatin xwendin, şerha wan, an jî şiroveya wan bi wergera devkî dihat kirin. Seyda û melayên Kurdistanê ew kitêbên erebî wernedigerandin kurdî lê bi erebî dixwendin û şerha wan bi kurdî dikirin.

FC: Lê ji bo ku xiristiyên û misyonerên ku dihatin Kurdistanê dîna xiristîyanîyê di nava kurdan de belav bikin, canik û camêran dest bi wergerandina incilê kirine, xwestine ku kurd an jî mesîhiyên ku li Kurdistanê dijîn bi kurdî incilê bixwînin û bi kurdî taeta xwe bikin.

Lê di vir de divê em xwe rexne bikin, dev ji wergerê berdin, kurd di bikaranîna zimanê xwe de jî pir sersar bûne, guh nedane zimanê xwe, bi zimanê xwe nexwendine û nenivîsandine. Heger misilmanên kurd kitêbên dînî, çepên kurd kitêbên çep, lîberalên kurd yêna lîberalîzmê, nasyonalîstên kurd yêna nasyonalîstî, edebiyathezên kurd yêna edebî wergerandina, niha hem asoya kurdan ya fikrê wê pir firehtir bûya hem jî wê zimanê kurdî di radeyeke din de bûya. Em dîsa diçin û tên em tên ser kovara HAWARê. Bi qasî ku kovara Hawarê bi afirandina edebiyata kurdî ya nûjen ve mijûl bû, wê ewqasî jî guh dida wergerê û gelek wergerên ji zimanên cihê

cihê kirine. Lê ev karê ku Celadet Bedir-Xan bi riya kovara Hawarê dabû ber xwe, me niha dest pê kiriye û em wî karê nîvcîmayî dibin serî. Mixabin hem di dema Hawarê de, hem jî niha ev kar ne karekî profesyonel bû, karekî îdeal bû û hê jî welê ye, loma zêde bi pêş neketiye. Mîna ku min ji gotinên we jî derxist, karê wergerê karekî welatparêzî ye, ji bo vejandina zimanê kurdî ye, bi gotineke din deynê e, deynê miletekî ye.

Ez dixwazim pirsê xwe welê formule bikim; gelo heger wergerê li ser wergeriya xwe nejt, karê wergeriyê bi tenê mîna karekî welatparêziyê bike, wê çawa bikaribe wergeriya xwe bi pêş bixe, wê çawa bikaribe di wergeriya xwe de berdewam be?

E: Li gora qeneeta min mesele wergerê jî bi mesele û pêşeroja gelê kurd ve girêdayî ye. Mesele girêdayî statuya Kurdistanê ye. Gava li bakurê Kurdistanê gelê kurd û zimanê kurdî resmî neyê qebûl kirin, zimanê kurdî di nava kurdan de belav nebe, wê karê wergeriyê jî her bi vê amatoriye dewam bike. Lê li başûrê Kurdistanê rewşa zimanê kurdî tiştekî din e. Heger statuyeye resmî nebe jî, lê ew dîsa weke dewletê ne, loma ew dikarin gelek gavên mezin biavêjin, ew dikarin mueseseyên wergerê ava bibin. Ne bi tenê ji bo kurmanciya jêr, yanî ji bo soranî, lê ew dikarin ji bo kurmancî jî mueseseyan ava bikin. Ji ber ku li wir di dibistanan de zimanê resmî kurdî ye. Gava ew bixwazin di warê wergerê de tiştekî bikin ew ê bikaribin gavên mezin biavêjin.

FC: Kêlîka din berî ku em dest bi sohbata xwe bikin, me got, heger ji kitêbekê hezar lib werin firotin, wê weşanxaneyek bikaribe debara xwe bike û wê karê weşanxaneyê bizîvire û herweha mafê wergerê jî bidîyê. Gelo piştî tekoşîn û berxwedana evqas sal çima weşanxaneyekê kurd nikare hezar kitêbên kurdî bifiroşe? Çima xwenda, siyasetvan û rewşenbîrên kurdan li zimanê xwe xwedî dernakevin?

E: Ji ber ku şîûra milî, hîsên milî li ba kurdan kêma e. Em çiqasî ji xwe re bibêjin em siyasî ne, em çiqasî ji xwe re bibêjin em kurd in, lê dîsa di cihê de kêmasiyek heye. Ew kesê ku şîûra milî li ba hebe, divê berî her tiştî ji bo vejandin û pêşdaxistina zimanê xwe gavan biavêje. Wekî din jî divê êdî prosesa weşandina kitêbên kurdî cih biguhere, berê xwe bi welêt veke û li Kurdistanê derkevin. Ji niha û pê ve weşandina kitêbên kurdî li derveyî welêt bêmane ye, divê weşanxaneyên kurdan berê xwe bi welêt ve bikin û herin li wir kitêbên xwe derxin. Ji ber ku gelê me li welêt e, herweha xwendevanên me jî li welêt in. Gava kitêbên kurdî li welêt derkevin wê hêdî hêdî tîraja wan jî bilind bibe û ji hezarî bêtir werin firotin.

EN: Çawa kitêb bi kurdî pir kêma hatibin nivîsandin, werger jî welê kêma hatine kirin. Mîna windabûn û şewitandina gelek kitêbên kurdî, kitêbên werger jî dikarin

hatibin windakirin û şewitandin. Lê belê, gava mirov îro li kitêbxaneyê kurdî dine-  
re mirov dibîne ku bi rastî pir kêmtir tiş hatine wergerandin. Ew jî ji ber çî ye, ji ber  
mîna ku me berê jî behs kir, karê wergerê li ba kurdan karekî amatorî ye, ne pro-  
fesyonel e, loma bi ser neketiye, loma negihîştiye cihekî. Ev demek dirêj e ez li ser  
Îbn-ul-esîr dixebitim, lê min hê jî temam nekiriye. Ji ber ku kitêbeke din ji min re  
lazim e, ez dizanim ew kitêb li ku heye, lê ji ber ku ez rojê heyst saetan, deh saetan  
kar dikim loma wextê min nîne ku ez herim wê kitêbê bînim, lê bînerim, wergerî-  
nim û karê xwe yê nivîsmayî bibim serî. Niha, gava mirov kitêbekê, du kitêban, sê  
kitêban wergerîne û kes nekire û nexwîne, hingî destê mirov jî lê sar dibe, dilê mi-  
rov dişikê, hewesa xebatê namîne. Yek ji sebeba herî mezin ku em di warê wergerê  
de negihîstine devereke bilind jî bi a min ev e, ji ber ku wergêr nikarin li ser karê  
xwe bijîn, lê belê hemû enerjîya xwe, wextê xwe û perên xwe jî li ser dikin.

SR: Rast e, ji xwe problema herî mezin problema nexwendina kitêbên kurdî ye.  
Em dev ji kurdên hundir berdin, em bêjin li ser wan zilm heye, tirs heye, newêrin,  
lê bi kêmanî milyonek kurd li Ewrûpayê heye. Ji nava vî milyonî jî bi hezaran ke-  
sên xwenda hene. Ew bi kêmanî bi çend zimanan dizanin, bi çendan kitêb li malên  
wan hene, bila ew ji xwe bipirsin, gelo çima kitêbên kurdî di kitêbxaneyên wan de  
tuneye. Gelo çima ew nikarin nameyekê bi kurdî binivîsinin, du rêzên kurdî bix-  
wînin. Ez bawer dikim divê ew vê pirsê ji xwe bikin û bersiva wê jî bi xwe bidin.

EN: Ez şaş û ecêbmayî dimînim ku çima kurd ewqasî li hemberî zimanê xwe sar  
in û ji bikaranîna zimanê xwe ewqasî dûr in. Ev ne îro wilo bûye, bi dehsalan e, bi  
sedsalan e her wilo dewam kiriye. Ez carinan meraq dikim ka gelo mîrên kurdan,  
begên kurdan, mezinên kurdan di malên xwe de bi kîjan zimanî dipeyivîn. Heger  
zimanê wan yê malê kurdî bûya, çima wan hewcedariya zimanê nivîskî nedîtine...

FC: Ez dixwazim em dîsa vegerin ser wergerê, teknîka wergerê û wergera ji  
zimanê dudan. Min bi xwe jî tiştin ji zimanê dudan wergerandine. Me bîska din  
behsa sadiqbûna tekstê kir, heger wergerê zimanê yekê bi tekstê re ne sadiq be,  
wergerê zimanê dudan bi tekstê re sadiq be jî tu maneyê nade. Gelo rîska werge-  
randina ji zimanê dudan çî ye?

SR: Bi destûra te be, ez dixwazim bi kurtî behsa çîroka çîrokên *Hezar û şevêkê* bi-  
kim. Ev çîrok bi sedsalan e ku li Rojhilata Navîn û heta ez dikarim bêjim ji Misrê  
bigire heta Hindistanê tên gotin an jî hatine gotin. Berî bi sed sed û bîst salî li Mis-  
rê komisyonek dicive û van çîrokan hemûyan bi erebî berhev dikin û bi qasî panz-  
deh-şanzdeh cild çîrok tên ser hev. Piştî re yekî firansîz rûdine û van cildan werdi-  
gerîne firansîzî. Paşê ev çîrok bi riya firansîzî werdigerin gelek zimanên din. Swêdi-

yan bi xwe jî ev çîrok ji firansizî wergerandine. Min bihîst ku tirkan bi xwe jî ev çîrok ji firansizî wergerandine. Vêca min jî ji swêdî wergerandine. Ev çîrok çiqasî nêzikî orjînal erebî mane ez nizanîm, lê herçî tekstên din in ku ez werdigerînim, ez bêtir wan beramberî du zimanan dikim. Ev yeka ha jî ji bo me awantajek e. Lê bêşik ya herî baş ew e ku mirov ji zimanê orjînal wergerîne. Heger mirov bi zimanê orjînal nizanibe bivê nevē heqê mirov heye ku mirov ji zimanê dudan jî wergerîne.

FC: Di vir de nimûneyek hat bîra min. Dibe ku min ev nimûneya ha di devereke din de jî gotibe. Min hingî teksteke Marquez ji swêdî werdigerand kurdî. Di wergera swêdî de Marquez dixwest bibêje ku kitêbên wî pir dihatin firotin, digot: "Mina böcker såldes som om det vore vara korv". Yanî kitêbên mina sosîsan dihatin firotin. Gava ez di kurdî de bibêjim filan tişt mîna sosîsan tê firotin, nayê maneya firotina pir, dibe ku maneya hindikfirotinê bide. Min hingî li ya tirkî jî nerî. Tirkan jî gotibûn: "Kitaplarım ekmek peynir gibi satılıyordu". Ez bi kurdî bibêjim mîna nan û penîr dihat firotin jî tu maneyê nade. Min nizanîbû ka Marquez bi spanî çî bi kar anîbû, lê min di wergera kurdî de "mîna avê diçû" nivîsand. Ev nimûneyeke biçûk e û dibe ku ne ewçend girîng be. Ji ber ku xulase pîrfirotina kitêban e. Lê gava tiştêkî cidîtir derkeve pêşberî mirov wê hingî zehmet be, yanî heger werger ne ji zimanê yekê be, mirov çiqasî sadiqê tekstê bimîne jî, dîsa rîska ku teksteke birîndar derkeve holê heye.

SR: Dibe ku ev bêtir mesela îdyoman be. Gava ez Marquez wergerînim divê ez welê bifikirim, gelo Marquez kurd ba wê çawa binivîsanda, di şûna wê îdyomê de wê bi kurdî çî bigota? Divê ez li wê bifikirim, kurdiya wê bibînim û deynim şûna îdyoma Marquez.

XA: Bêguman gelekî baştir e ku mirov ji zimanê yekem wergerîne. Ji ber ku bivê nevē rîska wergerandina ji zimanê duwem heye. Di vê mijarê de tecrubeyeke min jî heye, ez dixwazim bînim ziman. Berî ku ez dest bi wergerandina "Guhdarî bike peyayê biçûk" bikim, min wergera wê ya bi erebî jî xwend. Min wergera erebî û ya swêdî da ber hev û min dît ku di navbera herdu wergeran de ferqeke mezin heye. Di wergera erebî de gelek tişt lê kêm û zêde bûye, lê gava min wergera swêdî da ber ya îngilîzî, min dît ku wergereke gelekî baş û bi rêk û pêk e. Cih bi cih mirov digot qey zimanek e. Gelekî sadiqî teksta îngilîzî bû û tiştêkî lê kêm an jî zêde nekiribûn. Ev jî ji ber cidiyeta karê wergêrên swêdiyan tê. Bi raya min wergêrên swêdî pir cidî ne, wî mafî di xwe de nabînin ku bi berhemeke orjînal biltzin, wê xera bikin, ji orjînalbûnê derxin. Ez bi xwe gelek caran ji swêdî werdigerînim û baweriya min jî bi wergêrên swêdî heye. Lê ez bawer nakim wergêrên zimanê tirkî an jî erebî bi vê ci-

diyetê dixebitin. Ji ber ku em dizanin gelek caran ji ber seabên siyasî an jî dînî berhemên orjînal di sansurê re derbas dibin û beşên girîng yê kitêbê jê derdixin. Di rewşa îro de, ev ji bo zimanê ewrûpî ne mimkin e. Rast e, min "Guhdarî bike peyayê biçûk" ji swêdî wergerandîye, lê gava min da ber wergera îngilîzî, bawer bikin min gotinek cihê jî tê de nedît, loma mîna ku min ev berhem ji zimanê orjînal wergerandibe.

FC: Bi destûra we be, ez dixwazim hêdî hêdî dawî li sohbeta me bînim. Bêguman di vê mijarê de hê gelek pirsên ku li bersivan digerin hene, lê ji ber ku rûpelên kovarê bi sînorkirî ne em ê nikaribin di vê rûniştinê de li ser hemû pirsgrêkên bi giştî wergerê û bi taybetî jî wergera kurdî rawestînin. Lê gotina dawî, gelo hûn pêşeroja wergera kurdî çawa dibînin?

E: Ev pirs te tiştek anî bîra min. Gava me siyaseta dikir, nivîsê heftêyî rabû, bi xebata me qayîl nebû, got em ê baştir bikin, me jî siyaseta spart wan. Çiqasî baştir kirin ez nizanim, lê di wergerê de jî wê weha be. Wê nivîsê nû rabe bibêje em ê ji nîvîşê kevin baştir bikin. Lê vê carê em zû bi zû ji destê xwe bernadin. Heta ku em ji sedî sed nizanibin ku ew ê ji me çêtir bikin em zû bi zû naspêrin wan û em ê vî karî dewam bikin. Ez tiştekî din jî lê zêde bikim; tiştên ku em werdigêrin werin çapkirin neyên çapkirin, werin xwendin neyên xwendin, çi dibe bila bibe her em ê vî karî dewam bikin.

Li gora qeneeta min, heger di rojên pêş de li bakurê Kurdistanê kurd statuyeke siyasî bi dest bixin wê ev xebata me mîna zêr bi qîmet bibe. Loma divê wergêrên kurd dilîkêstî nebin û rewş çî dibe bila bibe di karê xwe yê wergerê de her berdewam bin.

EN: Di vir de bîranîneke zaroktiyê hate bîra min. Gava ez zarok bûm, zilamekî bi navê Silêman hebû, camêr hertim diçû nêçîrê. Rojekê gava destê xwe dixê qulê mar destê wî gez dîke. Mamê Silêman jî tiliya xwe jê dîke. Piştî bi salan xelk jê dipirsim, "Apê Silêman, ma tu ê heta kengî herî nêçîrê, tu êdî kal bûyî." Apê Silêman jî dibêje, lawo tilî bû, min ew jî li ser kir, ez hew dikarim dev ji nêçîrê berdim."

Vêca yê me jî wilo ye, ketiye ruhê me, ketiye mêjiyê me, em nikarin dev jê berdin. Ez hêvî dikim wê di pêşerojê de tesîra vê xebata me hebe û ez bawer dikim wê hebe jî. Gava kovara Hawarê jî derket, dibe ku di dema xwe de rola wê zêde nehat dîtîn, lê ji bo nivîsê me bû hêviyek û ji bo pêşerojê moral da me.

SR: Pêşeroja wergera kurdî an jî ya edebiyata kurdî wê çawa be ez zêde nizanim. Ji ber ku berê jî hat behskirin ez naxwazim dîsa dubare bikim, lê girêdayî bê kurd

çiqasî li xwe û zimanê xwe xwedî derdikevin. Herçî ji bo min e, mîna hûn jî dizanin, hobi ye. Gava mirov romanek sêsed-çarsed rûpel wergerîne, bi kêmanî bi qasî wan rûpelan saet jê re divên. Ne bi tenê ew jî, paşê mirov ê bixe ser kaxezê, dîsa bixwîne, rast bike û paşê bişîne çapê. Lê mîna min got, ji ber ku ez li ser vî karî najîm û keda min mîna hobiyeke ye, kurd dixwînin naxwînin ji min re ne problem e.

XA: Ji bo min jî her weha ye, her ku ez hebim, tiştekî ku ez bixwînim û jê hez bikim, ez ê wergerînim kurdî. Karê min ê wergerê jî li ser hezkirina min e. Gava ez ji berhemekê hez dikim ez werdigerînim. Vêca kurd bixwînin nexwînin, kitêb belav bibin nebin, ne xema min e, her ez ê wergerînim. □

**EMÎN NAROZÎ:** Gelek kitêb ji alfabeya erebî trnaskrîbeyî alfabeya latînî kirine û ji dîrokvanên mîna Ibn El-Esîr, Ibn Xaldûn, Teberî û hwd. werger kiriye.

**ELIŞÊR:** Ji zaravayê soranî werdigerîne. Wî heta niha ev kitêbên ha wergerandine: Ji Şeref Xanê Bedlîsî *Şerefname*, ji Rehîmê Qazî *Pêşmerge*, ji Îbrahîm Ehmed *Jana Gel*, ji Ebdulrehman Qasimlo *Kurdistan û kurd*, ji Ebdulraqîb Yûsûf *Tabloyên Şerefname* û çend kitêbên din.

**SERDAR ROŞAN:** Berhevokek ji *Çîrokên hezar û şevekê*, ji Guy de Maupassant *Mircana Qelew*, ji Hemîngway *Bi xatirê sîlehan* û ji Yilmaz Güney *Sîrxwar mirin* wergerandine kurdî.

**XEBAT ARIF:** Bi xwe şair e û bi zaravayê soranî dinivîsîne. Herweha wergerên wî jî dîsa bi zaravayê soranî ne. Wî ji Wîlhelm Reich *Guhdarî bike peyayê biçûk*, ji Tahar Ben Jelloun *Rasîm çi ye? Hevpeyvîn bi keça min re*, ji Papalogî *Peyayî Spî* û hwd. wergerandine kurdî.

## Kengê em ê bêne ba hev

kengê em bêne ba hev rû bi rû  
çavên te min dibin deryayên bê ser û binî  
agirek dojhê berdide hinava min  
lêvên ji şekirê quloqulo û sorsorkî  
çivîka tolaz a hestan difire ji ser dil  
û dest û lingên min xar û vaçê dibin.

Nizanim çima?

bayê çiya yê li pora te aliqî  
girêka dixê deng û awazan  
peyvên xweşik ku min ji bo te amade kiribûn  
dixeyidin ji min  
qudûmên min dişkên  
nikarim xwe li ser lîngan bigirim  
dilerizim

spiçolkî dibe rû

nizanim çima?

Kengê em bêne ba hev rû bi rû

Em neyên ba hev çêtir e

An wê

Mîna berfa tav dîtê bihelim

An jî

Ji hesûdiyê wê bajar xwe bikuje.

**BERKEN BEREH**



# Bê ravekirin

Kisik viqî-vala

ripî-rût

Hêviyê ez berdama

bi sê telaqan

Pîrejina qereçî li pîl nihêrt:

Pêşeroj qîrûqetran.

**ROJEN BARNAS**

Ravekirin: erh, tefsîr, tabîr kirin

# Întelektuelên kurd û lobîzm



S. SULEVANÎ

**H**ebûna întelektuelên kurd bi vê hejmarê û kalîteyê li derveyî welat diyardeyeke (fenomenek) nû ye, di jiyana kurdan ya modern de. Her xwendinek û lêkolîneke ciddî li ser întelektuelên kurd û polîtîka kurdan ya taze nikare bê cûdakirin, ji xebata van întelektuelên li derveyî welat. Wan mohra xwe li ser polîtîk û litteratura kurdî dane û heya di hinek waran de jidayikbûn û pêşketina wan li derveyî welat çêbûne.

Bi dîtina min xebata întelektuelên kurd li derveyî welat pir tê dîtin. Sîste-

mên cûda li van welatan wek Almanya, Swêd, Ingeltere, Rûsya, Japonya, Polonya, USA, Australiya wilo kir ku kêma zêde mantelîte, boçûn û têgihîştina întelektuelên li derveyî welat jî bê guherîtin û ew hebekî cûda be, ji ya întelektuelên li hundurê welat çî posîtîv û çî negatîv. Mirov vê yekê baş dibîne dema mirov xebata hinek întelektuelên kurd dide ber hev, dema li welat bûn û piştî derketina derveyî welat. Her wisa kesên ku ji derveyî welat zîvirîn Kurdistanê û bi taybetî başûrê Kurdistanê. Ew vege-riyan welat da xizmetekê ji bo miletê

xwe bikin, lê piştî demekê wan nikaribûn berdeyam bin û xwe adabteyî jiyana wir bikin, ji ber sedemên cûda cûda. Bê guman ev yek pir giştî ye û kesên awarte, çi li hundur û çi li derveyî welat hene. Hêvî ew e, ku întelektuelên li hundur û li derveyî welat roleka aktîvtir û pozîtîvtir bilîzin, xebata xwe pirtir koordîne û bi hêz bikin, di xizmeta miletê kurd de. Û da encamên baş bên bidestxistin gereke mekanîzma derve û ya hundur hêzê bidin hevdû û kêmasiyên hev bere bere ji holê rakin. Ronessansa kurdî bê beşdarbûneke sax û rêkûpêk ya întelektuelan ne gengaz û absurd e. Rizgarbûn bê lobî gelek zehmet e û lobî jî bê întelektuel, xwexapandin e. Dagirkerên Kurdistanê hewlên yekcar mezin didin xwe, da dengê kurdan qut bikin, ew bi milyonan pere ji bo vê mebestê terxan dikin. Jixwe pir vekirî gelek welat, partî, organîzasyon û hwd. firmên ku bi karê PR (public relations) û lobîyê radibin; kirê dikin. Wek nimûne ji bo vê yekê Tirkîye sala 1998an ji bo mawê şeş mehan milyonê dolar dabû firma Patton Boggs da ji bo wê lobîyê bike<sup>(45)</sup>. Lê digel vê yekê jî ew hewlên wan her diçe kêm û bi sînor dibe, nexasim di van salên dawî de. Mirov vê yekê di masmediya biyanî de rind dibîne. Nicole Pope di kovara MEI de wiha dinivîse: "Tirkîye wisa serketî nebû di şerê dîplomasiyê de. Hewldanên lobîya kurdan êdî berhem dide, û ew êdî li ser

sehna navneteweyî hatine naskirin"<sup>(46)</sup>. Li gelek deverên cîhanê lobîyên kurd xebata xwe berdeyam dikin û piştgirîyan berebere peyda dikin. Întelektuelên kurd di van salên dawîyê de li derveyî welat gelek aktîv in, di girêdana konferans, panel, korên kulturî û polîtîkî. Ev civînên han şanseke baş e, ji bo kurdan da ew pirsgerêka xwe bi çavekî kurdî û bi awayekî şaristanî raxe ber pispor û polîtîkvanên miletên din. Foruma li ser konflikta kurdî bi navê (Kurdish Conflict Resolution Forum) ku Instutiya Kurdî li Waşington<sup>(47)</sup> pê rabûbû mîna-keke. Ew însiyatîfêke baş û pozîtîv bû. Gelek pispor û polîtîkvanên kurd û biyanî beşdarî vê forumê bûn û dîtînen xwe yê cûda anîn ziman û ew gotûbêj kirin. Bêguman komcivînên bi vî rengî dikarin encamên pir qenc jî bidin. Delîvên wek vê forumê gelek li cihê xwe ye û bi fêde ye, ji bo kurdan, çi pispor û çi polîtîkvan, da dengê xwe bidin bihîstin û dîtînen xwe bînin ziman û bi taybetî jî, dema ew civîn li Amerîka tên li darxistin. Her kes dizane giranîya Amerîka di polîtîka cîhanê de û bandora wê li Tirkîyê çawan e û ji ber hindê jî têgîheştina raya giştî ya Amerîka û polîtîkvanên wê, ji bo kêşa kurd pir girîng e. Parlementera Swêdê Nalîn Baksî di hevpeyvînekê de li ser mijara kurdên bakur û rûkiliyên Tirkîye û Amerîkayê, dîtînen xwe bi vî rengî rîne ziman: "Mesele ewrupî gelek zorê didin wan (tir-

kan-s.s). Lê di baweriya min de divê em pêşî tesîrê li Amerîka bikin<sup>(18)</sup>. Diyar e ku dostên kurd li Amerîka hindî diçe zêde dibin û hinek pir vekirî vê yekê didin xuyakirin. Yek ji wan kesan kongressmanê amerîkî Bob Filner e. Ew di civînekê de, ji bo mafê kurdan weha dibêje: "Serok Clinton, hevalê min, gereke bes alîkariya Tirkîye bike û dest bi alîkariya kurdan bike, di şerê xwe de ji bo azadî û serbestiyê. Ew (Clinton-s.s) gereke bêje mîna ez îro dibêjim: "Hûn kurd in. Welatê we Kurdistan e. Mafê we yê çarenûsê heye."<sup>(19)</sup> Bêguman ev gotinên han gelek bi wate ne, nexasim ku ew li Amerîka û ji aliyê polîtîkvanekî amerîkî ve têne gotin. Mişebûna mirovên wilo wê tenê riya azadiyê kurt bike û hêvî û moralê kurdan berz û bilind bike. Çawa behsa lobîya îrlandî, yunanî, kuhû û ermenî tê kirin, îro wisa behsa lobîya kurdî jî tê kirin. Lobîya ermenî û yunanî kurdan destek dikin, ji bo bidestxistina mafên xwe yê xwezayî. Her wisa mirov dikare kêr zêde vê ji bo lobîya îrlandî jî bêje. Bi baweriya min mirov dikare piştgirîya lobîya kuhûyan jî bigire, ger kurd serê xwe bi vê yekê biêşînin û li ser wan rawestin, bi taybetî jî dema em bizanin ku sed û pêncî hezar kurdên kuhû li Îsrailê dijîn. Ew dikarin ji bo doza kurdî ya mafdar wek potansiyaleke mezin bên dîtin. Rojnameyeke îsrailî li ser vê mijarê wiha dinivîse: "Kurdên kuhû ji hemû dilê

xwe piştgirîya tevgeta kurdî dikin. Wezîrê Îsrailê yê parastinê Yitzhak Mordechai\*\* di nav civata xwe de wek mirovekî pir hêja tê dîtin û pêşwazî kirin. Û ew bi piştgirîya wan ya polîtîkî şa û serfiraz e. Ew ji bo hevalbendîyek germtir û nêzîktir ligel Tirkîye xweşbîn e. Lê ew di jiyana xwemalî (privat) de, rexneyên xwe li ser metodên rejîma tirk yê li ser kurdan tîne ziman"<sup>(20)</sup>. Helbet biratiya kurd û kuhû herdem hebûye, lê çend mixabin piştî avabûna dewleta Îsrailê kurdan ew biratî bi pêşve nebirin. Dr. Îsmail Beşikçi di pirtûkeke xwe de li ser vê babetê wiha dinivîse: "Qet bêfêde ye, ku kurd, li Rojhelata Navîn bi tesîra şovenîzma ereban dijminatîya Îsrailê bikin. Kurd, bi civata kuhûyan re dikarin têkiliyên germ deynin. Kurd nikarin sazgehên demokratîk ê civata Îsrailê nebînin. Civata kuhûyan, hevkarên kurdan ê tabî ye"<sup>(21)</sup>. Giraniya lobîya kurdî di têkeliyên navnetewî de ji bo daxwaza piştgirîya doza kurdî, gereke pir giring bê dîtin, nexasim dema bizanin ku li welatên demokratîk û pêşketî raya giştî (opinion) roleke mezin dilîze di çekirina polîtîkê û standina biryaran li wan welatan. Ne hewceyî gotinê ye, mirov bêje ku ev lobîya kurdî gereke serbixwe, bi rêxistin (koordinasyon) û kurdistanî be.

Ger mirov berê xwe bideyê, dê baş bibîne ku întelektuelên kurd her nebe li dûv cografîya ku têde peyda dibin; di-

bin du pişk: yên li hundur welat û yên li derveyî welat dijîn:

### **Întelektuelên li welêt**

Ev întelektuel nêzikî milletê xwe ne û di nav wan de dijîn. Ew dikarin roleke pir mezin bilîzin di hişyarkirina mirovên dewrûpišta xwe, xelkê xwe û hemwelatîyên xwe de. Lê ji ber nebûna azadîya bîr û baweriyê li welatên ku kurd tê de dijîn û zulm û zora dewletê ya li ser milletê kurd û bi taybetî jî, li ser întelektuelên kurd; xebata van întelektuelan pir hatiye kêmkirin, sînorkirin û gelek caran tune kirin. Ev întelektuelên bêdengkirin, ne tenê ji aliyê hêzên dagirker ve lê her wisa ji aliyê hêz û partîyên kurdî ve jî ku paradoksek e û cihê mixabîniyê ye. Ev întelektuel ji ber vê yekê û gelek egerên din wek hejarî, bêhêvî, xizanî û hwd. bar dikin û berê xwe ber bi koçberiyê ve vedikin, li wir jî niştecih dibin. Û heya ew niştecih dibin (proseseke ku dibe bi salan bajo), ew dest ji întelektueliya xwe, hunera xwe berdidin û bi karekî din ve mijûl dibin û hinek caran ew qet li întelektueliya xwe venagerin û ew li wir asê dibin. Jiyan wan bêgav dike û wan ber bi nanê rojê ve dehf dide. Li vir gereke mirovê jî bêje ku ronakbîrên li welêt di guherîna û pêşveçûnên li Kurdistanê roleke sereke dilîzin. Ew di mekanîzma navxwe de hewlên xwe ji bo hîkarî, kar û

xebatê dikin û bi taybetî jî li ser bîr û raya giştî ya navxwe, her çend dijwarî û astengên yekcar mezin li pêşîya wan hene jî.

### **B-Întelektuelên li derveyî welat**

Ev kesên han gelek in û gengaza wan heye ji bo xwe nişandinê, pêşveçûnê û belavkirina berhemên xwe. Bilindkirina dengê xwe û li mafê xwe pirsînê, hêsan-tir e ji yên li hundurê welat. Hebûna azadiyê û demokrasîyê li van welatan xaleke herî giring e ji bo mişebûna întelektuelên kurd. Her wisa hebûna teknolojiya bilind û şoreşa informasyonê, ev yeka han hêsan-tir kir û ew berçav-tir kir. Mixabin hêste rol û hîkariya întelektuelên kurd li derveyî welat gelek kêmkir e, li ser milletê kurd, lîder û rêvebirên kurd. Giraniya wan bêtir li derveyî welat e. Ew wek lobî di mekanîzma derve de hewlên xwe, ji bo xebatê dikin. Para wan di bilindkirina dengê kurdî û peydakirina îmajêke kurdî ya baş de pir mezin û berçav e, nexasîm di van salên dawî de.

### **Întelektuelên positîv, pasîv û negetîv**

Bi giştî di nav civata kurd de çî li hundur û çî li derveyî welat mirov dikare van her sê kategoriyan bibîne û yên ku mirov dikare navê întelektuelê baş, bêxem û xirab lêbibe. Kurdên pasîv û negetîv ne pêwîst e mirov pir li ser wan

raweste, çunkî xêra kurd di wan de nîne. Lê ev nayê wê wateyê ku mirov destê xwe ji wan bişo û wan bi tenê bihêle, belkî mirov hewlên xwe bide da ku ew ên hêvîyek di wan de hebin bikşîne rêza welatparêziyê, bi taybetî jî yên pasiv. Lê ji ber giringîya întelektuelên posîtîv û rola wan ya hêja di xebata milletê kurd de, emê tenê li vir li ser vê kategoriyê rawestin.

### **Întelektuelên posîtîv**

Ev întelektuel, di xizmeta milletê xwe de

kar dike û hewl dide xelkê xwe bi pêş ve bibe û wî bigehîne mafên xwe yên xwezayî. Ew xebateke pîroz bi dil û can û bê westan dikin. Helwêsteke wan heye, li hemberî bûyerên li Kurdistan di nav civata kurd de çêdibin û hêvîya piranîya wan bi Kurdistaneke azad, wekhev û serbixwe heye. Li vir kurdayetî zelal e û ew dibe pîvan. Bêgoman xebata van întelektuelan gelek dûr e, ji nijadperestiyê û nasyonālisma hişk û req. Çend cûreyên întelektuelên posîtîv hene:

*Dom dike*

# Welatê kurdan

## ŞAKIR EPÖZDEMİR

Li gor Şeref Xan  
Welatê kurdan  
Ji Qersê digre  
Ta diçe Kerman

Serîk li Zaxros  
Serîk Awanos  
Bi deşt û çiya  
Karêz û toros

Ormî û berjêr  
Heya Mereşê  
Meskenê Fatê  
Naz û Binefşê

Kilîs û Kerkûk  
Xoy û Xaniqîn  
Îlam û Mako  
Mosil û Efrîn

Dêrsim, Mahabad  
Riha, Sinandêş  
Cezîr û Bazîd  
Van bajarên xweş

Hewlêr û Amed  
Wan û Hekarî  
Xarqêt û Farqîn  
Bi hemî aqarî

Riha û Kerman  
Palo û Selmas  
Pasin û Amûd  
Ormî û Sêwas

Ji Ezirganê  
Ta diçe Bûkan  
Bi gund û bajar  
Bazar û sûkan

Sûsa Giravê  
Ta Qers û Digor  
Dijmin li ser e  
Bi kotek û zor

Endiweira kurd  
Qamişloka rind  
Gur, tazî dixwin  
Lê dixwîne kund

Mûş û Melazgir  
Zaxo, Îmadî  
Kurdan xwedî kir  
Evî biladî

Westan û Xoşav  
Elbaka egîd  
Hîzana têr av  
Şengala êzîd

Gênc, Gêl û Çêrmûk  
Mîrên Mirdasî  
Zazayên xweşmêr  
Kurd û kurdasî

Kurdên swêdî  
Xançûk, Siwêrek  
Çepexûr û Gênc  
Zaza bûn mîrek

Çemîşkezeke  
Mîrên Melkîşan  
Welatê Dêrsim  
Bi şohret û şan

Sasûn û Hezzo  
Babos û Xerzan  
Kurmancên qedîm  
Mîrên Ezîzan

Silêmanî ne  
Pasûr û Farqîn  
Mîr Merwanî ne  
Bizane yeqîn

Eskîf û Batman  
Sêrt, Tor û Gurdil  
Mîr Eyyûbî ne  
Bi can û bi dil

Hetax û Tercil  
Girdikan, Derzin  
Mîrên Zirikan  
Malbatek mezin

Mîrên Şêrwanî  
Seîd begî ne  
Şêrê çiyar in  
Mîr Eyyûbî ne

Bi navê Ezîzan  
Mîrekên Botan  
Ew rêvebirên  
Kurd û Kurdistan

Mîrekên Roşkan  
Serdarên Bedlîs  
Mend hikimdar bûn  
Payitext Kîlîs

Li Îmadiyahê  
Textê Bahadîn  
Rêberên kurdan  
Bo dinya û dîn

Mîrekên Şenbo  
Mîrên Hekarî  
Kevnar û qedîm  
Li vî diyarî

Mîrên Mehmûdî  
Begên Xoşavê  
Gelek mêrxas in  
Li vê dilavê

Mîks û Spayert  
Mîrekên Hizan  
Sê birayên qenc  
Şêrên Bilican



Mîrên Dinbilan  
Li Xoy û Bazîd  
Ew Barjêrî ne  
Ji ola Êzîd

Mîrên Mukriyan  
Bi xwe mukrî ne  
Bi rêz û rêzik  
Pir qedîmî ne

Warê Biradost  
Welatê Mîrxan  
Kurdên goran in  
Qiral û siltan

Mîrên Erdelan  
Kevn û kevnare  
Him şehrezor e  
Şehîrbazar e

Rewandiz Sorî  
Şehrezor Baban  
Du xanedan in  
Bi nav û nîşan

Mîrên Somayê  
Yên Telgeverê  
Malbatên qedîm  
Mêrxasên berê

Soran û Baban  
Goran û Loran  
Behdîn û Botan  
Şenbo û Roşkan

Mirdas û Melkîş  
Siwêd û Şêrwan  
Hemî der û dor  
Meclîs û dîwan

Tev gund û bajar  
Ev gund û mesken  
Dilxweş û jîndar  
Rûgeş û bi ken

Li jêr û li jor  
Welatê kurdan  
Em bextewar bûn  
Li van beledan

Em dewlemend bûn  
Bi bajarvanî  
Bi serbilindî  
Bi şaristanî

Welatek zengîn  
Bê derd û elem  
Li gor Cizîrî  
"Wek baxê îrem"

Kurd serfiraz bûn  
Azad û aram  
Giş bermiraz bûn  
Axa û xulam

Zarê zikmakî  
Serbest dixwendan  
Bi zanîn û pakî  
Torinên Medan

*Dom dîke*

## Berê min ketiye Xozatê

Zû bi zû nagire  
û nabare her sal  
ji çirra şîr spî, delal  
berfê girtiye Berîka Mêrdînê  
tu bibînî, li Çiyayê Omeriya tê kabê  
dibêjin heta adarê ranabe!  
xezala'm mekeve rê,  
tu bi ser min ve nabî!..

bi lingên hinekirî, min tu divê,  
bi porê mifil-mifilî  
di bin hevrişîma hebriyê de berbiskên erebî  
gerdena te de mircan, bêvilê de xizêm...  
xwestiya ji çend salan ve yî bûkê  
rahiyî buxçikê û tu bêyî!  
nenas î, rêbiyan î, nezan î  
mijeke kor Mûnzir ji erdê hilanî,  
û Dêrsim ketiye bextê hikumeta vî zemanî!..

....

dîsa dayê..  
xezala'm mekeve rê;  
darên berû ta digrin,  
tu û vê sermayê!..  
mîrekê demê çele ye niha  
tu rê naçe ser riya hêviyê  
çefiyê dipêçim û dikim gilokek xem,

**ARJEN ARÎ**

li hêviya adarê ye cehenem  
û ez û tu,  
û ez û Mûnzir,  
û ez û Tûjik...  
heft meh in berf e barê me  
ku gur xwe li gur dipêçe  
û hirç nayê der ji gehê!  
dîhnek e,  
dîfîkîne û tê  
sirra reşemehê!..

...

ji êvar de dayê!  
xezala'm mekeve rê,  
ha riya Dêrsimê ha ya Kerbelayê!

egîd im,  
nihîte  
û hijdeh salî,  
bi min dest pê dîkin  
çîrokên lehengiya duhezar salî  
kirasên berfê tên ku bigrîn,  
sê roj e bêzewad,  
sê roj e xurîn im  
yanî birçî me mîna guriyê sibatê!  
bi destên min ve nayê,  
bûye qetek ji qeşê  
hesinê vê kambaxê,  
polayê vê keleşê!  
û berf hê jî tê...  
ne min got; sê roj e xurîn im  
min nêt e te bibînim:  
berê min ketiye Xozatê.

# Di zaravayê kurdmancî de babetekî balkêş: Ergatîv

## S. UNUS

Zekî Bozarşan di hejama NÛDEMê ya 32an de bi nivîsareke berfireh li ser tewanga navdêran disekine. Navaroka nivîsarê bi dîrûdirêjî û şîretine xurt li ser rewanga serenavan e. Herçend navê nivîsarê di zimanê kurdî de tewanga serenavan be; lêkolîn bi temamî li ser zaravayê bakûr an jî kurdiya jor e. Ne tenê ev, lêbelê navdêra serenav jî bi awayê sernav hatiye nivîsandin. Bêgotin Z. Bozarşan serê xwe gelekî bi vê mijarê êşandiye û bi gelemperî armanca wî di nivîsarê de sivikkirina zimanê kurdî ye. Bi kurtî vî camêrî bi sedan nimûneyan an wekokan li ser tewanga serenavên nêr disekine. Li gor lêhûrnêrîna wî ev netîce ji nivîsarê derdikeve:

- hebûna tewangê di serenavên nêr de tenê fenomeneke heremî ye
- sê awayên tewangê (Felemez, Felemêz, Felemezî an Murad, Murêd, Muradî an hesp, hêsp, hespî....whd.) zimên dijwar dike û dibe sedemê sergêjîyê

Tê de tuşik tune ku dijwarkirina zimên tişteki bêmantiq e. Ji xwe gramer jî nikare bê guhirandin. Lê balkêşiya giring ew e ku kovara Nûdemê di ciyê xwe de vê nivîsê weke nêrîneke nivîskar dibîne û vî babetî ji raberizînê re vekirî dihêle û dibêje ku: li ser vê mijarê wê bête mînaqêşe kirin. Ji xwe armanca vê nivîsarê jî ev e. Bi a min mijara ku kovara Nûdemê ji mînaqêşe re vekirî hîştîye, têkîlya wê bi termînolojîya ERGATÎV re heye. Kerem bikin, em hinekî li ser vî babetî serê xwe bêşînin an jî raberizin:

Li gora Nivîskar:

Van navan  
Sernavan netewandiyê  
Dinyayê piçûk kirine  
Van tiştan nivîsîne  
Min hevokan nivîsand

Li gora kovara Nûdemê:

ev nav  
sernav netewandine  
dinya piçûk kirine  
ev tişt nivîsîne  
min hevok nivîsandin

Bêguman xwendevanên me yê zîrek jî dibînin ku hemûşk bêjeyên nivîskêr hatine tewandin. Ango di awayê "casus obliquus" de ne. Bi gotineke din ew bireser in. Lê kelîmeyên wek "ev nav-sernav-dinya-ev tişt-hevok" nehatine tewandin. Ango di awayê "casus rectus" de ne. Yanê netewandî an jî kîrar in. Çima nivîskarekî evçend dikare hukmî zimanê kurdî bike û zaravayê kurdmancî jî rind dizane van bêjeyan di demên wan ên borî de bitewîne; û li gor kovara Nûdemê jî divê(t) nehatin tewandin sergêjîyeke mezin eşkere dike. Ev sergêjîya di gelek kovar û kitêbên me yê din de jî heye. Gelek nivîskar û çî heyf hin zanyarên me vê meselê wekî teybetîyeke zimanê kurdî dihesibînin. Zimanê kurdî ji asîman danehatiye ku xusisîyeteke wî ye bi teybet hebe. Ev ava di gelek zimanên din de jî heye. Ji xwe emê paşê li ser vê mijarê bi dîrûdirêjî û bi aweyekî sistematîk bisekinin. Bêguman di zimanê kurdî de jî wek zimanine din hin teybetî hene. Lêbelê ne wek teybetîyeke bi payebilind ku serê mirov pê gêj bibe. Nivîskara Alman Petra Wurzel<sup>2</sup> dinivîse ku di zimanê kurdî de "ergatîv" zehf jîndar e. Kurdine xwendî hin caran li şûna ku binvîsin "te ez birim" an "te ez dîtîm"; dinvîsin ku "te min bir...!" Ev tê wê meneyê ku wekî ez bi-bêjim: te min dît ??

Dibe? Bêgotin nabe!

Nivîsareke Filît Totanî ye pêşya 20 salan di kovara TÎRÊJÊ de hatiye nivîsîn meselên wiha bi pisporî wek komediyekê tîne zimên. Kî meraqdarê vê nivîsê be, bila wê nivîsara F. Totanî ya bi navê de were binvîsîne (serborî) bixwîne. Tişteki din î bala mirov dikişîne ev e ku di nivîsara Z. Bozarşan de tu navê berhemekê nayê danîn. Herçend fikra vî camêrî baş be û bêşik fikra sivikîrîna zimên di aliyê tewang de tişteki giring be jî ciddiyeta nivîsê bi gotinên li ser lêkerên tiransîtîf û demên wan ên borî, "ev qayîde mexsûsî zimanê kurdî ye û ne bawerim ev qayîde di zimanên neteweyên din de jî hebe" ji ciddiyetê dûr e. Tutişteki van îddiayan zanistî nîne. Pîrsa tewanga navên nêr di demên wan ên borî de serê Mîrê me yê nemir C. Bedirxan jî gelekî eşandiye. Yê meraqdar dikarin di HAWARÊ de xalên 52 hetanî 60, Bingehên Zimanê Kurdmancî, bixwenin. Mîrê ku dikete gelek kirasan, geh zaniyar û rojnemevan, geh şîretvan û wergêr, geh seydayê gerok wek hozanekî bê-

deng î xemgîn, geh jî bi nostaljiya çiyayê Herekol koçerekî li zozan, êl û eşîran; derwêşê li serê çiyân, baniyan, newalan, geliyan û kendalan; û geh jî li hin û şiverêyan, li hervaz û bejêran, guhdarê dengbêj û çîrokbêjan; geh xeberguhêz, nêrevan û zimanas û lêkolîner; ev mijar di koçe û kolanên Stockholmê de nenivîstî. Mîr C. Bedirxan bi awayekî zehf zelal û vekirî li ser tewanga navdêran disekine. Herçend tewanga serenavên nêr di yekejimarê de bi "-î" û "-ê-" ve bête kirin jî meyildarî terikandinê ye. Jiber ku di hemî navdêran de dengdêrên "e" û "a" peyda nabin. Hewcetiya tewandina dengdêrên "o,u,û,i,i" jî tune. Jixwe armanca nivîskêr jî ev e. Em di vî babetî de heyê ku hemfikir bin. Lê, armanca nivîsara min ne li ser tewanga serenavan e. Armanca, lêkolîn, lêhûrnêrîn û jihevderxistina termînolojiya "ergatîv" e.

Pêşiya ku em hinekî li ser mijara ergatîv bisekinin û lêbikolin, çêtir e ku em li vê şemaya jêrîn binhêrin, daku ev xusûsiyeta ku li gora gelek nivîskarên me tenê teybi-tiya zimanê kurdî ye têbighêjin:

Te		
Wî		
Wê	ez	dîtîm
We		
Wan		

Te		
Wî		
Wê	ez	dîtîm
We		
Wan		

Di şema jorîn de tiştin li hev nayin. Herçend lêkera "dîtîm" lêkerekê gerguhêz be û bi pronavên bireser hatibin kar anîn jî; di vir de sergêjîyê berbiçav heyê. Em dikarin bibêjin, herwekî li vir awayê pasîf hatibe bikaranîn. Lê, awa ne lebatî be jî, wekî hevokê lebatî tê guhê meriyan. Dûpaşa "-im" bêgotin aîdî "ez" ê ye. Herwekî tu bibêji, "ez hatim dîtîm" an "ez ji aliyê te,wî,wê,we, wan ve hatim dîtîm". Bi rastî çî ye ev konstrûksiyon an zimansazî? Ev zimansazî nikare bibe pasîf, lewra di zaravayê kurdmancî û soranî de pasîf/lebatî heyê: Ez hatim dîtîm (bi Soranî: min bîn.ra.m) an serê zarok hate şûştin. Ergatîv pasîf/lebatî.

- Di vir de kirde an kiryar heye ya na?
- Lihevhatinek li vir heye an na?
- Ma gelo ziman li vir tevîhev dibe?
- Çima li vir pronavên kirar bi ên bireser tên guhartin. Yanê, yên kirar dibin bireser û ên bireser jî dibin kirar? (= Casusóoppositisyon rectus/obliquus)
- Ev sitrúktura ku li gor hin zimannasên me teybetiya zimanê kurdî ye, di hin zimanine din de heye an na? Di farsî, urdû, peşrû, hindî û nepalî de heye an na?
- Di zaravayê jêr an di soranî de ev awa bi çi tehrî ye? Heye yan na? Lê, di Dimilkî de bi çi tehrî ye?

Bêgotin gava ku em lêkereke negerguhêz bikarbînin, ev sergêjî peyda nabe. Lewra di lêkerên negerguhêz de lihevhatinek di navbera pronêv û lêker de heye. Pronav di lêkerên negêrguhaz de her kirar dimîne. Yanê pronav di hemû deman de bi awayê casus rectus de ye. Bêşik têkilya kirde/kiryar û lêker bi awayekî zehf eşkere xuya ye. Dûpaşên bi lêker ve dibin, vê têkilya kiryar-lêker ne tenê ji aliyê semantîk ve; herweha ji aliyê morfolojî ve jî bi zelalî didin xuyandin:

Dema berdest:

Ez diçim  
Ez dikevîm  
Ez direvîm

Dema borî:

Ez çûm  
Ez ketim  
Ez revîm

Di lapêrîna lêkerên "çûn/çûyîn, ketin û revîn" de "lihevhatinek" berbiçav e. Jixwe di zaniyariya zimannasî de, ji vê konstruksiyonê re "kungruenz" tête gotin. Bi gotineke din, di casus ,numerus, tempus û modus de kungruenz; yanê lihevhatin heye. Lêbelê ev lihevhatin di demên borî yên lêkerên gerguhêz de tune.

Kerem bikin, em tevayî vî babetî hinekî bikolin:

- A) Derdekî bêderman -kula termînolojiyê-
- B) Ergatîv çi ye û di kîjan zimanan de heye
- C) Çend gotinên destpêkê, lê ne yên dawîn jibo Cafê NÛDEM

A) Kula termînolojiyê:

Gotineke îngilîzan heye: "too many Indian chiefs, but no Indians". Yanê serok pirr in; lê hîç çêrmsor nîn in. Mamoste pirr in; lê xwendevan tune ne. Mesela termîno-

lojiyê di zimanê kurdî de hema bi rastî ev e. Heryek serê xwe têrmekê an rêgîştî-  
nekê çêdike. Niha meriv dê kîjan termînolojiyê bikarbîne. Têrm pirr in, lê kîjan ya  
rast e? Hetanî desthêladariyeke bi zexm tekûz nebe, ev problem wê hertim hebe. Ji-  
ber vê meselê wê termînolojiyên me jî li hev zêde bibin. Tabloya jêrîn vê rastiyê bi  
awayekî vekirî dide pêş çavên me:

Latînî	transitiv	intransitiv	pronomen	casus rectue	casus obliquus
C. Bedirxan	gerguhêz	negerguhêz	pronav	kirar	bireser
K. Bedirxan	sergerandî	nêgerandî	pronav	netewandî	tewandî
Q. Kurdo	derbas/têper	nederbas	cînav	halê rast	halê çivane
S. A. Amedî	derbas/têpe	nederbas	cînav		
F. M. Aykoç	têper	têneper	bernav	radêr	tewangî
A. Balî	derbaz	nederbaz	pronav/cînav	halê rast	halê tewangî
F. H. Saniç	dervaz	nedervazî	cînavk	desta ez	desta min
D. Îzoltî	sergerandî	pêgerandî	pronav/bernav		
Torî	buwartî	negerandî			
J. Bamernî	têper	têneper	cihnav	awayî karayî	

Tabloya hanê rastiyekê wek kuleke bê derman pêşkeşî me dike. Ev rastiya bi tenê  
nimûneyeke piçûk ji hezaran nimûneyan eşkere dike. Camêrên ku heryek bi serê  
xwe termînolojiyekê dixulqîne bi niyeteke baş dikin. Ev rastiya me ya cîvakî û polî-  
tîkî ye. Otorîteke me ye bi zanistî li ser van bûyeren bisekine tune. Mabesta vê lê-  
kolînê ne ev e ku dev bavêjim merivên serê xwe ji bo ziman û çanda kurdî diêşînin.  
Lê, jibona ku di nivîsarekê de meriv hevûdu fehm bike, ji me re termînolojiyeke  
hevpar û bi mantiq lazime. Di danûstandina me ya ku emê li jêr de bikin jixwe pê-  
wîstiyek e. Di nivîsarekê de bêjeyên wek "kirar û bireser", "guhêrbar û neguhêr-  
bar", "tewandî û netewandî", "sererast û bireser", "halê rast û halê çivane" herçend  
wek "casus rectus û casus obliquus" deng bidin jî; lê nayê wê watê. Dehabûna reh-  
metiyê C. Bedirxan ji vir tê ku wî cara yekem ferqiyeta di navbera -ê û -î de wekî  
dirûvê zayenda femînînum û maskulînum di casus obliquus de kifş kir. Hetanî  
hingê gelek zanyarên bi zimanê kurdî mijûl dibûn, nizanibûn ew tewanga navên  
mêza û nêrza ya casus obliquus e. Yanê bireser jî tê tewandin. Ji ber vê yekê tewan-  
dî an netewandî; guherbar an neguherbar nayên mena bireserê. Bêjeyên kirar û bi-  
reser hal û awayek dijber me didin nîşandin. Awayê kirar rewşeke ji bireser cihêtir  
me dide diyar kirin. Heke hûn rê bidin, ezê di vê kurtenivîsarê de bêjeyên gerguhêz  
û negerguhêz di mena transîtîf û întansîtîf de; kirar û bireser jibo casus rectus û  
casus obliquus bikar bînim, da ku em hevûdu serwaxt bikin.



## Ergatîv çî ye?

Ergatîv bêjeyêke yûnanî ye. Kok û bingeha wê ji bêjeya ergates<sup>8</sup> tê. Tê wateya yê dike, yê dilive an yê/ya dibeze. Yanê kiryar an kirde jî kê m û zêde tèn wê watê. Di latînî de ji yê/ya dike an kiryar re jixwe agens dibêjin. Ev termînoloji, di zaniyariya zimanasiyê de ciyê xwe zehf rind girtiye. Herweha ji awayekî zimansaziye re jî konstrûksiyona ergatîv tê gotin. Gelek zaniyar bi dudilî bêjeya subjekt (kirde, kiryar, kirar, kirin an fîl) di zimansaziya ergatîv de zar dikin, da ku li gor hin zaniyaran di rewşa ergatîv de kiryar ne diyar e. An jî kiryar dibê bi tenê fenomenekî mantiqî yî instrementûalî an bi hacet û dezhahî mîna bûyereke relatîf, lêbelê ne absûlut. Meriv dikare rewşa tewangê ya lokatîv, genetîv û instrûmentûalî di tûrikê avasaziya ergatîv de bihesibîne. Herçend li vir rewşeke tebatî tune be jî; kirdeyekî li anegorî rewş û kirinên mantiqî heye. Lêbelê, ev kirde xwe ne xuya ye. Di gelek zimanên Kafkasyayê û Baskê, zimanên îranî yên nû, zimanên Emerîka bakûr û nîvro de ev avasaziya ergatîv heye. Di zimansaziya ergatîv de kirdeya lêkerên gerguhêz ji ya lêkerên negerguhêz cihêtir tê bikaranîn. Kiryar di vî awayê zimansaziye de bi awayekî lokatîv an genetîf kirina xwe tîne pêk, lêbelê subjekt ne eşkere ye. Bi tenê meriv fehm dike ku kiryar an subjektekî bi hiş û mantiqî heye, jiber ku lihevhatin di navbera kiryar heyber/obje lêker de tune ye:

Yekejîmar:

Te ez derman kirim

Te ew şuştin

Dixtor ez derman kirim

Keçikê ez derman kirim

Xortekî ez derman kirim

Pirejîmar:

We ez derman kirim

Wwe ew şuştin

Dixtoran ez derman kirim

Keçikan ez derman kirim

Xortan ez derman kirim

Lêker.....kirin û şuştin

Kiryar.....te, ew, Dixtor, keçik, xort?

Objeya akusativ.....ez derman, ew.

Dirûvê ku li vir kiryarê binimîne, divê - im an -in a ku bi kirin û şuştinê ve zeliqî be. Lêbelê lihevhatin di navbera kiryar û lêker de mewcut nîne, jiber ku dûpaşên - im û -in ne aîdî kiryaran; lêbelê aîdî ez û ew ê ne. Yanê lihevhatin di nav kiryar lêker de mewcut nîne; lê, lihevhatin di nav obje û lêker de heye. Jiber ku,

Objeya dîrekt: .....ez derman..... e.

Lê tiştê balkêş yê di ristesaziya jorîn de, yê "derman dike", ne "ez im"; bervajî wê "tu yî". Herwekî hevokeke pasîf:

Ez ji aliyê te ve hatim derman kirin.  
Ez ji aliyê keçikê ve hatim derman kirin.  
Ez ji aliyê xort ve hatim derman kirin.

Em hinekî guhê xwe bidin rehmetiyê C. Bedrixan, ka ew ji vê avasaziyê re çi dibêje:

56- Awarte: Bi tenê û ji qeydê der di lêkerên gerguhêz û di zemanê wan ên borî de bireserên wan weke xwe dimînin û ji bervajî ve kirarên wan têne tewandin. Ji lewre, di komekên jêrîn de rexma ko bêjeyên: Zîn, hesp, çêlek, zarok, kirar in, hatine tewandin û bêjeyên; Sîsin, ceh, pencere yên ku bireser in weke xwe mane ne hatine tewandin. Zîne Sîsin dît. Hespan ceh xwar. Çêlekan giya xwari bû. Zarokan pencere şkênand.

78-Awarta: Herwekî di mada (56) de hate gotin, navdêr gava kirarê lêkereke gerguhêz in, di zemanên wan ên borî de weke bireseran têne tewandin û bervajî ve bireserê wan ên sererast weke xwe dimînin. Ji ber vê yekê di van lêkeran de pronavên kirar bi ên bireser diguhêrin û her yeke wan dikeve şûna a din; yanî pronavên kirar dibin bireser û ên bireser dibin kirar.

Ji lewre lêkerên wek "gotin, xwarin, xistin" di zemanên xwe ên borî de bi pronavine bireser têne çevandin û bireserên wan ên sererast bi pronavine kirar têne nîmandin. Herwekî: Min got, te xwar, wî xist, we got, wê xwar, wan xist, me xwar. Çend mîsal:

Zîne Sîsin dît.

Hespan ceh xwar.

Min qelem ji destê xwe xist.

Cîranan em dîtîn.

Soro ez xapandim.

Wê ew dît.

Wan ew xwar.

Min ew ji destê xwe xist.

Wan em dîtîn.

Wî ez xapandim.

*Dom dike*

## Piçik piçik dijîm

Di mewîjka çavên min de bîrov e  
Lorînên li ber seran doş dibe  
Û li şûna benderên min  
Şopa cencerên xerîb xerabe.

Lêvrîcîfîna sistok im  
Bi awirên şîrkî  
Di xewa min a çilek de  
Fîrînên bê bask in xewn  
Dînoke  
Ziravqetandina kevroşkekê ye mêraniya min  
Di pînan de lûsa bê motik im  
Belalûkên xwe dikurîşînim  
Kerînokên xwe dicûm  
Pûç dibim  
Pûç dibe movikên piştê  
Li kadînan bawîşkên xîzîzîkî  
Bi kulmozan vedidim  
Û li mazatan nîrxên mîrate xurde dikim  
Piçik piçik dijîm

Werza gulbişkivîna derengmayî ye  
Newalên hêşîn  
Li qirnê çardeha -me-  
Û pirtûyê gulê me ez  
Ji parsûyên striyên wê dertêm  
Bi aviya gezgezokan dişikînim xura xwe  
Bi hezar aziban re zewicîme  
Ji hezar zewacan azib mame  
Di gulavdankan de gulava westiyayî

Li banoxeyê kela heskîfê "konê pîrê" av didim  
Piçik piçik dijîm

Bizrê kulî me naqedim  
Ji 28 sêpiyan mame  
Tijî pîne bûme naqetim  
Mirama marê kor im  
Axîna tûmek pûngê  
Li bin birkên hedimî  
Hemze pêlewan im  
Li "zîndana darê" bê av  
    Û li xiraman sûskên qerimî me  
    Piçik piçik dijîm

## Ziman xweş be

Serjê meke ji min re berxa li pêş malê,  
Ne jî pêşkêş ke diyariyeke nerxbilind.  
Tenê bide min dilekî pak,  
Hevaltiyeke bo armancên çak.  
Û meke ji min re gotinên mezin,  
Ez birçî me bo peyveke bedew,  
xwenasdanêke bêyî derew.  
Mazûvano!  
Bide mêvanê xwe nanekî tisî,  
Lê zimanekî xweş û şêrîn.  
Mirovtî bi gotina qenc ber bi pêş diçe,  
Ne bi goştê mirîşkan û kevçiyên zêrîn.

**ŞAHÎNÊ B. SOREKLÎ**

# Tewang di zimanê kurdî de



MÛRAD CIWAN

Naveroka vê nivîsê li ser pirsê tewangê ye. Tewang yek ji wan pirsan e ku pirtirîn tê mînaqêşkirinê. Lê berî hatina ser bahsê, bal tê kean ser çend aliyên mînaqêşeya li ser prensîbên giştî yên ji bo zimanekî yekbûyî yê standard.

Lêkolîn û mînaqêşeyên zanistî li ser zimanê kurdî kêm in. Carinan nivîskar an jî mamosteyên hînkirina zimanê kurdî ji ber ku di jiyana xwe ya nivîsandin û hînkirinê de pêrgiyê pîrsgirêkan dibin, dikevin nava hin mînaqêşeyên li ser zimanê yekbûyî yê nivîskî yê standard û bikaranîna rêzimana kurdî.

Ji bo ku zimanekî nivîskî yê standard hê têr negihaştîye û li seranserê Kurdistanê (ji bo kurmançî li nava tavayîya kurmançîaxêvan) xwe serdest nekiriye, tesîra devokan hema hema di hemû nivîsên edebî û metnên hînkirinê de xwe didin der. Gava ev nivîs ji bal xwendevan an şagirtên herêman din tên xwendin, ew gellek tiştan di wan de dibînin ku ne li gora axavtina herêma wan e, ew wan xerîbê xwe dibînin û reaksiyonan nîşan didin.

Ev fenomeneka tebîî ye. Heta zimanekî standard ê naskirî, qebûlkirî û hezmkirî-yê hemû herêman dernekeve û nebe bikêrhatîyê jiyana wan a rojane ya pir alî, re-

aksiyona dûrixwedîtîne ê her berdewam be.

Lê reaksiyon bi vê hîskirinê tenê namîne, minaqeşeya li ser rastî û nerastiya gotinan û awayên rêzimanî jî dest pê dike. Hin jê, devokê wan bi çi awayî be ya xwe rast dibînin. Hinên din jî bi hin bingehan berepêş tên û daxwaz dikin ku ev bingehe bibin rêberê awayê axaftin û nivîsandinê.

Wekî her zimanî ji bo kurdî jî bingehe hene û yekî ku bi kurdî diaxive û dinivîse mecbûr e li ser wan bingehan bimeşe. Ya din, ji bo pêkanîn, geşkirin û kemilandina zimanekî yekgirtî yê nivîskî divê îradeyeka mişterek a lihevkerî ya millî li ser rê û dirban jî hebe da hemû kurdîxêv û kurdînivîs xwe bispêrin wan. Gava meriv bi hûrî û kûrî li ser pirsgirêkê radiweste, derdikeve ku gotin pirr rehet e lê kirin zehmet e. Bingehe û prensîbên ku tên pêşkêşkirin li ser kaxezê gellekî maqûl in, lê gava di jiyane de meriv dixwaze li gora wan bimeşe tê dîtî ku ew ne ew qasî jî bikêrhatî ne ku li her derê bi her awayî rêberiya meriv bikin.

Li xwarê çend xal ji yê minaqeşeyan hatine destnîşankirin. Yek jê, tê gotin ku di axaftin û nivîsandinê de divê em tim û tim kurdistanî bifikirin herêmi nefikirin. Ma kurdekî hişyar ê hayjêhebûyê milletê xwe heye ku li hemberî vî prensîbê derkeve. Heke ev prensîb hergav ne li ber çavan be, zimanekî yekbûyî yê ji bo seranserê Kurdistanê pêk nayê. Lê gelo "fikirîna kurdistanî" çi ye? Di qonaxeka wilo de ku hemû awayên ku tên nivîsîn kêmi zêde di binê siya herêmiyê de ne, kîjan tercîh kurdistanî û kîjan herêmi ye. Hilbijartineka di rewşeka wiha de ne ew qas hêsa ye. Gava varyantek hebûya ku li seranserê Kurdistanê derbas bibe, pirr hêsa bû ku meriv kurdistanî bifikirîya, li hemberî yê herêmi ew varyant tercîha bikira. Dikare bê gotin ku divê meriv tercîha devokê herêmi yê herî berfireh bike, qet nebe ji bal pîrîniya kurdan ve tê axaftin. Carekê devokê herî berfireh nayê wê maneyê ku ew ji bal pîrîniya kurdan ve tê axaftin. Ew yê herî mezin e, lê gava axêverên hemû devokên din werin nik hev, ew li hemberê wan di hindikayîyê de dimîne. Ya din, ew bi xwe jî ne ewende homojen e, di nava xwe de xwediyê nelihevhatiyan û pirsgirêkan e. Li xwarê em ê ji alî hin awayên din jî li ser zêfîyên vî bingehe rawestin.

Prensîbekî din jî dibêje ku gava em dinivîsîn an diaxivin, divê em bi kurdî bifikirin ne ku bi erebî, tirkî yan jî farisî. Ev jî prensîbekî heyatî ye, divê tu carê ji ber çavan neyê wendakirin. Lê di rewşeka wilo de ku zimanê kurdî ji gellek lehce û devokan pêk hatiye, cudayî di navbera wan de hene, bi hezaran sal in ku zimanê kurdî cînartîya van zimanên biyanî dike, bi sedan sal in ku axêverên van zimanan serdestê Kurdistanê ne, bi saya dagirkerî û hêza siyasî, aborî û kulturî, bi saya dîn, bi saya asîmîlasyonê zordarî û bi riya jiyana têkilbûyî ya mişterek, hidûdê "kurdîfikirîn",

"erebîfikirîn", "tirkîfikirîn" an "farisîfikirîn"ê di ku derê re derbas dibe. Gelo tu lêkolîn li ser vî hidûdî hatiye kirin, ev hidûd di bin ronahiya ilm û zanîne de ew qas diyar e ku her kurdîxêv û kurdînivîs karibe wî bibîne? Pişt re zimanên cîran ku têkiliya wan bi hev re çê dibe dualî tesîrê li hev dikin û hin gotin an qaîdeyên xwe didin hev û ew ji bal wan zimanên wergir ve tînen hezîmkirin. Ma divê ev jî bînen avêtin, çawa?

Wekî li jorê jî hat destnîşankirin, bîngehek jî ew e ku tê gotin gava cudatî di nava gotin an bîngehên rêzîmanî yê devokên cuda de hebe, divê em wê gotinê yan jî wî bîngehî ji bo xwe hîlbijêrin ku ji bal piraniya Kurdistanê tê bikaranîn. Ev heta derceyekê maqûl e lê nayê wê maneyê ku ji sedî sed hergav dikare bi serê xwe bikêrî me were, Her tiştê ku ji bal piraniyê tê axaftin nayê wê maneyê ku bi kurdî ye, qaîdeyê rêzîmana kurdî ye û sivik û bikêrhatî ye ku dikare bibe bîngehê seranserîya zîmanê kurdî. Hin fenomen di nava axêverên pîrîraniya kurdan de hene ku di van salên dawiyê de bi saya masmediya û asîmîlasyonê dijwar a zîmanê tirkî ketine nava zîmanê me, bîngehên rêzîmanî yê kurdî xera dikin. Devjêberdan an şaşbikaranîna tewangên nav û cînavan nîmûnenî gellek berbiçav in.

Her wekî;

**"Ez xwarim"** ji dêlva **"Min xwar"**.

**"Ez gotim"** ji dêlva **"Min got"**.

**"Te min bir"** ji dêlva **"Te ez birim"**.

**"Me berxan anî"** ji dêlva **"Me berx anîn"**.

**"Xezalê helbestan xwend"** ji dêlva **"Xezalê helbest xwendin"**.

**"Kurik ji wî keçikê hez dike"** ji dêlva **"Kurik ji wê keçikê hez dike"**.

Yan jî hê xerabtir axavtineka wiha: **"Em pê re gorişmîş bûn, me gorişa xwe jê re aqtarmîş kir....."** ûhwd.

Pêşniyazeka din a li ser bîngehan ew e ku, divê di mesela rastnivîsîn û rastaxavtinê de em li edebiyata kurdî ya klasîk binêrin. Ev jî xalek ciddî ye. Yek ji wan çavkaniyên me yê bîngehîn edebiyata me ya klasîk e. Ew bi gellek awayên xwe pêşiya me ronî dikin. Lê heke em baş bala xwe bidinê em ê bibînin ku ew jî bi sere xwe têra me nakin, heta gellek caran dikarin bibin sedemên rêgihîştinên şaş. Edebîyata me



ya klasîk edebiyateka biwezn e. Yanî ji şîran pêk tê. Di şîra kevn de rola wezn û qafiyê esas e, heta di wê derecê de xwe ferz dike ku edebiyatnas qebûl dikin ku ji bo xatirê wezn û qafiyê meriv hin fedakariyan di bingehên rêzimanî yê zimên de bike. Di şîren klasîk de meriv carinan dibîne ku pîrensîbê tewangê an yekî din ji ber wezn û qafiyê hatiye îhmalkirin. Xusûsiyeteka din jî, hin diyarde di wan şîran de peyda dibin ku ji kevn de bes li nava hin mîrekiyan hatine bikaranîn lê ji ber hin sedeman îro ji bal axêverên wan herêman bi xwe jî hatine terikandin. Ev awanî wisa ne ku ji bal wan kesên ku dibêjin divê em wekî edebiyata xwe ya klasîk bikin jî nayên bikaranîn.

Pêşniyazeka din jî heye ku dibêje lazim e em li folklorê xwe binêrin. Rast e belkî ji hemî çavkaniyan bêtir ya ku di ware rastnivîsandin û rastaxavtinê de rêberiya me bike folklorê me ye ku bi stiran, çîrok, çîvanok, nîfir, pend û pêkenînên xwe xezîneyeka bêbinî ye.

Tevî wê jî di jiyandê de meriv dibîne ku folklorê bi xwe jî bi sere xwe têra wê yekê nake ku rênîşanderiyê li me bike. Gelo, gava em dibêjin em li folklorê xwe binêrin qesda me kîjan folklor e. Helbet folklorê ne ya herêmekê an devokêkî du devokan e. Çi qas lehce, devok û herêmên me hene ew qas jî varyantên folklorên me hene. Pîrraniya sitran û çîrokên kurdî li hemû herêmên Kurdistanê ji bal hemû çîrokbêj û dengbêjan ve tên gotin. Her dengbêj an çîrokbêj wan bi devokê xwe dibêje, gotin û qayîdên devokê xwe dixê navê. Heke mesele folklorê be hemû jî folklor in, em nikarin bêjin ku ya filan herêmê folklor e û ya bêvan herêmê ne folklor e. Piştî re her ew stran an çîrok li gor dewranan jî diguhere. Meriv dibîne ku stranek di destpêka sedsala 20-ê de bi awayekî û di dawiyê wê de bi awayekî din hatiye gotin. Her du awe jî folklor in. Michael Chyet 18 varyantên Memê Alanî berhev kirin ku hemî jî varyantên folklorî ne. Kes nikare bêje ku em 17-yan ji wan bavêjin, yekê ji xwe re bihêlin û bibêjin ku ew folklor e.

Yek ji wan bingehan jî ew e ku divê em li berhemên zimannasan û lêkolîneran zimaneke xwe vegerin. Lêkolînan ku li ser zimên hatine kirin, bingeh û rê û dirbên ku di encama van lêkolînan de hatine pêşkêşkirin bi gellek awayan bingehên esasînan ên rêziman û rastnivîsandina kurdî ronî kirine. Lê heke em rastiyeke bêjin diyar e ku di warê lêkolîniya ilmî ya zimannasiya kurdî de gellek kêmasî hene. Hejmara zimannasên biyanî yên ku li ser kurdî xebatên ilmî kirine ji pêçikên destekî ne pirr zêdetir in. Îmkanên wan ên lêkolîniyê jî gellek kêma bûne, wan nikaribûye ku ew biçin li Kurdistanê bi berfirehî bigerin, dûrûdirêj û pîrralî lêkolînan bikin, ew yan qet neçûne Kurdistanê, yan bi seyahetên demkurt di nava kurdan re derbas bûne, yan

jî bi îmkânên xwe yê şexsî bi pîrsê bilyane. Lêkolîn û berhemên enstîtuyan, ên dezgehên ilmî gellek kêman in. Ji aliyekî din jî, ew kes biyanî bûne, bivê nevé neşiyane di dereceyeka têr de bibin têgihîştîyên zimanê kurdî û devokên wî.

Zimannasên kurd bi xwe jî heta van salên dawiyê yek du kes bûne. Ji alî kurmançî ve gava meriv bala xwe bidîyê her çendîn hin kesan (Kamûran Bedirxan, Osman Sebrî, Cîgerxwîn, Reşîd Kurd, Sadiq Bahaeddîn Amedî û yê din) keda xwe danê jî yê ku ji alî zimên ve rê li ber me ronî kirine di esasî de du kes in. Celadet Alî Bedirxan û Qanadê Kurdo. Celadet Alî Bedirxan bê mînaqêşe danerê rêzimana kurdî, mîmarê zimanê me yê edebî yê nivîskî ye. Tevî ku wiha ye jî ji bo ku Celadet Alî Bedirxan gavavêjê gava yekê ye xebatên wî hemî warên rêzimanî û rastnivîsandinê zelal nakin, imrê lêkoleriya wî têra vê yekê nekiriye. Xebatên wî ji destpêkê ber bi dawiyê de ji qonaxeka netêrzelalîyê ber bi ya kemilînê de çûne. Loma jî carinan meriv di berhemên wî de bersîvên pîrsên xwe nabîne, carinan ew bersîv ne têrzelal in û carinan jî şaş in. Wî bi xwe gellek aliyên xwe yê têrzelal an şaş ên dewra destpêkê rast kirine. Lê mixabin ku hin jî bi kêmasiyên xwe mane. Hetta em dikarin bêjin ku hin bingehên têrzelal ên ku ji bal Celadet Alî Bedirxanî ve hatine destnîşankirin pişt re ji bal Kamûran Alî Bedirxanî ve hatine şîrovekirin û zelalkirin.

Piştî Celadet Alî Bedirxan yê ku di warê rêzimana Kurdî de divê bê binavkirin Prof. Qanadê Kurdo ye. Wî bi xebata xwe ya dîrûdirêj gellek aliyê rêzimana kurdî ronî kirine. Hin xusûsiyetên ku wî destnîşan kirine ji bal Celadet Alî Bedirxanî bi xwe jî nehatine dîtin. Tevî vê jî ji bo ku Kurdo kurmançiya kurdên Kafkasyayê û yê Asya Navîn ji xwe re esas girtiye gellek kil û kêmasî di destnîşankirinên wî de hene. Çimkî kurmançiya kurdên wan deveran zimanê civakeka biçûk e ku ji laşê xwe(civaka kurd a Kurdistanê) veder bûye û di nava milletên Kafkasyayê, Asya Navîn û Rûsyayê de belav bûy. Tesîra zimanên wan civakan bi awayekî eşkere li ser kurmançiya wê derê heye û vê, tesîr li xebatên Qanadê Kurdo kiriye. Tesîra zimanasiya zimanê ermenî û yê rûsî jî bi awayekî din li ser berhemên wî hene. Helbet ev ne kêmasiyên wî bi xwe ne, ew di nava wan hoyan de gihîşt, jê re firsend peyda nebû ku ew hoyên din ên civaka esasî ya kurdan bibîne. Diyar e ku di karûbarê xwe yê froyîn de divê em rewşa Qanadê Kurdo û tesîra wê ya li xebatên wî li ber çavan bigrin.

Di encama vê behsê de ji bo me derdikeve ku ew bingehên ku hatine destnîşankirin ji bo çavkaniyên rastnivîsandina zimanê kurdî hemî jî gellek giring in, divê em bala xwe bidin wan, bêyî wan nabe, lê tu yek ji wan jî bi tena xwe ji sedî sed bi-

kêrî me nayê û hemî derdên me derman nake. Gava em wan ji xwe re wekî bingeh qebûl dikin divê em di bîra xwe de bihêlin ka kêmasiyên wan çi ne.

Loma jî lazim e ku xebatên lêkolînên zanistî yên li ser zimanê kurdî ji her aliyê de berdewam bin, bêyî ku bê gotin ji aliyê grûbeka hindik an pîrraniya kurdan tê axaftin xusûsiyetên hemû lehce û devokan bîn ronahîkirin û hemberkirin da mîstereki û cudatîyên wan diyar bin. Carina xusûsiyetinî wiha di hin devokan de hene ku her çendî ji bal civakeka biçûk tîn axavtin jî ji ber ku her eynî xusûsiyet di gellek lehce û devokên din de ji ber asîmilasyonê wenda bûne ew pirs û pirsgirêkê li ber wan lehce û devokan jî li ber tevayîya zimanê kurdî jî çareser dikin.

Yên ku ji bo pêkanîna zimanekî yekbûyî yê nivîskî tim pala xwe didin lehce an devokê pîrraniya kurdîaxêvan, diyar e ku ne cudatî û wekhevîyên wî devokî, ne jî yên lehce û devokên din dinasin. Ew hema bi çavdêriyeka gelemperî hin qenaetên xwe dikin pîvanên giştî. Yê wiha ji pêşveçûna dîroka zimanan ji bêhay in. Di milletan de ne ku xusûsiyetên pîrraniya serhejmarîyê, lê hin fenomenên din tesîr kirine ku zimanekî nivîskî yê standard ê çawa peyda bibe. Hukmê siyasî û aborî, dîn, pêşdebûn û serdestiya kulturî û edebî û h.w.d. yeko yeko yan jî bi hev re rola xwe leyistine. Ji bo me kurdan diyar e di nav van fenomenan de ya herî bi tesîr wê pêşdebûna kulturî û edebî be. Ji axêverên kîjan devok an lehceyê pîrrtir nivîskar, rojnamevan, hunermend, xebatkerên ziman, kultur û ilm derên, ew lehce wê tesîra xwe ya herî diyar di avabûna zimanekî yekgirtî de nîşan bide.

Pişî ku xebata kulturî, ilmî û edebî di nava axêverên hemû lehce û devokan de heye û xebata bi vî awayî ne wek hukumdariya siyasî an aborî despot û tepisîner e, her lehce û devok jî wê li gora xwe tesîrêkê li vê pêkhatinê bike. Celadet Alî Bedirxan ku mîmarê zimanê nivîskî ye, hîmên avayîya zimên li ser lehce an devokekî ava nekirine, xusûsiyetên hemuyan li ber çav girtine. Zimanê edebî yê ku wî bi rê xistîye ji havênê gellek lehce û devokan pêk hatiye. Ronakbîrên kurd û xebatkerên kultur, ziman û edebiyata kurdî jî bi pîrranî dane ser şopa wî. Medam di pêşerojê de jî ev ê di pêşdexistina zimên de rola esasî bilîzin, hevî pîrrtir ber bi wê yekê de ye ku hemû lehce û devok wê para xwe têxin zimanê yekbûyî yê nivîskî.

## **Pirsa tewangê**

Pirsa tewangê ji gellek alîyan de dibe sedemê mînaqêşeyan. Zimanê kurdî zimanekî tewangbar e. Ev rastî ji bal herkesî ve tê qebûl kirin. Lê tewangbarî di ku derê wî de ye, gotin bi çi awayî ji bo çi û kengî tîn tewandin, ev pirs ne zelal in. Yek ji se-

demên minaqeşê ew e ku di hin halan de du awayên tewandinê hene. Hin devok di tewandina navan de tewanga "î" yê tînin dawiya navên nêr, hin jî dengdêrên navê nêr bi dengê "ê" diguherin. Her wekî;

Şivanî berx çêrandin.

Şivên berx çêrandin.

Gelo ji van awayan kîjan rast e? Yan jî em kîjanê bikar bînin? Di bikaranînê de hema hema her kes ya xwe bikar tîne û ya xwe rast dibîne. Di helbesta Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyra de û di hin helbestên Melayê Cizîrî bi tenê de tewanga gotina "Mela" carina ji dêlva "Melayî" bi awayê "Melê" hatiye tewandin. Celadet Alî Bedirxan û Kamûran Bedirxanî her du awayên tewangê bi kar anîne. Ez kêman caran di nivîsên xwe de cîh didim her duyan jî. Lê ez dizanim ku ev, di navbera wan kurdî-axêvan de ku di tewangê de dengê "ê" bi kar tînin, dibe sedemê nerazîbûnekê. Ji bo ku ez bi xwe ji herêmeka wiha me ku bi "ê" ditewînin, gava ez tewanga "î" yê bi kar tînim li ber çavê hinekan welê ye wekî ku ez îxanetekê bikim.

Yên ku tewanga "î" yê bi kar tînin ji bo ku di hindikayiyê de ne pirr deng û gazin ji wan dernayê, ew wekî xwe dinivîsin û bêdeng dimeşin. Lê yên din dengê xwe bilind dikin ku çima tewanga "î" yê tê bikaranîn, ew dibêjin ku pîraniya kurdan bi awayê "ê" yê ditewînin, lazim e em vî awayî ji bo zimanê resmî hilbijêrin. Yên ku bi vê baweriyê radibin di nav wan de kesên nivîskar, lêkoler ên xwedan nifûz jî hene. Mehemed Emîn Bozarslan yek ji wan e.

Ji alî rastî û şaşiyê ve helbet tu delîl tunene ku em bêjin ev awe şaş, an ev awe rast e. Her du awe jî di zimên de rolekê dilîzin di zimanê kurdî de hene û tînin bikaranîn. Loma her du jî rast in. Lê tiştek heye ku divê bê zelalkirin. Yên ku dibêjin pîraniya kurdan ji bo navên nêr tewanga "ê" bikar tînin rast nabêjin. Di tewandina navên nêr de ew him "ê" him jî "î" bikar tînin. Yanî tewanga "î" yê ew qas jî ne xerîbê wan e. Her wekî;

**Axêverên tewanga "ê" yê**

**Axêverên tewanga "î" yê**

**Navên nêr:**

<b>Netewandî, diyar</b>	Şivan hat.	Şivan hat.
<b>Netewandî, nediya</b>	Şivanek hat.	Şivanek hat.
<b>Tewandî, diyar</b>	Şivên got.	Şivanî got.

**Tewandî, nediyar**      Şivanekî got.      Şivanekî got.

Di van nimûneyan de diyar dibe ku gava navê nêr nediyar be (her du cumleyên rêza dawîn) li her du aliyan jî wekî hev tê tewandin û tewanga "î"yê tê dawiya navê nediyar. Tenê di tewandina navên diyar de (her du cumleyên rêza sisiyan) awayên ji hev cuda tên bikaranîn.

Heke meriv ji alî sivikbûn, sadebûn û yeksaniya bingehan bifikire tewandina navên nêr ên nediyar bi anîna "î"yê bikêrhatîtir e. Çimkî di awayê tewandina navên mê de jî li nik her du aliyan usûl ew e ku dengê "ê" tê dawiya navên mê.

**Axêverên tewanga "ê"yê**

**Axêverên tewanga "î"yê**

**Navên mê:**

**Netewandî, diyar**      Xezal hat.      Xezal hat.

**Netewandî, nediyar**      Xezalek hat.      Xezalek hat.

**Tewandî, diyar**      Xezalê got.      Xezalê got.

**Tewandî, nediyar**      Xezalekê got.      Xezalekê got.

Nexwe diyar e ku ew qas jî ne hêsa ye em hema tewanga bi awayê "î"yê bavêjin.

Minaqêşa pîrsa tewangê ji ber sedemekî din jî tê. Her çendîn kurdî zimanekî tewangbar e jî, asîmilasyona zimanên cîran (sebebê esasîn) jî tê de ji ber hin sebebên li her herêmê bi dereceyeka cuda tewandin winda dibe. Mesela li Kurdistana bin destê Tirkîyê meyleka berfireh heye ku her çendîn navên mê tên tewandin jî dev ji tewandina navên nêr tê berdanê.

Her wekî

Tegotin "**Xezalê anî**" lê nayê gotin "**Ahmedî/Ahmêd anî**", tê gotin "**Ahmed anî**".

Tê gotin "**Avê bide min**", lê nayê gotin "**Nanî/Nên bide min**", tê gotin "**Nan bide min**".

Hin ji wan kurdîaxêvên ku dev ji tewanga navên nêr berdane dixwazin ku her bi wî awayî berdewam be. Rexne li wan kesan digrin ku behsa tewangê dikin û wê di

nivîsên xwe de bikar tînin. Argumentên wan carinan ew e ku pêşveçûna zimên ber bi sadebûn û sivikayiyê de ye, madem prosesê tewandin rakirîye divê em cardin lê nezîvirin. Argumentê din jî dibêje ku "madem piraniya kurdan dev ji tewangê berdane divê em jî dev jê berdin". Ev argument jî ji ber gellek sebebên ne di ciyê xwe de ne. Yek jê pirraniya kurdan dev ji tewangê bernedaye. Tewanga navên mê(çi diyar û çi nediyar), tewanga navên nêr ên nediyar û tewanga cînavan (zamîran) hema hema ji bal tevayîyan kurdan tê bikaranîn. Yê ku hin herêman dev jê berdaye tenê tewanga navên nêr ên diyar e.

### Her wekî;

Her kes bi van awayan nav û cînavan ditewîne:

### Mê

#### Netewandî

**Nav:** Sêv sor bûye.

**Nav:** Sêvek sor bûye.

#### Tewandî

Sêvê bixwe.

Sêvekê bixwe.

**Cînav:** Ew sor bûye. [E]wê bixwe.

**Cînav:** Ewek sor bûye. Ewekê bixwe.

### Nêr

**Nav:** Nan pijiyaye. Nan bixwe. (Gerek "Nên/Nanî bixwe" be)

**Nav:** Nanek pijiyaye. Nanekî bixwe. (*Li vir waye hat tewandin hem jî bi "î"yê. Yanî hemî Kurd bi "î"yê ditewînin.*)

**Cînav:** Ew pijiyaye. [E]wî bixwe.

**Cînav:** Ewek pijiyaye Ewekî bixwe.

Yek ji sedemê nelirêtiya argumentên rexnegiran ew e ku yê ku dev ji tewangê berdane ne ku tenê natewînin. Carinan şaş jî ditewînin. Şaştewandin pirranî di tewandina cînavan de pêk tê.

**Her wekî;**

**Ji dêlva**

Te ez dîtîm.

Kê got?

Tu pirsî kê dikî?

Min jî wê jinikê re got.

**tê gotin**

Te min dît.

Kî got?

Tu pirsî kî dikî.

Ez jî wî jinik re gotim.

Yên ku navan şaş ditewînin jî hene. Ciyê balkêşiyeka gellek mezin e ku di nava kesên wiha de yekî wekî Mehemed Emîn Bozarslan jî heye. Wekî mîsal gava yê berhevoka wî ya bi navê Melayê Meşhûr bixwînin wê bibînin ku nav gellek caran şaş hatine tewandin.

Her wekî;

”Yek jî Melê dipirse:

-Mela, qiyamet kengê radibe?

Melê bersîva pirsî wî bi pîrsek dide: ...”

(*Bozarslan, Melayê Meşhur, r. 4*)

Tewandina rast a van cumleyan wiha ye:

Yek jî Melê dipirse:

-Mela, qiyamet kengê radibe?

Mele bersîva pirsî wî bi pîrsekê dide: ...

Mîsaleka din:

”Rojek dinêrin Melê nimêj dike.” (b.n.d r. 5)

Rastiya cumleyê wiha ye:

Rojekê dinêrin Mela/Mele nimêjê dike.

Ew kes û herêmên ku hay jî tewandina nav û cînavan nînin gellek şaşiyên din jî dixin nava zimanê kurdî. Çimkî tewang, hema welê bi tewandina xwe namînin,

fonksiyona wan bi wî awayî di zimên de heye ku tesîrê li kêşandina fiilên transîtîf û întansîtîf û ya deman dikin, nêr û mêtiya navan diyar dikin, di cumleyekê de objekt û subjektan ji hev veder dikin, bingehan ji tarîfkariya navan re datînin û h.w.d... Yên ku dev ji tewandinê berdane an jî şaş ditewînin di van hemû waran de şaşîfî û têkilheviyan dixin nava zimên.

Pîrsa tewangê ji aliyekî din ve jî pîr girîng e ku hin ji kurdan ji bo ku hay ji tewandina navan nînin tê nagihîjin ku çima du awe (grûb) cînavên kurdî (ez/min, tu/te, ew/wî/wê, em/me, hûn/we, ew/wan) hene. Hinek halê duduyan wekî zimanên din ên tirkî yan jî yên awrûpî texmîn dikin û dibêjin halê objektiyê/bireseriyê ye.

Hin jî tewandina navan bi mesela diyarî û nediyariya navan şîrovedikin. Yek ji wan jî Mehemed Emîn Bozarşan e ku van demên dawiyê di rojnameya Roja Teze de di bin navê "Kuncê Zimên" de gellek nivîsarên li ser zimên nivîsîn ku tê de her wiha pîrsa tewandina navan jî heye. Ew ji halê xweser ê navan re dibêje navên nekivşkirî û ji yê tewandîyê navan re dibêje navên kifşkirî. Bozarşan wiha şîrovedike: "Li herêma Badînan eger kurekî şagirtê dibistanê di dersa zimanê Kurdî da bi ser nekeve, di heqê wî de dê bê gotin 'Kurik di dersa zimanî da bi ser neket'. Bi tîpa 'î'yê tê kifşkirin ku mexsed ji 'ziman' zimanê Kurdî ye. Lê li piraniya Kurdistanê 'a'ya 'ziman' dibe 'ê' û peyvîk dibe 'zimên'... Mesela tê gotin 'Ferhadî xebera hatina te da min'; ji bo ku berpeyv (yê guhdar n.m.) bizane ku kîjan Ferhad e, peyvdar 'î'yek tîne paşîya navê 'Ferhad', bi wî awayî wî navî kifş dike, dide naskirin. Hingê berpeyv fam dike ku ne Ferhadek ji Ferhadan, lê belê Ferhadê ku ew û peyvdar tev wî nas dikin xeber daye peyvdar." (Rojî Teze, 31 tîrmeh-6 tebax 1999)

Helbet ev tesbîfî di warê rêzimana kurdî de xeletiyeka mezin e. Gava meriv tesbîfî teka wiha bike divê meriv ne zimanê kurdî naskiribe, ne jî ew kitêbên rêzimanê xwendibin. Yê navan kifş dikin ne ev tewang, lê ew artîkel in ku Celadet Alî Bedirxanî ew bi navê "veqetandek" an dane naskirin. Yanî artîkelên (y)a/(y)yê û (y)ek ji bo navên yekejimar, (y)ên û in jî ji bo navên pîrejimar bikar tên.

**Navên diyar (kifşkirî)**

**Navên nediyar (nekifşkirî)**

**Yekejimar**

**Nêr:** Yê Şivan hat.

Şivanek hat.

**Mê:** Ya bêrivan hat.

Bêrivanek hat.



**Navên diyar (kifşkirî)**

**Navên nediyar(nekifşkirî)**

**Pirejimar**

**Nêr:** Yên Şivan hatin.

Şivanin hatin.

**Mê:** Yên bêrîvan hatin.

Bêrîvanin hatin.

Di yekejimarê de gava tê gotin "yê şivan" û "ya bêrîvan" her kes pê dizane ku qesd jê kîjan şivan û kîjan bêrîvan e, yanî nav hatine kifşkirin. Lê gava tê gotin "şivanek" an "bêrîvanek", ne diyar e ku qesd jê kîjan şivan an kîjan bêrîvan e, yanî nav nediyar in. Di pirrhejmariyê de jî gava tê gotin "yên şivan" an "yên bêrîvan" qesd jê diyar e ku e kîjan in, yanî ew şivan û bêrîvan in ku em wan nas dikin. Lê gava tê gotin "şivanin" an "bêrîvanin", qesd jê hinek ji wan şivan û bêrîvanan in, lê em nizanin esehî bê kîjan in. Yanî nav pirhejmar in lê nediyar in. Em dizanin ku di axaftina îroyîn de artîkelên diyarkirinê ji pêşiya navan rabûne û nav beyî artîkelan tên, û nav gava bi serê xwe bèn, diyarkirî ne. Yekejimarî û pirejimariya wan bi saya karê (fîlê) diyar dibe. Her wekî;

**Navên diyar (kifşkirî)**

**Navên nediyar (nekifşkirî)**

**Yekejimar**

**Nêr:** Şivan hat.

Şivanek hat.

**Mê:** Bêrîvan hat.

Bêrîvanek hat.

**Navên diyar (kifşkirî)**

**Navên nediyar(nekifşkirî)**

**Pirejimar**

**Nêr:** Şivan hatin.

Şivanin hatin.

**Mê:** Bêrîvan hatin.

Bêrîvanin hatin.

Gava em bala xwe didin van nimûneyên jorîn em dibînin ku ew diyarî û nediyariya navan eşkere dikin, lê tişteki din jî di wan de xwiya dibe ku hemû nimûne jî netewandî ne, xweser in. Heke em bixwazin wan bitewînin divê em li gora awayê jêrîn wan binivîsin:

## Helê tewandî

Navên diyar (kifşkirî)

Navên nediyar(nekifşkirî)

### Yekejimar

Nêr: Şivani/şivên got.

Şivanekî got.

Mê: Bêrîvanê got.

Bêrîvanekê got.

Navên diyar (kifşkirî)

Navên nediyar(nekifşkirî)

### Pirejimar

Nêr: Şivanan got.

Şivanina(n) got.

Mê: Bêrîvanan got.

Bêrîvanina(n) got.

Nimûnên li jorê û yên berîya wan, nîşan didin ku "şivan hat" û "şivani/şivên got" her du jî diyar in, ew şivan in ku em wan nas dikin, lê navek netewandî û yê din tewandî ye. Herdu gotinên "şivanek hat" û "şivanekî got" jî ji bal me ve nediyar in, em nizanin ew kîjan şivan in, lê cardin navek netewandî û yê din tewandî ye. Pîr-hejmariya navan jî her li ser vî esasî ava bûye. Nexwe tu têkiliya tewandina navan bi kifşkirin an kifşnekirina wan tune ye.

## Halê tewandî an yê bireser (casus obliquus-tümleç)

Hin jî hene ku ji halê tewandî yê navan (û bi vê re ji yên cînavan re) dibêjin halê bireser(casus obliquus). Bi baweriya min ev tesbît jî ji bo zimanê kurdî ne di ciyê xwe de ye. Çimkî halê tewandî yê navan û yê cînavan him di halê kîreriye(kirdariye-subject) him jî di yê objektîye (awayekî casus obliquus) de tê bikaranîn, ne taybetî ye bi halekî ji wan bi tenê.

Her wekî

Nav

Cînav

Delal çû malê. Ew çû male.

**Delalê** got.

**Wê** got.

Di her du cumleyên rêza duduyan de “delalê” û “wê” hale tewandî ne lê ne casus obliqius in, her du jî subjektin yanî kirer (kirdar) in.,

Nav	Cînav
Seyran Delalê dibîne.	Seyran wê dibîne
Seyranê <b>Delal</b> dît.	Seyranê <b>ew</b> dît.

Di her du cumleyên rêza duduyan de ”delal” û “ew” netewandî ne, lê ew varyan-tekî “casus obliqius”, yanî objekt in.

1 M. Emin Bozarlan yek ji wan kesan e ku terefdariya bingehwergirtina edebiyata klasîk dike lê ew bi xwe di wan nivîsên xwe yên di vî warî bi xwe de jî wekî wan nanivîse:

Nimûne:

”Ey Şehîſahê muezzem, Heq nîgehdarê te bî  
Sûreê Înna Fetejna, hafiz û yarê te bî”

Bozarlan vê beytê bi vî awayî werdigerîne ser kurdîya îroyîn: ”... Ey Şahê Şahan ê gewre, Xwedê parêzdarê te be/Sûreyê Înna Fetejna, parêzdar û yarê te be”. Wekî dixuyê di vê beytê de Melayê Cizîrî fiila ”bûyin”ê an ”bûn”ê bi awayê ”bî” dikêşe, lê Bozarlan wekî wî nake dinivîse ”be”. Di hin berhemên klasîk de jî ev gotin bi awayê ”bit” an ”dibit” tê nivîsîn, lê Bozarlan jî tê de kes wek wan nake.

## Strana Biharê

bihar e  
heyamê ramûsana gulan  
dilê min mîna kelekan  
bar dikim ji van diyaran e

baranê, were were  
dildara çû nema vedigere

bihar e  
wextê kilama qulingan  
sebr û samana korê evîndaran  
xêr nake li van evînan e

baranê, were were  
bêbexta çû nema vedigere

**KAWA NEMIR**

# Di bêdengiya şevê de

## LORÎN STRAN

**B**ajarê ku her roj û her kêlî di quncikên nava xwe de rê ji mirovên nenas re vedikir, bajarê ku her kêlî rengê şeniya kolanên wê dihat guhertin, tableyên ku li serê her kuçeyê sekinîbûn, ji aliyekî ve bazara xwe dikirin û ji aliyê din ve rewşa vî bajarî bi stranên ku lêdixistin, mirovên kolanên agahdar dikirin. Bajarê ku her roj bi hilmên curbecur dihat nepixandin. Bajarê ku di ronîya rojê de, bi her awayî diliyiya, lê ku heyv xuya dikir, bi zêdebûna stêrkên ezmên re mirovên kolanên kêr dibûn. Ew kolanên ku piştî ewqas guhertinên xwe yên (?) bi şewq jî (!) tu carî bawerî nedabû mirovên xwe. Ew kolanên ku bi hêviya sitarê gelek kesan xwe spartibûnê.

Bi tarîbûna şevê re kolan, şev ji wan kesên bêî xwestin û şeniya te ku bi navê ewlekariyê li kuçeyên te bela dibûn re, dima. Li serê her kolanê hesinê xwe î weke hêtekî ku bi roj sî li ser rojê û bi şev jî sî li ser heyvê çêdikir re, dima. Ji ber vê yekê mirovên vî bajarî timî têhna rojê û ronîya heyvê bi qelsî dijiyan. Çend kûçik jî li dora wan kesên biyanî û wan hesinê ku tenê ji bo perçiqandina mirovên vî bajarî bi kêr dihatin, dikirin ewteewt.

Di bêdengiya vê şevê de ku ewteewta kûçikan tarîtî diqelişand û bêdengî dilewitand mirovên te hilkişiyabûn malên xwe yên ku di nav hevdu de winda dibûn. Mirovên te yên ku kolan xistibûn sitara xwe dîsa weke her şev diricifn.

Di bêdengiya vê şeva ku hino hino ber bi giraniyê ve diçe, çend jin di nav tenêtiya xwe de çengên xwe li laşê xwe gerandine, laş bi ser hevdû de pelçiqandine û li bêdengiya te, li tenêtiya xwe dihisînin. Çend mêr di nav tenêtiya xwe de giriyê ku bi roj nikarîbûn bikin dikin û bi hiçke hiçka xwe bêdengiya şevê diqelişînin. Çend jin û mêr ku berî tenêtiya xwe ber bi zêdebûnê ve bibin, li qedandina roja xwe ya bêkes difikirin. Ev roja ku ne xewn û xeyalê jinê gihîştandibû mêr û ne giriyê mêr gihîştandibû jinê.

Di derengiya vê şevê de çend jin û mêrên ku emrek bi hevdu re derbas kiribûn bi çavên enirî li hevdu dimezandin. Weke ewqas şevên ku wan jî hejmara wan nizanîbû, îşev jî nikarîbûn kurmê ku nava wan dikeritandin bikujin. Îşev jî jin û mêr bi

rika ku ji hevdu digirtin wê hejmara kurmên nava xwe zêde bikirana. Îşev jî wê jin di nav cihê cemidî de mêr wek hirç bidîtana; mêr jî wê jin wek mar bidîtana. Wê dîsa weke her şev hirç mar biçiqanda, mar jî wê bi hirçê veda. Wê îşev jî doşek bi jehra mar û neperûşkên hirçê bêtir bilewitiya.

Di tarîtiya vê şevê de, wê çend evîndar bi tîbûna hevdu bihesiyana û wê ev evîndar li ber avdana tîbûna xwe bana. Û bi vê avdanê re hevdu geştir kiribana, rengê hevdu xweşiktir kiribana.

Di derengiya vê şevê de çend kufletên malan li dora sobeya xwe ya ku bi hejîkên gundê wan dibû gume guma wê, wê bûbûna rêz. Li alîkî jî dayîk wê çîrokên ku di bin stêrkan de ji pîrikê fêr bûbû, di nav hesret û evînê de ji zarokên xwe re digotin. Ew çîrokên ku wek stranekê ber bi guhên zarokan diket, di giraniya şevê de her ku diçû wê çend dilên dayikan xuman bibana. Çend keserên dayikan kûr kiribana lê li hemberî vê, wê xewn û xeyalên zarokan neqîşandibana.

Di derengiya vê şevê de di nav malên ku ji her deverî da dikşand hundir û di nav vê şerpezetiyê de ku zarokan xwe bi ser hevdu de diperçiqandin, wê çend bavan serpehatiya koçberiya xwe ya ku serê sibehêkê, weke ewrekî reş ji nişka ve bi ser wan de hatibû, dikir. Ew koçberiya ku rê nedabû bav xatir ji gorên pîr û kalên xwe, deşt û çiyayên xwe, rez û kaniyên xwe bixwaze. Di bêdengiya vê şevê de çavên çend bavan dîsa melûl bûbûn. Çend rez, çiya, deşt di hişê zarokan de çêbûbûn.

Di derengiya vê şevê de çend jin bi qîrîna ber ersê re li benda canê xwe yê duwemîn bûn. Çend zarok bêî haya xwe di nav xwêdan, êş, qîrîn û xwînê de li ber dora xwe ya bêhnkirina vî bajarî bûn.

Di tariya vê şevê de çend kes ketibûn kemîna malxerab û li ber xefka xwînrijanîna xortekî bûn. Ew dengê ku wê bêdengiya şevê qelaştibana wê çend dayîk qîrandibana, wê keziyên çend jinan jêkiriba, wê rika dilê çend zarokan zêde kiriba. Wê çend hêvî, xewn û evîn nîvco hiştiba. Wê îşev çend deng di kolanên teng de belav bûba û alan daba.

Di derengiya vê şevê de wê çend zarok li binê piran ku firota selpak û benîştê nîvrê mabûn xwe bike qozîkekê û berî haya wî ji sir û seqema ku laşê wî kiribû gulok û li hevdu gerandibû wê di xew ve çûba. Wê çend zarokên ku ji razana nav doşekên hiriya pezên xwe têr nebûbûn, berî ku şorbenîskêkê bixwin wê di nav qurte qurta roviyê xwe de sindoqa boyaxê kiriba balîf û li ber bankamatîkên vî bajarî di xew ve çûbûna.

Di bêdengiya vê şevê de surhên ku dîroka li bin nîga bi hemû tazîbûnê dîtiye û hê jî li benda xerakirina bêdengiya xwe ye, niha çend rêz li nivîsandina dîroka xwe zêde kiriye. □

# Li Bahdînan havîneke germ

## NEJDET BULDAN

**L**i Kurdistanê herêmên germ, parçeyek jiyanê jî çûyîna zozanan e. Bara bêhtir li Cihên navçiya. Gund, eşîr û malbatên bê zozan çinînin. Gor wextên salê jî navên zozanan hene.

Gelî. Zozan. Payîze war. Ji bo ku mirov kultura zozaniyê bizane, pêwîst e ku mirov rewşa gundayatiyê jî fêhm bike. Lê belê kultura zozaniyê û gundayatiyê kultureke herêmî ye. Dîsa pêwîst e ku nav, bêje û danaskirinên herêmî bên zanîn.

Ji ber wê çendê di xwandin û axaftinê de ferhengêk e taybetî derdikeve. Ew gotina me li ser herêma ku dibêjinê "Bahdînan" e.

## Gelî

Navekî geliyan jî Bahare War in. Bahra pitirir li der dorên gundan in. Û di nava newalên çiyayan da ne. Û beroj in. Zû reş dibin. Wexta befir dest bi xeliyanê dike, gundî diçine geliyan. Gelî zû reş dibin. Yanî befira wan berî çiyayan dixele. Ew giyayên di geliyan da şîn dibin, xwarina heywanetî ye. Gelek erdan jî, havînan hinde kes diçine geliyan, giyayê wan deran didirûn, çiliyê wan erdan dibirin. Giya û çilî, dikene dihe. Ji bo bahara pêşiya wan. Cihên ku em qala wan dikin, çûyîna geliyan di meha Sibatê, Adarê an jî di Nîsanê da ye. Gor dijwariya zivistanê û kêmasî û zêdehiya miştê ye. Miştê, debar an jî xwarina maletî ya zivistanê ye.

Li geliyan her malbatekê, an jî çend malbatan kolkek heye. Kolk bi daran,

keviran û bi axê tên çêkirin. Hinde kolkan tenê malek tê da bi cih dibe.

Hinde kolkan jî du, sê mal bi cih dibin. Geliyan da gelek şikeft jî hene. Lê belê şikeftan bahra pêtir ji bo maletî bi kar tînin. Baharê zuyan gundî diçine geliyan. Bi giştî ji her malê yek, an jî du kes diçine geliyan. Pir eşyayan digel xwe nabin. Pêwîstiyên mirovekî, an jî ji bo du mirovan. Piraniya wan mirovan jî xort in. Jin an jî mêr. Lê belê şivanetî ya mêran e. Kar û barê pez dotin û rêçar girtinê jî ya jinan e. Bahare zuyan şîrê pezî kêr e. Ji ber wê çendê, hinde caran jinek dikare karê pezê çend malbatan bike. Tabî heke pezê wan malbatan kêr be. Wî wextî, şivanek jî dikare şivanetiya çend malan bike. Ew malbatên pezê wan zêde, hingî pêwîst e ku şivanek û bêriyekê bi taybetî rêkence geliyan. Ew jinên ku diçine geliyan kar û barê pez dikin navê wan yê giştî bêrî an jî Banehî ye. Çi bêrî çi banehî, pêwîst e ku bê zarok bin. Ji ber ku li geliyan xudankirina zaroyan zehmet e. Ji ber wê çendê jî bêrî û banehî, ji bûkên nû, an jî ji keçên şûnekirî pêktên.

Gundiyan diçine geliyan, an jî yên pezên xwe rêdikene geliyan çend heyvan li wê derê dimînin. Di dema geliyan da şîr kêr e. Ji ber ku, bêçiyên (karik û berxik) wan hêj sava ne, biçûk in. Bêçî di van demane da rojê dahnekî makên xwe dimêjin. Ji ber wê çendê şîr û ew pêwîstiyên ji şîr çêdibin tenê ji bo rojane ye. Pêwîstiyên xwe yên rojane pêk tînin. Yanî dema çêkirina penîr, jajî, rûn, mast û tiştên di yên ji bo zivistanê û havînê. Dîsa jî giya û darên nû hêşin dibin, hewayê hînik dibine sedemên mezinbûna bêçiyên. Bi gotineke di jiyanekê nû, rihekî nû ter û taze bi xwezayê ve digere. Erd û esman karê xwe yê demeke dirêj dike. Her wiha dibine sedemên goşt û şîrê nû, ji bo bizin û mîhan. Di dema geliyan da, rojve pez diçêrin. Şevanda pezên xwe dikin guhor, kotan û şikeftan de. Jiber ku çiya bi daristan in. Bi raz û asteng in. Bi dahbe ne (hirc, gurek û heywanetên din). Û şevên biharan çiya bi baran û lêserin. Ji ber van sedemane pêwîst e ku malet bête parastin.

Gelî, çiya û deştên Kurdistanê hemû demên salê di nava xemleke taybetî da ne. Biharan gelî û beroj birewşin, her tişt tê xemilandin. Her demekê giya û kulîlkên xwe hene. Gelek giya yên bi kêrî xwarina mirovan jî bî hene. Ku dibêjine wan pancar. Guh bizin, tolk, karf, luş, sipying, alo û hwd. Ji van giyan an jî pancaran hindêk bi xavî an ku ne keliyayî tînin xwarin, hindêk jî bi kelandin û bişavtin tînin xwarin. Dîsa biharên gelî û çiyayan bi gul û gulçîçek in. Binevşok, adarok, canemerg, nêrgiz, guldexun û hwd. Ji vane tenê guldexun bê bêhn e. Pez û heywanetên din guldexunan naxwin. Dibêjin guldexun kulîlkeke taybetî ya Zaxrosan e.



Dema dawiya biharê da, karê xwe dikin û diçine zozanan. Eger gelî, li ser rêya zozanan nebin, pez û maletên din çend rojan berî koçê bar dikin, diçine nêzîkê gundî li ser rêya zozanan. Cîhê ku malên xwe lê datînin jî gelîne û germ in.

Û gelek rojan li wê derê namînin. Ji ber wê çendê pêwîst nîne ku kolkan an jî kepiran çêkin. Bi piranî, binê kevirên mezin de, an jî li bin kepirên zû têhne avakirin cîhê xwe çêdikin. Û benda ew kesên ji gundî tèn dimînin.

## Zozan

Her gundî, malbatê û eşîran zozanin wan hene. Ew eşîrên bê zozan eşîrên herî kêmasin. Ewên zozanên wan neyî, diçine zozanên şexsan û yên eşîran. Û piraniya wan jî bi kode tèn kirêkirin. Navê kirêkirina zozanan kode ye.

Zozan, bi giştî bi navên herêman û navên eşîran, gundan tèn naskirin. Wekî Zozanên Herkiyan, Zozanên Dostikiyan. Li hêla Culemergê zozanên herî bi nav û deng Meydan Zengil, Meydan Dêsê, Berçelan, Çelesor e. Li Çelê Serê Sêvê û Meydana Melhem. Li Elkê (Beytüşşebap) Feraşîn. Li Elbakê Girê Ziyaret. Li Geverê Meydana Belek, Mêrgezerê, Geverok, Teng û Xanemiran. Bi sedan cihên husa bi nav û deng di Kurdistanê da hene. Wekî li Agirî Diholan, li Çewlikê Şerefdîn.

Zozan, hinde caran bi navên xweşmêran, caran jî bi navê bûyeran tèn naskirin. Wekî li zozana Mêrgezerê warek heye. Navê wê "Mêrga Xwînê" ye. An xwîn li ser hatiye riştin. An jî di dijminahiyekê de, dema pêkhatinê (sulxe, hevhatin) pêş xwînê ve hatiye sitandin.

(Di Kurdistanê de pir nakokî û şer, mêrkuştin û jinrevandin çêdibûn. Ev dilnexweşiyene giştî bi pêkhatinan dawî dibûn. Pêkhatinan da, kesên gunehbar an jin didane terefê din, an jî zêr, zevî, şîpre û zozan didan. Kurtiya wê dilnexweşî bi cirm û ceza dawî dibûn. )

Zozan di kultura Kurdistanê da cihekî girîng digire. Zozan rewş e. Zozan reng e. Dîrok e û helbest e. Sitran e û govend e. Şînî ye û şahî ye. Zozan xwîn e û mejî ye. Zozan di dîroka me da dest û pê ye. Cihê bereket û zêdehiyê ye. Cihê eşq û evîne ye. Helbest û sitranan da mijar e. Cihê qewl û biryaran e.

Di nav zozanan jî ew cihên mal lê datînin dibêjine wan War. Hinde zozanan war nêzîkî hevdu ne. Nav hevdu ne. Li hinde cihan jî dûr in. Mînak:

"Ew Gundiyene diçine zozana Mêrgezerê, warê Kanî Sipiye"

Di vê gotinê de navê zozanê bi giştî "Mêrgezer" e. Navê ku cihê malan di daninê

"Kanî Sipî"ye. War bi piranî ji keviran tîn çêkirin. Kevirên mezin. Şiklê waran gurovir e. Cihê wan gelek mezin nîne. Her warek cihê reşmal, xîvet an jî kepirekê ye.

Reşmal (konê) bi mûyê bizinan tê çêkirin. Mezinahî û biçûkatiya reşmalan gor rewşa malbatê ye. Reşmalê herî mezin yê malbata mezinê gundî ye. An jî yê dewlemendê gundî ye. Ew jî ji danzde (12) beran pêk tê. Û dirêjahiya wê gelege. Her berê reşmalî hinde caran qulaçe û niv firehe. Reşmalên mezin li ser danzdeh-çardeh sitûnan tê vedandin (li darxistin). Li gelek herêmên Kurdistanê reşmalan dikene du-sê ode. Navbir an ku dîwarên reşmalan jî an berik in, an jî mêzer. Di vê derê da armanc ew e ku, təkeliya malê û mêhvanan bêt qetkîrin. Reşmal di nava rojê da gelek germ nabin. Loma pêşiya wê vekiriye. Û ji tevinkirinê hatiye çêkirin. Navbira ta û têlên wê hewa distîne. Şevê dema razanê sitûnê pêşiyê tîn nizamîkirin.

Xîvet kinc e, pate ye. Bi tirkî dibêjinê çadir. Xîvet bi piranî mezin nînin. Li ser sitûnekê tîn vedan. Xîvetên gelek mezin li ser sê sitûnan tîn vedan. Dergê wê jî biçûk e. Bi şevan mirov dikare bigire. Xîvet ji bo kesên di mala xwe da kêmbaş e. An jî hinde mal jî taybetî bo mêhvanan xîvetan vedigirin. Gelek caran malbatên mezin reşmalek û xîvetekê dibin zozanan.

Di jiyana zozanan da Kepir, rewşa feqîriyê ye. Bi daran pêk tê. Dîsa li ser waran tê çêkirin. Darên sê-çar metre dirêjîya wan heyf, binê wan dikevîne ser kevirên waran û serên wan li hewa digehîne hev. Navbira daran bi giya tê tejkîrin. Lê belê dema bayekî xurt bê, berî her tiştî giya yê li ser kepiran difirîne. Kepir xirab dibin. An jî baranan da rewşa malekiyên kepiran baş nîne.

Li bin kepir û reşmalan kuçke hene. Belku hinde malbat kuçkên xwe ji derveyî kepir û reşmalan çêkin, lê belê piraniya kuçkan di hundurê kepir û reşmalan da ye. Di hundirê xîvetan da kuçik nayên çêkirin. Ji ber ku dukêl (dû) dernakeve derve. Di nava reşmal û kepiran da cihê rêçarî jî tê çêkirin. Wekî ku mirov bêje dolabek li ser axê ji keviran bête çêkirin. Pêwîst e ku cihê rêçarî hînik be. Binê wê ax e. Rexên wê û bahnê wê kevirên mezin in. Dibêjine wê selbend. Selbend di nava xîvetan da nayê çêkirin. Di bin kepir û reşmalan da cihê rûniştin û razana mirovan ji erdê bilind e. Bi piranî ronahiya şevê ya kepir û reşmalan agirê kuçkî ye. Malbatên rewşa wan baş, şevan da li bin xîvet û reşmalên xwe fanos û lokizan berdidenê. Lokiz û fanosên zozanan bîn helkîrin îşaretên dewlemendiyê ne. Cihên ku ev ronahiye nebîn, malbat bi agirê kuçkan pêwîstiya ronahiyê pêk tînin. Kurtiya wê dewlemendî û feqîriya gundan, li zozanan jî xwe nîşan dide.

Zozanên Bahdînan bi piranî bê dar û daristan in. Tenê giya û gêhnî hene. Ji bo

şewitandinê malbat ji xwe ra gêhniyan kom dikin. An jî malên rewşa wan baş, ji geliyan daran tînin. Soxtenî ji bo zozanan gelek girîng in. Cih bilind e û sar e. Ji ber wê çendê rewşeke zozanan jî agir e. Dema roj diçe ava, agirê zozanan jî geş dibe. Dema dibe êvar, garana zozanan nêzîkî malan dibe.

Çêlek ji bo dotinê, golik ji bo mêtinê berê xwe didine hevşê zozanan. Her çêlek cihê xwe dizanin. Hevşê cihê çêl, ga, golik, pezên lewaz, dewaran e (hesp-mahîn û hêstir).

Çûyîna zozanan ji bo maletî ye. Malet pez e. Bizin û mîh in. Heywanreş û dewar in. Havînê gund germ in. Welatê rojê ye. Germa fêqî germeke xurt e. Ji ber pêşu û mêşên din jîyan ji bo mirov û heywanetî xeter e. Kurtiya wê herêma Bahdînan bi piranî li zivistanê pir befir tê. Û sar dibe. Havîna wê jî ew qas germ e. Ji bilî wê jî cihê çerîna maletî an çû nîne, an jî kêrn in. Cihê ku giya û debar jê tîn dirungene. Birîng e, dirung e û şîpr e derdorên gundan in û têne dirûn ji bo zivistanê. Şîprê cihê giya û çulî ye. Pêşiyê giyayê wê tê dûrîn, paşê li payîzê çulî tê birîn. Birînge û dirûnge jî tenê cihê giyayan e. Giya di nava gundan da jî heye. Bengên zewiyan û zewiyên tenê ji bo miştê tîn çandin binegahên giyane. Gundên Bahdînan, bi piranî jî gundên nav çiya zevî kêrn in. Ji ber wê çendê bi piranî, tiştên pêwîstiya mirovan lê tîn çandin. (Genmok, genim, ceh, erzin, kuncî, maş, lobî, birinc, bacan, şiftî, gundor, xiyar, biber, bacanreş....)

Hinde kes jî di zewiyên xwe da qolingar û unceh diçînin. Miştê kirina navçiya pir bi meşaqat û îza ye. Gundî hemû diçîne zozanan. Lê her malekê da ji bo av û avdanan, adekirinê û giya dirûnê çend kesên xurt, rênçber dimînin. Havînan gund bêdeng in.

Çûna zozanan wekî merasiman e. Bi imûr û teybîr e. Kes an jî çî mal serbixwe naçîne zozanan. Dema biryar tê sitandin gundî bi giştî karê xwe dikin. Ji bo hinde malan amadebûna zozanan heftiyekê dikişîne. Ew malbatên eşyayê wan gelek û hêstir û hespên wan kêrn, çend barên eşyayên xwe pêşiya malan dibin. Dibêjine wan "pêjbar". Rîspî û mezinên gundî li ser kîjan waran biryar dabîn, pêjbaran dibin wan waran. Herkesek pêjbarê xwe datîne li ser warê xwe yê kevin. Ji ber wê çendê gotina "warê bab û pabîran" keftiye gotina Kurdistanê da. Pêjbar tiştên xwarinê û tiştên bala heywanetê kuvî bikişîne nînin. Dîsa jî pêjbaran datînin bin keviran. Û cihê bête parastin. Zaten pêjbar gelek bê xudan namînin. Mal û malbat sê-çar rojan piştî pêjbaran diçîne zozanan.

Heyîveşevên Bahdînan dinya ronahî ye. Dema heyîveşev derdikeve barên xwe bardikin û bi rê dikevin. Jin û zarû ji bo rê cilên xwe yên nû li xwe dikin. Ew kesên

bişên rêve biçin sedan sed peya ne. Di nava wan de zarûyên heft salî jî hene. Zar û zêç berî dewarên barkirî bi rê dikevin. Jinên hamle (ducanî), jinên xwudan landikên (dergûş) sava ku gelek caran pêçekên wan jî di landikê da ne piraniya wan jî peya diçin. An jî landik li ser barê dewaran e, pêçik ber milên dayîkan. Bi şev derkeftina wan ji bo wan baş e. Germa geliyan û çiyayan germeke xurt e. Ew cîhên germa wê kel û xurt, pêwîst e ku bi zû bîn xelaskirin. Di rê da rûbar hene, avên sar û teztî hene. Eger rêya zozanan dûr be, bere berê nîvro bêhnvedanekê didin. Gelek erdan dibêjine wê "tarekirin". Tare, kelekela nîvro ye. Li cîhekî hînik û berav bêhnvedan çêdibin. Di bêhnvedanê da xwarina ku çend rojan berî rê hatiye amadekirin tê xwarin. Piraniya xwarina rê kade ne. Kade, nanê tendûrê ye.

Di nava kadê da "xebîs" yanî hevîrê bi rûn, şîrîn û kakil heye. An jî kade bi tenê ji hevîrê bi rûn tê çêkirin. Kada ku bê xebîs be navê wê "nazik" e. Kade ku bi çayê li cîheke hînik û ser avên sar bête xwarin, tama wê zêde ye. Xasma mirov westyayî be. Bêhnvedan ne tenê ji bo mirovan e. Ji bo hêstir, hesp û mahînan jî pêwîst e. Dewarên ku bin barên giran û rêyeke germ û bi asteng zû diwestiyên. Ji ber wê çendê cîhê bêhnvedanê, ji bo dewaran jî pêwîst e ku bi giya û xwarin be.

Di rêyan da gelek caran jî keç û kurên xurt sitran û helbestan dibêjin. Hingî rewşa çûna zozanan, evîndarî û folklorê gundî tê gotin. Ji bo xortan rê, dibe sedemên şano û pêkenînan. Rêya zozanan bi giştî rêya rojekê ye.

Dema gundî digihên zozanan, navbera du rojan da karê xwecîhbûnê diqedînin. Di van rojan da xîvet, reşmal û kepir tînan vedan. Li berderên reşmal, xîvet û kepiran kuçke, di nava wan da kulîn, doçke û selbendên rêçarî tînan çêkirin. Navbera reşmalan da li gora pêwîstiyên malan tenûr tînan çêkirin. Cîhê garan û hevşên pezî aşkera dibin. Û êdî jiyana zozanan dest pê dike. Zelam (mêr)ên vegera wan ji bo xebata gundî pêwîst be vedigerin gundên xwe.

Zagona zozanan bi nivîs nîn e. Lê belê biçûk û mezin wê rewşê baş dizanin. Pêwîstiya herî mezin ya çerwanê pezî ye. Keriyên pezî (mîh, bizin) û keriyên kaviran (berx, gîsk, nêhrî û beran) cuda cuda diçêrin. Şivan dizanin ku çerwanên baş li kî derê ne. Û dizanin, çerwanê zû dibe kişke. Bi dor wan çerwanên xwe diçêrin. Û çî keriyên zozanekê naçin ser çerwanên gundekî dîtir, an jî çerwanê zozanekî din. Çêrandin û xudankirineke baş di destê şivanan da ye. Pezê dotinê (mîh û bizin), rojê du caran tê bêrkirin. Bêra danê sibê nêzikê malan e. Bêra danê êvarî gelek dûrî malan pêk têt. Lê belê bêra dûr, bi destê bêriyan, bi sitran û pêkenînan dibe rêyek folklorî. Xenek û helbest, govend û reqas rengên bêriyatîyê ne. Li gelek herêman bêrî piştîyên xwe yê şîr bi piştî xwe tînine malên xwe. Di vê

derê da du tiştên pêwîst hene ji bo bêriyan. Yêk parzûn e. Parzûn ji hiriya pezî, li ser tevnan tê çêkirin. Berhemeke ji ronahî û zewka jinan e. Bi gelek rengan pêk têt. Rengên davên wê ji giyayan tê çêkirin. Motîv û resmên wê jî ji hunera jina tevinker. Parzûn, wekî cihalekî ye. Lê gelek mezin nîne û sê goşe ye. Bi piranî jin dihavên pişta xwe û pêwîstiyên xwe diken tê da. Ji bo bêrê jî şîrmeşka xwe dikenê. Şîrmeşk, ji bo şîrî ye. Ji meşka bizin, mîh, kavir an jî gîskan tê çêkirin. Malên ku şîrê wan zêde be, şîrmeşka wan jî mezin e. Lê belê çi şîrmeşkên mezin wesa nînin ku tejbûna wê jinek ne karîtê.

Şivanên pez pisporên mesleka xwe ne. Dizanin, kîjan dirî yê kîjan malbatê ye. Mirov dikare bêje, şivan dizanin kîjan berx ya kîjan mîhê ye. Û dîsa şivan çerwanên xwe bi zanîn diçêrînin. Kîj dema salê kîj çerwan tê çêrandin, ji terefê şivanan tê zanîn. Dema zozanan piranî sê heyv in. Di nav van sê heyvên da rojên girîng hene. Piranî dema zozanan da roja herê girîng "Berxbir" e.

## **Berxbir**

Zozan, ji bo berxbirê ye. Berxbir jî ji bo jiyanê ye. Zozaniya baş, pez û maletên din baş têne xudankirin. Xudankirina baş, ji bo heywanatên têne firotin bahayek baş e. Bahayê baş jî ji bo gundiyatiyê, zivistaneke serfiraz rabihartinê ye. Zozanî, çêrandin û şivanetiya baş ji bo zayîna maletî ya bi bereket e. Gişt bi hev ra girêdayî ne. Dawiya tîrmehê, heyva dehê teboxê dema berxbirê ye.

Dema berxbirê da gundiyan li gundî mayî jî piraniya wan diçine zozanan. Dema fêqî ye. Gundî wexta diçine zozanan, barên xwe ji fêqî dadgirin. Ji bo kesên çend heyv in li zozanan mayî tirî, xilû, sêv, xiyar, bacan, lobî, şiftî û gundor pir bi qîmet in. Sê an jî çar roj mayî ji bo berxbirê, berxan dişon. Her zozanekê an golên mezin, an jî avên din yên ku berxan tê da bişon hene. Navê wê berxşo ye. Roja berxşoyê, keriyê berxan zû têne devê golê. Dor dore çend xort dikevî avê. Berx û kaviran bi werîsan dorpêç dikin û dişon. Keriyên mezin heya êvarî ew xebate domkêş dibe. Û rojekê da berxşo xelas dibe.

Berxşo wekî geşteke ye. Kesên berxan dişon tev xort in. Sitran gotin, govend û armancanê, goşt xwarin û gelek leyzên herêmî jî rewşa berxşoyê ye.

Roja berxbirê hemû mirov cilên xwe yên pakij li xwe dikin. Bergehên van herêmanê ji bo jinan kiras fistan, ji bo mêran bergûz, şel û şepik in. Kiras fistan jî, bergûz ji bêyî lewendî nabin. Lewendî destmale ji bo ser û ruyan xişkirinê. Lewendî berdestke ji bo jinan. Lewendî, ji bo govendê mîna melodyeke bêdeng e.

Sibe zûya berxbirê, li ser çîmenan bi qelexên xwe, kesên pisporên vê şolê dest bi xebata xwe dikin. Li ser çîmenan berxbirîn, li derê reşmal û xîvetan xwarin çêkirin, li meydanên zozanan govend bi hevra ye. Zozan û berxbir bê dengê tifengan nabin. Zomeyî li dûr nîşanan danin û armancanê diken. Malevan yanî berpisyarên maletî, şertên şivanên xwe didin. Qewlê şivanan wê rojê xelas dibê. Bi bazareke nû an şivanên nû têne girtin, an jî şivan bi bahayeke nû heya mal diçine gundî dewamê li şivanetîya xwe dikin.

Berxbir, roja kirîn û firotinê ye. Kavre nêr, gîske nêr, beran û pezên firotinê wê rojê têne firotin. Bazar xurt e. Ticar bi erzanî, malevan bi giranî dixwazin bikirin û bifiroşin. Ji ber wê çendê berxbir roja cembaziyê ye jî. Ew roj roja deyndanê û qewlê qiraran e. Gelek caran bazarên payîz an jî zivistanan da roja deyn danê berxbir a sala paşê ye. Biryarên gelek girîng ji bo gundiya tiyê wê rojê têne girtin. Jin xwastin û biryarên dawetan bi piranî wê rojê tîn sitandin. Lê bi piranî ew qas xebat û biryar zû xelas dibin. Xwarina nîvro, xwarina êvarî bi giştî tê xwarin. Zelam (mêr) li bin reşmalan, biçûk li derve ser mêrgan xwarina xwe dixwin. Piştî nîvro, bere berê êvarî hemû xebat diqedin. Jin û mêr govendê girê diden. Ev govende gelek caran heya sibê dewam dike. Dengbêj bi helbestan, dawetî bi reqasê diwestiyên. Berxbir bi şahiyên dest pê dikin, bi şahiyên diqedin.

Rojên piştî berxbiran dawîya zozanetiyê ye. Ji gundî çawa hatibin, êdî wesa dema vegera gundî ye. Rêvîngên gundî karê xwe yê rêvîngatiyê dikin. Malbat karê payîzewaran dikin. Wekî biharê çawa kêr kes diçûne geliyan, ji bo payîzewaran jî kêr kes dimînin. Payîzewar li zozanan da cihên germtir in, kûr in. Loma êdî دنیا sar bûye. Şîr jî kêr bûye. Dîsa çend mal digehine hev.

Banehiyan kifş dikin. Malan bar dikine payîzewaran. Li payîzewaran an bîst rojan dimînin, an jî gelek-gelek heyvêkê. Li gundî giya û çilo tîn berhevkin. Pez û maletên di diçine gundan.

Kar û barê zivistane tê kirin. Çandin û fêkî tîn berhevkin. Li gundên Kurdistanê xebat û jiyan bi hev ra ne. Dawiya her demek salê, destpêkirina demeke dî ye. □

## **FERHENG A GUNDIYATI Û ZOZANAN**

Payîzewar: Li zozanan cihê piştî berxbirê

Beroj: Cihên berê xwe didene rojê, başûrê çiya û girikan

Reş: Ji bo cihên befra wê heliyayî, reşî, reşbûn

Heliyan: Ji bo befr û rûnê tê gotin. (Befir heliya, rûnê helandî, te ez helandim..)

Çilo, çilî: Belgên daran (ji bo xwarina heywanan)

Dih, dîhe: Giya û çiluyên bi zanîne hatin komkirin. Dîha çilo, dîha giya..

Mîştê: Xwarina heywanan ya zivistanê

Kolk: Xaniyên li geliyan, çiyayan nebaş hatine çêkirin, sitare

Rêçar: Bi giştî xwarinên ji şîr çêdibin

Bêrî, bêrîvan, bêrîyatî: Jinên diçine pezdotinê

Banehî: Jinên li zozanan û geliyan kar û barên pezî dikin

Bêçî: Berx û karikên nû hatiye dinyayê

Sava: Biçûk, neghiştî. Ji bo mirov, hindek heywan, giya û daran tê gotin

Mak: Dayîk. Ji bo mirov û heywanatan tê gotin

Jajî: Penîrê bê rûn.

Guhor: Cihê şevê pez û dewar lê kom dibin. Dewra wê girtî nîne

Kotan: Li çiya û geliyan cihê pezî. Dewra wê bi dar û keviran girtî ye

Dahbe: Dirinde. Heywanetên bi nêçîra heywanan dijîn

Lêser: Lêmişt. Lehî. Ava ku bi baranan zêde dibe û zererê dide

Şîpre: Ew cihê ku bi daristan, lê giya jî tê dirûne

Reşmal: Kone. Bi mûyên bizinan tîr çêkirin

Ber: Tiştên ku bi tevnan tîr çêkirin firehiya wê. (Berê reşmalan, berê kumaşan)

Qulaçe: Dema mirov herdu milên xwe vedike mesafa navbira wan, ji bo dirêjahî, kuratî an jî firehîniya tiştan tê gotin

Mêzer: Bi tevnê tê çêkirin. Ji berikan biçûktir e û bê desentire,

Ta û tîl: Davên tevinan

Kuçke: Ji keviran tê çêkirin, cihê agirî

Gêhnî: Giyayek bi sitirî û kelem e, tê şewitandin

Soxtênî: Hemû tiştên ji bo şewitandin û germahiyê, ji sotinê tê

Hevşê: Li zozanan, nêzikî malan cihê şevê pez û heywanetên malê

Pêşu: Mêşên havînê ku ji pêvedana wan ta û newxêştî çêdibin

# Yekîtiya kurdan

SILÊMAN ALÎ

Çend partiyên kurdî yekîtiyek bi hev re çêkin. Gereke çi biqewime û çi bicire piştî vî karî?.. Gelek kurdên dilpak û xeşîm û nezan û neserwext û nebîrbir, ez jî tevî wan, derhal li çepikan xistin û gotin:

Aferim, aferim, hûn kurê camêrane..

Lê, mala xwedê ava, ne hemî kurd kawik û xeşîmin, da wek me bifikirin. De ka rewşenbîr, siyasî, zana û rêberên kurdan çawa fikirîn û çi kirin gava ev xeber bihîstin? Em binêrin!

Peyva pêşî ku hat her heşî û ser her zimanê eva kurt bû:

Ya sitar, qey dîn bûne!

Hinekan gotin:

Van bênamûsana navê kurdan herimandin, bêguman destê dijminan di vê yekê de heyê.

Radîkalan nerînên xwe hişktir dan:

Heqê van xayinana kuştine.

Lê rîhsipiyên balfereh, ji ber ku rîhsipî û balferehin, bi bala fereh nerînên xwe diyar kirin:

Mirov behsa hevgerîtin û yekbûn û yekîtiyê bike ne şerm e. Siyaset ev e, siyasî gişk tişt-miştên wilo dibêjin, lê xeletiya mezin ewe, ku siyasîyên kurd vê yekê pêk bîne. Qey dixwazin me ji kok û rehên me qut bikin, ma cara we li ku bihîstiyê yan



kengî bihîstîye, ku kurd bûne yek?. Na bi xwedê heqê wan nîne, na.

Çend heftî di ser wê kêmaqiliyê re ne buhurî bûn, hîna ew kêmaqil bi wê tevçivîna xwe kêfxweş û paye bûn û li bende bûn, hinek ji wan re bibêjin, saet xweş, rêberên kurdan li hev civiyan û tevgerêke mezin dijî vî karê nebihîstî, li dar xistin. Di wê civînê de rêzan û rêberan xwestin şaşîtiya wan yekgirtîyan berçav bikin û bifikirin bê ka gereke çi bê kirin dijî vê yekê. Her wek edeta kurdan, sed nerîn li ser cûreyê bersivdanê hatin belîkirin. Bêguman hemî rewşenbîr, nivîskar, oldar û siyasî, bi xebereke din, hemî xweşmêr, li dijî vê yekîtiyê bûn, lê nerînen wan, derheqa wê û cûreyê dijrabûna hember wê, ji hev dûr û cuda bûn.

Ew nerîn ji bingehin cuda û têvel derdihatin. Hinekan ji bingehêke dîrokî-kultûrî, hinekin din ji bingehin lojîkî, yên mayî ji bingehin cengî, ziman-zaravî, gêografî, olî û hinekan jî ji bingehin zanyarî; hemiyan şaşbûn û nerindiya wî karî îsbat dikirin. Di Civînê de Hopo ji hemiyan germtir bû, wî bê kuxîn û bê pirsîn, xeber girt:

Ev bênamûsana li dijî me vî karî dikin. Ji dijmin re dixebitin, bi her hawî dixwazin mîlet ji me dûr bixînin. Welle heger ew hişên xwe nekin serên xwe ezê guhên wan jêkim.

Pirsî ême tiştî tire hewalî Hûto!- Xirpo yê zimanzan xwe tevî xeberê kir. Be rastî, êwe yeçîtî kurdekan le kwê bihîstûe? Hemû tan dezanin, ke sê zimanî edebî kurdî heye, sê elfebêtî ême heye, her basî zaravekan nakim. Me le yek û dû naghên kaka, hemû tan dezanin.

Ziman ne derd e gelî camêran! Şêx Qopo peyivî, - Le ol? Çend olên me hene, de ka bibêjin? Qey çavên wan lêne em dîn-olên xwe berdîn û hemî werin ser dînekî, ji bo xwedê?

Gelî camêran! Pirsê we ser serê min, - kurdzan û kultûrzan Şerpo xwe avêt nav xeberê, - dîroka hezarê sala da her miletekî xeysetin xwe qezenc kirine, kûltûreke xwe ava kiriye. Nave mîlet xwe kûltûra xwe bibirre, divê mîlet kûltûra xwe xweyî derkeve. Pirs ne tenê partîtiye ya olîtiye û ne jî zarav-zima-

niye, eva pirseke dîrokî-kûltûrî-zanyariye. Kultûra kurda timî dîrokê da ha bû ye, wekî me hev ne girtiye, me hev hez ne kiriye. Heger naka em hev bigrin em kûltûra xwe unda dikin, em hev hez bikin dîroka hezarê salan unda dive. Pirs evaye birano! Zaf qewm hene pirzaravin, pirolin, eva ne problême, le erf-edetê me, le kûltûra me....?

Xweşmêrên hazir hemî peyivîn. Hemiyar diyar û îsbat kirin, ku hevkarîya kurdan bi hemî behanan, çi siyasî, çi gêografî, çi aborî..., xelete. Erê nerîna yekî ne mîna a yê din bû, lê hemiyar dixwestin navê kurdan biparêzin dijî ew xayin yan şaş yan nezanên (her kesekî hazir navek li wan kir), ku ev tevgera hevgirtinê meşandibûn.

Gelek têtêgramên piştgirtinê jî gîhan wê civatê ji wan welatparêzên, ku nekarî bûn hazir bibûna. Wan têtêgramana nerazîbûna xwe derbarî vê yekîtiyê diyar dikirin û xwediyên wê fikra ji xeta kurdî der, gunehkar û bêrûmet dikirin.

Kesên civiyayî biryar dan bi tevayî daxuyaniyekê dijî vê yekgirtinê binivîsîn û hemî li bin îmze bikin....kî dibêje kurd nabin yek?

Rewşenbîrekî xwe da ber nivîsandina daxuyaniyê û nivîsarek hazir kir. Heftiya dinê civînek din, ji bo qebûlkirina têksta daxuyaniyê, geriya. Ew civîn gelekî zû derbas bû: tenê deh saetan dirêj kir. Havila wê ew bû, ku kesên hazir bûn çar kom û her komekê biryar da, cihê daxuyaniyekê derîne. Civîn ji bingehîna kûr û behanene logîkî komkomî bû. Komekê dixwest hevokna li nivîsara wî rewşenbîrî zêde bike. Koma dinê dixwest hevokna jê kêmbike. Koma sîsya dixwest ne zêde ne kêmbike, tenê hinek gotinan tê de biguhere û koma çara dixwest têkstê, wek hatiye nivîsandin, bihêle. Tu aliyî ne karî bû aliyên din bîne ser raya xwe. Nerînên her çar aliyên rast bûn û rayên wan hemiyar di çiyê xwe de bûn, lema jî her aliyek li aliyê xwe ma.

Roja dinê çar daxuyanî derketin û li nav xelkê hatin belakirin. Partiyên kurdî ew daxuyanî bi ferehî gerandin. Belavokên wan ew li ser rûpelên xwe yê pêşî çap kirin. Ne tenê wilo,

her belavokekê sê çar nivîsarên din ji li ser vê bûyerê danîn. Ew rêxistinên, ku şeş mehan carekê belavokek derdixistin û carê lezandin û belavoka xwe zû derxistin. Hemiyax dixwestin germa-germ bi vê bûyera nebihîstî re bin û helbet ji bo pêkaniya erkê welatparêziyê.

Mesele giran bû û hukmeta dijmin ji xwe tevê kir. Helbet hukmetê piştî piraniya kurdan girt û xwest erf-edetên kurdan, kultûra wan, biparêze. Wê gelek hevalên tevgera nuh girtin, avêtin zîندان. Kêfa kurdan ji tevgera hukmetê re hat û dilê wan bêtir li cengê vebû. Hinekan gotin:

Em dibêjin hukmet ji me re başe hûn bawer nakin. Nuha we bi çavên xwe dît bê çawa hukmet tevî piraniya kurda ye.

Êrîş li ser wan cahilana ji her alî de giran bû. Kesf nema silav li wan dikir, kes bi wan re ne dirûnişt. Feqîra bi carekê bêrûmet bûn. Ew kesên, ku ne ji dil, mecbûr bi koma hevalên xwe re tevî yekîtiyê bûbûn, serên xwe rakirin û ji hevalên xwe re gotin:

– Me ji we re ne got, ev rê şaş e? Dilê we rehet bû?

Wî şerê giran xwediyên fikra tevkarîkirinê gihandin baweriyê, ku ew ji vir heya mala xwedê şaşin. Ew xwe-xwe bi hev ketin, şerê hevdu kirin û rêxistina wan ji hev ket.

Jihevketina wê tevgera nelirê bala kurdan û ya hukmetê jî fere kir. Hemî bi xebata xwe ya durust û heqî dijî kesên jirêderketî, serbilind bûn û hêdî-hêdî ew germayî çû û qehra wan buhurî û hemî alî bê xem, jixwerazî, li malên xwe rûniştin.

Helbet ne cayiz e ez bibêjim, ku dilxwazê wê fikra nuh neman: heger wilo be mana wê kurd bûn yek. Her û her dilên çend dilpak, xeşîm, nezan û neserwextên mîna min, bi tevkarîkirinê ve man. Wan nezanan hîna jî fikra xwe durust didîtin, lê êdî tecrîba wan çê bûbû, wan ceger ne dikir careke din ji xeta kurdayetiyê derkevin, qey dîn bûne, ya sitar!! □

## Gundo

Gundo!

Dema agir berdabûn giyana te  
dêrabûn xweliya kevirê kerr  
bi ser erda ter  
di navbera min û te de  
gelek zeviyên bi sînor raxistîbûn

Gundo!

nameya şewitî  
bi tîpên ji agir  
bi bêhna pîşo  
bi şîrqîniya bagera mirinê  
li hinarkên hinarên te  
nûçe berda ser dilê min

Gundo!

Dema min bihîst  
Felcê avêt bîranînên zaroktiyê  
Agir kete pêçekê  
Di nav wan pêtan de  
Bîranînên heft bavan şewitîn

Gundo!

Çidibe ruyê xwe ji min banede  
Guhan li min bidêre  
Dema agir bi ava te ketibû  
kevcalekê bi dilê min girtibû  
Qurequra beqa di mejiyê min de  
dengê atomê fetisandibû.

**SERKAN BIRÛSK**

Bawer bike gundo  
ez li wir bûm, li ser Tahta Berqê  
raserî newalê, miqabilî dehlê  
Kaniya kalo hêrz difûriya  
Çiyayê Omeriya bi carekê dihejiya

Gundo!  
Pîrikê ez hewar kiribûm  
Destê xwe dirêjî min kiribû  
Qemçek ax danîbû kefa destên min  
Çend dilop jî êstirên xwe  
hevîrek sor strabû  
Pêre jî kişiyabû  
bi agir re firiyabû  
Mîna aştiyeke dilbiar  
Vedabû li katê jiyana bêbihar

Gundo!  
hertişt dişewitî lê ez na...  
çirûskek pekiyabû xewnê  
harkiribû hêminiya xerîbiyê

Gundo!  
Li serê xirban  
raserê beriyê bûm.  
Min xwe berdabû  
Ketibûm ser erda rejî  
marîna bizina kejî  
Çixexîxê kewên bejî  
Hewtehewta seyên kedî  
dîroka roja şênîyên te nivîstî

Gundo!  
Wexta qêrîn, orîn û qirçên  
tevlîhev dibûn jî li wir bûm

Ne ku min nedibîhst qêrîna te  
Ne dişewitîm bi feryada te  
Min bi hewarî hewar kir  
Raxist ezman ber piyê te  
Çavên agir rijand  
kefa destê xewna te  
Bi dehfa bagerê  
pêlda hewara roja te

Lo Gundo!  
bi serê te li wir bûm  
li ser xirbeyê Dêra Dêrkurk paldayî bûm  
min pirtûka dêroka talanê dixwend  
bi çingîniya şûrê Îskender veciniqîm  
xwîn di min de geriyabû  
Gundo ez li wir bûm..  
Gundo ez li wir im..  
Gundo ez ê li wir bim...

# Bîra Dinyayê



ŞEREFXAN CIZÎRÎ

Zanebûna ku bi haweyekî giştî di civatan de zehye, normên îdeolojîkî ku li ba kesan hene û pîvanên exlaqî ku civat li ser wan ava bûne, xwe di zimanê xelkê de pir zelal diyar dikin. Zimanê xelkê, mirêka civatê û tamora dîrokê bi xwe ye. Zimanê ku ji bav û kalan de ji me re maye, bi ras-

tî tije qîmet û zanebûn e. Di warê mirov û mirovaniyê de, di warê kultur û exlaq de, ev ziman weke bîreke bêbinî ye. Ev yeka hanê divê ji hemû mirovan re tişteki pir eşkere be. Zimanê xelkê ku tojane tê axavtin, di nava xwe de gelek tiştan li bêjîngê dixîne, ew gelek arvanan di aşê xwe de dihêrine, ew gelek meşkên dew dikilîne û gelek tiştên pûç û vala jî diavêje ser sergoyê xwe. Li ser bendera xelkê, ya ku bi salan hatiye dêran, aqilekî pratîk şax daye û ev aqilê hanê xwe di zargotina xelkê de tov kiriye. Ew şîret, norm, dilbijandin, pîvan û qîmetên ku ji aliyê aqilê pratîk de bi kêr nayên, cihê wan di dîrokê dibe û bûye ser sergo. Hilbet ev yeka hanê li ba xelkê wilo ye. Li ser vî sergoyê hanê aqilê xelkê tune, di vir de tenê tiştên tiroviro kom bûne. Tiştên bê serî û bê binî di vir de hene, ew bûne eynî weke çîroka şûjinê. Ne serê wan heye, ne binê wan heye û ne jî mirov dizane ewê kengî xelas bibin. Li himberî vî sergoyê ku bi kêrî tişteki nayê, xelkê ji xwe re avaniyên bedew ava kirine û di van avaniyan de jî, ew bi hemû sixlet û haweyên xwe, xwe ji zimanekî çêkirî û

telomelo dûr dixistine.

Zimanê xelkê li ser rastiyan û bûyerên objektîf geş dibe. Ev rastî divê gelek caran were dubarekirin. Ji ber vê yekê jî, zimanê ku xelk bikartîne realist e. Di navbêna ziman û realîta civatê, xweza û dîrokê de raseriyeke pir xurt heye. Ji ber ku zimanê xelkê li ser zanebûna civatê ava dibe, li ser bûyerên rastî şax dide û di pratîka xelkê de tê hûnandin. Di navbêna, ziman û realîta civatî de, danûstandineke pir pozîtîf heye. Di zimanê xelkê de, ziman û realîta civatê hewcedarî hevdu ne. Ji ber vê yekê jî avaniyên ku xelk ji bona xwe ava dikin tije zanebûn in. Di van avaniyan de serpêhatiyên xelkê, êş û şahiya ku xelkê di jiyana xwe de dîtîyê, zanebûn û pêşneyarên xelkê ku him veşartî ne û him jî eşkere ne hene. Heta mirov dikare bibêje ku; hesûdî û dilbijandinên ku di nava civatê de meşrû têne dîtin jî, di van avaniyan de cîhê xwe girtine. Çementoya van avaniyan jî zimanê xelkê bi xwe ye.

Zanebûn, serpêhatî, dilbijandin, şîret û qîmetên di nava xelkê de, hemû bi riya vî zimanê ku em qala wî dikin têne belav kirin. Ev zimanê ku ji nava kezaba xelkê derketiye, hergav bi zanebûn û mînakên xurt tê xemilandin. Tama jiyane ji vî zimanî tê. Ev ziman ji hemû aliyan de tije wate ye. Di vî zimanê hanê de, em dizanin ku gelek caran wateyên veşartî jî hene. Wateyên veşartî ji bona pir kesan dikarin ne zêde diyar bin. Ji bona ku kes bikaribin bi hêsanî bibin xwediyê zanebûneke kûr, -hilbet di derbarên van wateyên veşartî de ew wilo ye-, divê berî hemû tiştan mirov ji xwe re hinek kodên zanyariyê karibe pêde bikin. Bêyî van kodên zanyariyê mirov tu cara nikarin kultur, struktur, tevgerêdanên sosyal û stûnên ku civata me li ser ava bûye baş fahm bikin. Ev kodên hanê divê yek bi yek, ji niha û pê de ji aliyê rewşenbîr, nivîskar û lêkolînavan de werin vekirin...

Di zimanê kurdî de yek ji van kodên hanê ku divê were vekirin, bi raya min gotina *Bîra dinyayê* ye. Bi rastî gotina Bîra dinyayê gotineke pir popûler e. Ev gotin di gelek tevgerêdanan de tê bikaranîn. Pir caran ew gotin weke kilîtê ye (miftê ye). Ew dikare gelek deriyan veke. Di nava zargotina xelkê kurd de, heta niha ev gotin weke belav bûye û cîhê xwe girtiye. Vê gotinê di zimanê kurdî de, ji xwe re cîhekî pir baş pêde kiriye. Mirov bi hêsanî dikare di çalakiyên zimanî de hergav pêrgî vê gotinê bibe. Mînak; "Filankek bîra dinyayê nabe", "Hayê wî ji bîra dinyayê tune", "Ewê ku bîra dinyayê bibe wilo nake" û gelek mînakên wilo. Yekî ku di civata kurdan de Bîra dinyayê nabe, bi rastî ew kes weke dahbelora tê binavkirin. Ew wekî yekî nezan û yekî nedîtî tê pejirandin. Li gora vê dîtinê, hayê wî ji bayê felekê qet tune. Ew nanxwîrê cilqetî e. Ango li paşmayî ye. Weke ku bav û kalan jî gotiye; ew kes tenê nan dixwin û cilan diqetînin. Wekî din tu xema wana nîne. Yekî ku di



civata kurdan de Bîra dinyayê nebe, ew li gora pîvanên xelkê bi rastî bê edeb e, ew bê kultur e, hayê wî ji zanyariya ku li dinyayê heye qet tune. Ew nekirkêr e jî. Li aliyê din jî, ew kesekî bê hiş û hişmendî ye. Xelkê kurd bi vê gotina hanê bi giştî wilo difikire...

Kesên ku ji ber xwe ve tiştên pêwîst nekin, ew kes Bîra dinyayê nabin. Kesên ku ji ber xwe ve tiştên pêwîst jî bikin, ew kes Bîra dinyayê dibin. Hilbet ji bona tiştên pozîtîf jî ew pevy wilo tê gotin; "Filankes bîra dinyayê dibe", an jî "Ma qey tu dîra dinyayê nabeş" ûhw. Bi kurtî li vir mirov dikare wilo bibêje; tiştên ku mirov ji ber xwe ve bikin û li gora aqilê xelkê be, ew di civatê de xwedî qîmet in. Bê zor, bê tade, bê berjewendiyên kesan û bê ku ji kesan re were gotin, divê tiştên pêwîst werin kirin. Wê gavê mirov dikare bibêje ku kesan, îca Bîra dinyayê rind fahm kiriye. Ewê ku hergav hewcedarên zixtan bin, hewcedarên bîranînan bin, hewcedarên zor û tadê bin, ji bona ku ew wazîfên xwe yê mirovî bi cîh binin, bi rastî ev kesana hîna jî para xwe ji Bîra dinyayê negirtine. Ji ber ku Bîra dinyayê li ser dilxwazî û çalakîyan jiberxwe ve geş dibe. Divê mirov jiberxwe ve bîr bibin. Ji ber ku bîrbirin tişteki jiberxwe ve ye. Divê mirov bigîhêjin vê kamilbûna ku jiberxwe ve karibin tiştên pêwîst bikin. Tiştên ku li gora exlaq û îdeolojiya civatê pêwîst e were kirin, divê werin kirin. Yan na Bîra dinyayê bi cîh nayê. Di Bîra dinyayê de zora fizîkî tune, lê belê zora sosyal û exlaqî heye.

## Sosyalbûn

Kesên ku ji Bîra dinyayê bê par bin, ew kes ji pêvajoya sosyalîzasyonê civata kurdan jî bê par dimînin. Sosyalbûn li ba van kesan qels e. Ew ne li gora pîvanên civatî lê belê li gora pîvanên xwe tevger dikin. Yan jî ew qet tevger nakin. Li gora libendariyên civatê, kes gelek çarvan gav diavêjin, helwest digirin û hevkarîyê dikin. Li gora sosyalîzasyonê civata Kurdan divê hinek qîmet, norm û pîvanên civatê ku hene, divê werin zelalkirin. Piştî jî ew qîmet, ji hinek nîşên mirovên kevin werin girtin an jî ji hinek dezgehên kulturî werin girtin an jî ji pratîka sosyal ya mirovan werin neqandin û bi haweyekî pîralî ew derbasî hinek nîşên mirovên nû bibin. Pêvajoya sosyalîzasyonê di navbêna nîşên mirovan de wilo pêk tê. Ev derbaskirin û barkirina qîmetan ku di nava nîşan de çêdibe û bi çalakîyên zimanî ve realîze dibe, bêtî nakokiyên civatî hilbet nikare bimeşe. Di vê pêvajoyê de hilbet pevçûna sosyal heye. Dijayetî heye. Şerê ramanî û exlaqî di vê pêvajoyê de gelekî dijwar derbas dibe. Ew tişteki gelek normal e. Di vê derbasbûna pîralî de, endamê civatekê bi gelek

haweyan têne perwerdekirin, nasnama wan î sosyal û netewî formê xwe digire. Bi vî haweyê ku ez qal dikim jî, yekîtiya zargotinê çêdibe, hişmendiyeke nêzîkê hevdû pêda dibe, xwe naskirina kesan (hilbet berî hemû tiştî weke kurd û mirov) ji aliyên exlaq û kesayetî de, pêk tê. Di vê pêvajoya civatî de, ku ez niha li vir qal wê dikim, ev kesayetî û exlaqê hanê heyvanê xwe digire, struktûra xwe ava dike û dibe weke cemento û îdeolojî ji bona civatekê.

Baş e, wekta ku rewşa giştî wilo be, em ê mijara xwe wî çaxî çawa şrove bikin? Ma gelo gotina Bîra dinyayê bi rastî di vê tevgirêdanê de tê çî wateyî?

Li ser vê yekê ez heta niha pêrgî tu tekstên kurdî yên nivîsandî nebû me. Bi qasî ku ez dizanim jî, ev cara yekemîn e ku emê li ser mijara Bîra dinyayê rawestim. Ji ber wilo jî dikare ji aliyê ramanî de, hinek ne zelalî û kêmasî xwe bidin nîşandan. Dîsa ji ber wilo jî, li ser vê mijarê em hewcedarên diyaloga ne...

Berî hemû tiştî mirov dikare wilo bibêje ku Bîra dinyayê tişteki objektîf e. Ew aliyê mijarê yê metodîk e. Ango mirov bixwazin an nexwazin ew weke zanebûn her heye. Derî û pencereyên vê bîrê ji hemû kesan re vekiriye. Hemû mirovê gîhayî ku endamê civatê ne dikarin ji xwe re, bi dewla xwe ji vê bîrê avê vexwin û ji zanyariya welatê xwe bibin xwedî par û bi vî haweyî jî, bibin beşek ji hişmendiya xelkê xwe.

Hema niha bi carekê re mirov dikare wilo bibêje ku, ev bîra ku em qal dikim, tu cara ne bîreke çarçik e. Bîra dinyayê ne tenê bîra çîna ye, ne tenê ya tebeqên sosyal e an jî tenê ya kategoriyên etnîkî û dînî ye. Ev bîr tu cara ne ya kesa ye jî. Ew bi xwe, li derveyî hiş û zanebûna kesan e. Bi haweyekî gelek kûr, gelek neqandî û tije hêjayî, ew ji nava dîrok û zimanê kurdî derketiye. Hilbet kes dikarin bi çalakiyên xwe ve, xwe bi Bîra dinyayê re bikin yek, ji vê "bîrê" ava vexwin û têhna xwe pê hênik bikin. Parekê ji xwe re, ji vê "bîra" zanebûnê derxînin. Lê divê mirov zanibe ku, ev "bîr"ş ne ya tu kesan e. Mirovên çalak dikarin netewê û gelê xwe, bi riya vê "bîra" hanê baş nas bikin. Ji ber ku di vê şbîrêş de hişmendiya gelekî ya kolektîfî heye, kodên netewî yên ku psîkolojîkî û edebî ne hene, pêwistiyên mirovî hene, dîrok û esterîka xelkekî di vir de kom bûye, ûhw...

Ji bona ku ramanên me yên ku li vir têne hûnandin şaş neyêne fahmkirin, ez niha dixwazim li ser gotina bîrê hinekî din rawestim: Bîr, di zimanê kurdî de tê du wateyên ku ji hevdû cûda ne. Yek jê bi wateya hiş tê bikaranîn û bi hişmendiya mirovan ve girêdayî ye. Weke ku tê zanîn hiş û hişmendî ji nêzîkayî de bi hevdû ve girêdayî ne. Ev yeka hanê tişteki pir êşkere ye.

Hişmendî li ser hişê mirovan ava dibe. Bê hiş, hişmendî nikare pêş bikeve. Ji xwe weke ku tê zanîn; di tovkirina hiş de, hişmendî dikare şax bide û fonksiyonel bibe.

Mirovên ku ne li ser hişê xwe bin, bi rastî mirovên ku ji derb de ketine. Van mirovan fonksiyoneke xwe ya gewdeyî winda kirine. Ev fonksiyona gewdeyî û fیزیolojîkî, angî hişê mirovan, eşkere ye ku bûye navenda hemû gewde yê mirovan. Ev hişê ku em qala wî li vir dikin, bi rastî programa gewdê mirovan bi xwe ye. Ew weke hişê kompîtûrê ye. Dîsa weke ku tê zanîn gewdên mirovan, li gora hişê wan tevger dikin. Ev jî rastiyeke fیزیolojîk e...

Wateya dîn jî, bi wateya bîra avê tê bikaranîn. Bîra ku beriya hemû tiştan ji bona avxwarinê hatiye kolan û ji aliyên fizîkî de serî û binê wê eşkere xuya dike, li ser rûwê erda dinyayê hatiye kolan. Rûwê erda dinyayê, ji bona xatirê avê hatiye qul kirin. Mirovan bi keda xwe, bi hêza gewdê xwe û bi alavên xwe ev bîr kolane. Ji bona ku avê ji vê bîrê vexwin, sewal an jî erdê xwe pê av bidin... Bi kurtasî di navbêna bîra avê û hişê mirovan de, analogiyek heye... Ev analogî gelek cara ne zelal e û heta niha jî baş nehatiye şîrovekirin.

## Gotina Bîrê

Îca bi hêsanî mirov dikare bibêje ku Bîra dinyayê, di warê zanyarî û zanebûnê de, bi rastî bîreke bêbinî ye. Heta mirov dikare wilo bibêje ku ev bîr, angî Bîra dinyayê, him di wateya "Hişê dinyayê" de û him ji di wateya Bîra dinyayê de tê bikaranîn. Hilbet bîr di serê mirovan de, bi wateya xwe ya fizîkî weke tesewirekê tê dîtin. Bîrên ku kesên ji bona avê ji xwe re kolan e, weke ku tê zanîn binê wana hene. Cîhê wana xuyayî ne. Pîvan, form û tefsala wan bîran, ji mirovan re pir zelal xuya dike. Ev bîr li gora normên fizîkî hatine kolan. Lê belê Bîra dinyayê, bi rastî bîreke bê biniye. Kes nizane ev bîr bi çi hawî û terzî ye. Mirov dikare wê bişibîne deryayeke bêbinî. Hilbet ev her du tişt jî, bi xwe weke tesewirên mirovan e. Ew şibandin in. Çarçikên wana ne zelal û ne xwedî form in. Di tesewîra mirovan de, ya ku li ser Bîra dinyayê hatiye kirin, ev şibandina ku em qal dikin hîna jî baş zelal nebûye.

Di zimanê kurdî de li ser van mijaran, mixabin hîna jî lêkolînên zanyarî nehatine kirin. Ji ber wilo jî wexta ku mirov ji hevdu re, ji bona hinek tiştan, rewşan û bûyeran dibêjin; Bîra dinyayê nabe, bi rastî ev şiklê gotinê carna dikare hinekî jî li hewa bimîne. Ji ber ku ewê ku ji kesên re dibejin; Bîra dinyayê nabe, divê ew bi xwe hayê wî ji Bîra dinyayê hebe. Dikare ew bi xwe Bîra dinyayê nebe. Ji ber ku Bîra dinyayê tu cara nikare bibe weke alavekî perçiqandina mirovan. Bîra dinyayê ne sloganeke ku, mirov wê li hemû deveran û ji bona hemû rewşan karibe bi kar bîne. Bîra dinyayê ne weke jokêr e lêyîztika kaxezan e. Di hemû rewşan de ev gotin derbas

nabe. Nikare derbas bibe jî. Weke ku tê zanîn Bîra dinyayê ya hemû kes û tebeqan e. Ew ne malê kesakî an jî tebeqakê ye. Lê divê Bîra dinyayê berî hemû tiştan di revgirêdanên rast de were bikaranîn. Divê gotina Bîra dinyayê di cîh û revgirêdanên rast de were gotin. Yan ne ewê ew gotin wateya xwe ya rast zû winda bike û silûk bibe.

Îca ji bona ku mirov zanibe ka ev gotin di cîhê xwe de ye, rast an jî çewt hatiye bikaranîn, divê berî hemû tiştan wate û naveroka Bîra dinyayê, ji gelek aliyan de were zelal kirin. Niha Bîra dinyayê ji aliyê semantîk de bi rastî hinekî xumamî ye. Ji bona hemû kesan naveroka wê ne zêda tebût e. Ji ber ku Bîra dinyayê li gora civatek berbiçav, xuyayî û dîrokî, meşrûbûna xwe dikare bipareze an jî red bike. Dîsa ji ber wilo jî, mirov dikare bibêje ku di Bîra dinyayê de gelek mij û dûman heye. Gelek kes dikarin li gora rewşên ku ji aliyên exlaqî de ne zelal in, wê çewt jî bi kar bînin. Ji bona ku Bîra dinyayê li gora rewşên rast û di cîhê xwe de bê bikaranîn, divê hejmara kesên ku di civatê de Bîra dinyayê dibin, zêde bibin û Bîra dinyayê bi rastî bibe weke perçekî ji hişmendiya gel. Hemû kes wê bi rastî bipejîrînin. Ew bibe weke referansekê ji bona hemû kesên gihayî ku li vê civatê hene. Lê em dizanin ku civatek tu cara di cîhê xwe de namîne, ew pêş ve jî diçe, tê guhertin û xwe nû dike. Bi civatê re hilbet Bîra dinyayê jî xwe nû dike û xwe diguherîne. Ev jî rastiyeke felsefî ye ku divê were gotin.

Em dizanin ku di zimanê kurdî de hinek gotinên ku rewşa wan weke ya Bîra dinyayê ye hene; ji bona mînak mirov dikare "Çerxa dinyayê", "Bîra qedêrê", "Feleka xaîn", "Dinyaya bênamûs" ûhw nîşan bide. Gelek gotinên wilo di zimanê kurdî de cîhê xwe girtine. Ew di zimanê kurdî de stewyayî ne. Lê mixabin li ser van gotinên wilo heta niha xebatên zanyarî û lengivîstîkî baş nehatine kirin. Ji ber wilo jî di vî warî de hinek ne zelalî hene.

Gelek caran gelê kurd hîs û zanebûna xwe, bi riya gotinên wilo tînin ziman. Ji bedêla ku ew çewalek gotinên vala bikin an jî lêkolînên zanyarî li ser bûyerekê xuyayî bikin, ew bi kurtî dibêje ku; "Feleka xaîn" wilo li me kir, "Çerxa dinyayê" li me qulipî, "Kurd Bîra dinyayê nabin" ûhw. Mirovên kurd bi vî hawayî gelek caran dixwazin ku xwe ji berpirsyariya kesayetî azad bikin. Bi vê yekê dixwaze Felekê û Dinyayê sêdar bike. Ma gelo Felek û Dinya bi serê xwe, ji bona pêşveçûnê, ji bona têkçûnê, ji bona biserketin an jî gelek bûyerên din, dikare tenê bibin xwedî otorîte? Bi bahweriya min na. Ji ber ku ew ên ku Felekê û Dinyayê dikin Felek û Dinya, mirov bi xwe ne. Bêyî mirovan Felek û Dinya bê wate dimîne..

## Xweserî

Di navbêna Bîra dinyayê û xweseriyê de jî, bi bîr û bahweriya min danûstandineke pir xurt heye. Xweserî hilbet li cem kesê kamilbûyî heye. Xweserî, xwe bi xwe otorîtebûn e, xwe bi xwe bîryardan e. Zîrekiya ku xwe bi xwe tevger kirine. Kamilbûn e. Hilbet ez li vir ne qala kamilbûna fîzîkî û biyolojîkî dikim. Ev gîhandina gewdeyî, gîhandineke xwezayî ye. Pêvajoya di vê kamilbûnê de li ser bingegehên biyolojîkî dimeşe. Di navbêna vê cûre kamilbûn û Bîra dinyayê de danûstandineke rasterast tune ye. Lê di navbêna Bîra dinyayê û kamilbûna sosyal de gelek haweyên danûstandinên rasterast hene. Ji xwe Bîra dinyayê di pêvajoya sosyal de û bi danûstandinên bi mirovan re, dikare ji hemû aliyan de jîn bide û geş bibe. Kes, weke ku tê zanîn ne ji bona xwe Bîra dinyayê dibin, lê belê ew vê ji bona mirovên din û civata xwe dikin. Ango di danûstandinên sosyal de Bîra dinyayê, ji bona hinek mirovên din dikeve rojevê. Ji ber ku rojev ne ji bona min çêbûye. Ew her gav di civatê de heye û ji bona hemû kesên vê civatê derbas dibe. Ew rêzana civatê ye. Di zimanê me de ew, bi haweyekî objektîf her gav heye û di rojevê de ye.

Kesên ku van kirinên pêwîst, anga kirinên sosyal û exlaqî di civatê de dike û hinek pêwîstiyên ji bona mirovantiyê bi cîh tîne, ew bi xwe jî parçeyek ji vê mirovantiyê ne. Divê ev yeka hanê gelek caran were dubarekirin. Ew kesên ku parçeyek ji mirovantiya civatê xwe ne, bi gelek haweyan Bîra dinyayê jî dibin. Bi vî haweyî ku em niha li vir qal dikin jî, hişmendiya kesan tov dide, kûr dibe û bi haweyekî giştî fireh dibe. Wexta ku mirov di şmîrovatiyaş xwe de tê gîha, li ser wê yekê dibe xwedî dîtîn û hiş, mirov wê gavê dibe parçeyek ji Bîra dinyayê jî. Mirovên ku "mîrovantiya" xwe baş nas nekin, nikaribin cihêbûna xwe ya ku xwezayî ye, ji cihêbûna xwe ya ku sosyal e ji hev dû cîhê bikin, wana hîna jî Bîra dinyayê nebiriye. Bîra dinyayê, bi xwe hisandina mirovan e. Hilbet ev bi xwe hisandina ku em qala wê dikin, ne bi xwe hisandineke zêf û belawela ye. Ev bi xwe hisandin, bi xwe hisandineke tov û kûr e, tije zanebûn e. Ev bi xwe hisandina mirovan, dizane çi ji dinyayê kemê û çi jî zêdeye. Li hemberî bûyerên civatî helwestên etîkî digire. Cîhê xwe li dinyayê û li civatê zelal dike. Şikan ji tiştan re nahêle. Heta dawî diçe. Dibêje; ez ev im! Alîkariya kesên ku sergêjekî li wan geriyaye dike. Bi destê wan digire. Rê pêş wana dike û pisûla rêpêşkirinê dixwe destê wana...

## Berpirsyarî

"Bîra dinyayê" bi pîrsa berpirsariyê re jî, ji nêzîkayî ve gîredayî ye. Ew kesên ku

Bîra dinyayê dibin, divê berpirsariya xwe jî zanibin. Dîsa ewê ku dizanin ka çi di civatê de pêwîst e bê kirin, ew kes jî Bîra dinyayê dibin. Ne tenê tiştên ku di civatekê de pêwîst in, lê belê di civatekê de çi ne pêwîst e jî, dîsa dikeve nava wateya Bîra dinyayê! Ango him tiştên pêwîst û him tiştên nepêwîst dikevin nava wate û referansa Bîra dinyayê! Tiştê helî giring li vê derê ev e; divê kesê ku Bîra dinyayê bibin him tiştên pêwîst û him ji tiştên ne pêwîst zanibin. Ji ber ku di Bîra dinyayê de zanebûn bingehîn e. Di Bîra dinyayê de, cîh ji nezantiyê re tuneye. Di referans û çarçova Bîra dinyayê de zanîn, bi rastî xwediyê cihekî navendî ye. Bê zanîn, bê berpirsari, bê xweserî û bê helwestgirtina etîk, Bîra dinyayê tu cara nikare bi cîh bê...

Hilbet Bîra dinyayê nikare di ser serê civat û dîrokê jî re bisekine. Ew ne mimkûn e. Ev rastiya hanê divê gelek caran were dubarekirin. Bîra dinyayê li hemû babetên civatan nikare weke hevdu derbas bibe. Dîsa Bîra dinyayê di hemû demên dîrokî de, nikare bi eynî pîvanan realîze bibe. Li gora rewşa ekonomîk û avaniya jorin di civatekê de, pîvan û qîmetên Bîra dinyayê jî tî guherandin. Di hemû qonaxên îdeolojîkî û kulturî de, Bîra dinyayê ne weke hevdu ye. Nikare weke hevdu be jî. Ji ber ku Bîra dinyayê her gav ne di cîhê xwe de sekiniye. Ew jî weke civatê bi giştî tê gûherin û xwe nû dike. Heta mirov dikare gaveke din jî pêş de here û bibêje; Bîra dinyayê weke beşekî ji avaniya jorîn e. Wexta ku avaniya bingehîn tê guherin, pê re hêdî hêdî Bîra dinyayê jî tê guherin. Hilbet Bîra dinyayê li vir ne pasîf e, ew jî di vê tevgerêdanê de aktîf e û dikare bê şik tesîreke mezin li avaniya bingehîn jî bike...

Weke ku tê zanîn avaniya jorîn di teoriya Marksîstî de xwediyê cihekî bi taybetî ye. Danûstandina avaniya jorîn û bingehên ekonomîk di civatekê de, bi gelek hawayan tesîrê li hevdu dikin û civat di vê danûstandinê de form digire û berbiçav dibê. Ji ber wilo jî ez dibêjim ku, Bîra dinyayê inçex di civateke berbiçav û di qonaxên dîrokî de, dikare fonksiyoneke pozîtîf bigire û baş bê fahmkirin. Ew dikare wê çaxê bibe parçeyek ji komunikasyona di nava mirovan de. Hîs û zanebûna mirovên berbiçav bîne ziman. Ango Bîra dinyayê tu cara, ji civateke berbiçav û dîroka vê civatê ve, nikare were qetandin û bibe tiştêkî serbixwe. Ji ber ku aktorên civatekê di qonaxê dîrokî de çalakiyên xwe lidar dixin, helwestên xwe digirin û hinek qîmetên exlaqî û îdeolojîkî bi xwe re hiltînin. Ango wexta ku mirov çalakiyan lidardixin û helwestan digirin, ew ji aliyê qîmet û pîvanan de tu cara ne vala ne. Civat û dîroka wana bi qîmet û bipîvanan xemilandîne, zimanekî amade pêşkêş wan kiriye, ew di nava kulturekî serdest de ji dayîka xwe bûne û civatê rola xuyayî daye wana.

Her çiqas kes di jiyana civatî de, ne pasîf bin jî, kes bi serê xwe tu cara nikarin, ev barê ku em li vir qala wî dikin, ji ser xwe bi carekê re biavejin û xwe bi hemû hawayî jê azad bikin. Ev barê ku em qala wî dikin weke çermekî li mirovan hatiye pêçan û bûye nasnama wan a netewî an jî ya etnîkî. Ew nasnama netewî, mirov bixwazin an jî nexwazin weke tiştekî objektîf li holê heye. Di hişmendiya mirovan de ew heye. Di avaniya kesayetiya mirovan de, ew xwediyê cîhekî bi taybetî ye. Rola vê nasnamê dikare qels bikeve an jî xurt bibe, lê belê ev nasnama hanê di jiyana kesane de xwediyê cîhekî giring e...

Di Bîra dinyayê de tenê neteweparêzî, ango xweparêzî û nasyonalîzm tune. Divê mirov vê yekê wilo fahmbike. Ji ber ku nasyonalîzm û xweparêzî, di warê zanebûn û pîvanên exlaqî de, mirovan dixin cîhekî teng. Tixûban ji bona tevgera kesane ava dikin. Wê gavê bi wateyekî gerdûnî zanebûn û exlaq tê zindan kirin. Raman tîn ferisandin. Heger armanc bi Bîra dinyayê tenê neteweparêzî û xweparêzî ba, ewê li şûna Bîra dinyayê gotina "Bîra Kurdan" bêtir di cîhê xwe de baya. Lê belê bav û kalên me gotina Bîra dinyayê û bi vê yekê jî xwestine ku gerdûnîbûna Bîra dinyayê derxînin pêş. Ango kes him kurd in û him jî dinyayî ne. Him bi xwe ne û him jî di civatê de ne. Bi qasî ku kesên kurd ji kurdûna xwe berpirsyar in, divê kesên kurd ji dinyayîbûna xwe jî ewqasî berpirsyar bin. Bi qasî ku mirov ji xwe berpirsyar in, divê mirov ji civata xwe jî berpirsyar bin. Herdû aliyê mirovan bi hevdu re dimeşin û rîya kesane ronî dikin. Ji ber ku mirov bê civat û civat jî bê mirov nabe. Ev herdu têgîhiştin ji hevdu nikarin werin veqetandin û îzolekirin...

## Dawî

Ez gelek caran ji xwe re difikirim û niha jî li vir ji xwendevanan re dibêjim; ma gelo ku siyasethêrî me, rewşenbîrî me, hunermendî me û têkoşerî me di wexta xwe de Bîra dinyayê bibirana, ewê rewşa welatê me îro çawa ba? Ez baş bahwer dikim ku ewê birakujî li welatê me hema hema tuneba, ewê cahşîtî hema hema li welatê me tuneba, ewê nekirkêran hema hema hergav pêşengiya gelê me nekirana, ewê kultura demokrasî, mirovanti, hevkarî, parvekirinê, wekhevî û welatheziyê di welatê me de geş bibûya û welatê me hema hema tu cara nedibû çar parçe. Heger kurdan di wextê de Bîra dinyayê bibirana, ewê tu caran nehiştina ku welatê me bikeve nava vî halê xerabe. Di vê tevgirêdanê de tiştê helî xerîb jî eve ku; gotina Bîra dinyayê weke ku di kultur û zimanê kurdî de cîh xwe girtiyê, -bi qasî ku ez dizanim- di tu kultur û zimana de, cîhê xwe bi qasî ya zimanê kurdî baş negirtiye. Lê

belê dîsa jî gelek mirovên kurd, di warê ziman û kultura xwe de, her a îro jî ew ji Bîra dinyayê bê par mane. Hayê wana ji kultur û zimanê wana baş çê nebûye her a niha. Ma gelo ji vê yekê re mirov dikare bibêje çi? Feleka xaîn, Dewra dinyayê an jî zexeliya kurdan û tunebûna aqilekî netewî di civata me de. □

---

## **Kitêbeke Şerefxan Cizîrî ya nû**

### **Bize bir felsefe lazîm**

Şerefxan Cizîrî gotarên xwe yê ku di navbera salên 1992-96an de di rojnameya Şrojane Politikayê de nivîsandibûn, berhev kirine û mîna kitêb bi navê "Bize bir felsefe lazîm" daye çapê. Cizîrî di van nivîsên xwe de bi perspektîfeke rexnegirî nêzîkî siyaset, entelektuelî, karakter û felsefeya kurdan dibe.

### **Bize bir felsefe lazîm**

*Şerefxan Cizîrî*

Weşanên Enstîtuya kurdî ya Brukselê-Pêrî



## Zerê min de mendê rêçê awiranê to

wisar o  
wisarê nêrgiza min  
newe abiya.....

xêlî bi xemla ti, henga min  
gama ez bi çiman hamayne ramûsanê lewanê to  
çimanê min de şiliyê şerman  
to min ra dûr berdêne...

to da reye û ti şiya  
zerê min de mendî rêçê awiranê to...

ti nêşiyayne!  
ma şan bi şan evîne pawitê  
û ti şiya  
wêneyê şiyayîşê to awiranê min wa aleqiya..

sûsika min  
hewayîşê to yo nîmcet  
janê min.....

de şo  
ti berriyê vewre wa hendî  
kalekê min a çepe de...

.....!.....

nika;  
ez tenêya, bê to  
vîrên min, xeyalên to  
û lewê dîjle de, awa lêl e  
wazena gunanê xo û to piya birişnî  
xuşînê pêlan  
min xapênênê bi hamayîşê to.....

# Suzan Samanci:

## Nivîskarî ew e ku mirov li xweşikiyê bigere

Hevpeyvîn: **ABIDÎN**

**Suzan Samanci** di sala 1962an de li Amedê hatiye dinyayê. Ew hê jî jîyana xwe li Amedê didomîne. Nivîsandin karê wê yê sereke ye. Wê bi helbestên tirkî dest bi edebîyatê kir. Pirtûka wê ya pêşin bi navê *Ertîyîp Gidiyor Gece* derket. Di sala 1993an de pirtûka wê ya *Reçine Kokuyordu Hêlin* derket. Pirtûka wê ya sisiyan bi navê *Kıraç Dağlar Kar Tuttu* derket. Pirtûkên wê tê wergerandin û li dinyayê belav dibin. Di nivîsên xwe de herdem bêhn û tahma welatê xwe tîne zimên. Niha jî, ji bo xwendevanên Nûdemê me bi S. Samanci re hevpeyvînek çêkir.

**ABIDÎN:** *Suzan Samanci çima Amed? Ji bo çi tu li vî bajarî ma?*

**S. SAMANCI:** Ji ber ku bajarê Amedê ez xistim vî şikilî. Ez li vî bajarî heme. Hebûn û tunebûna min ev e. Ez ne bawer im ku ez karibim li bajarê metropolê jîyana xwe bidomînim. Ji ber ku vî bajarî gelek êş kişandiye. Dera ku êş lê hebe mirov ka-re wê êşê jî binivîsîne. Gava ku ez gelekî aciz dibim ez wê gavê dikarim binivîsînim. Li Amedê malzemeyên herî baş hene. Ev têra min dikin. Ez di cîhana xwe de me.

– *Mîna rehmetyê Can Yücel gotiye: Ger mirov ne bê hêvî be nikare binivîsîne. Ne wisa?*

– Belê nivîskarî ew e ku mirov li dû hebûnê here. Mirov divê jîyanê bide ber pirsan. Xwe bide ber pirsan. Nivîskarî ew e ku mirov li xweşikiyê bigere. Dawîya vê gerê tuneye. Welatê ku qîrîn û mirin lê hebe xweşikî bêhtir li dûr e.

– *Nivîs ji bo te çi ye? Gelo te dikarîbû nenivîsanda?*

– Nivîs ji bo min forma jîyanê ye. Tizek hundirî a çêbûna mirov e. Gava tu bi vê qabîliyê bihesî û bi hêrs û sebrê here ser mirov wê tiştên xweşik derxe holê. Xwezî min karîba nenivîsanda û li kêfa xwe binerîya. Piştî ku mirov vîrusa edebîyatê sitand, mirov nikare jê xelas bibe. Xelasbûn afirandin e.

– *Suzan Samanci ji bo jinan çi dibêje? Edebîyata jinan di çi merhelê de ye? Tu li ser jinan û populîzmê çi dibêjî?*



Abidîn ji bo  
xwende-  
vânên NÛDE-  
Mê çû  
Diyarbakirê  
û bi Suzan  
Samanci re  
peyivî.

– Jin hacetek ji bo reklamê tê bi kar anîn. Huner kirine mîna metayekê. Weşanxane li kalîteya pirtûkê nanerin, tenê dibêjin evê çawa bêrîka min dagire. Li welatên bi serneketî de xwendevan mîna pez in. Tu bi kîjan alî de bibî wê here wî alî. Vê yekê jî ev medyaya bi qirêj xweş bi cih tîne. Rewşa pirtûkan jî weha ye. Medya çî dixwaze wê difroşe.

– *Gelo ev yeka û huner li hev dike an na?*

– Nivîskarê ku bazara xwe bike û bi dengêkî bilind pesnê xwe bide wê zû bibetile. Li pêşerojê nanere. Divê berpîrsîyarîyeke mirov ya exlaqî hebe. Ev mîna agirê kayê ne, dibiriqin û ditefin.

– *Tiştên mirov dinivîsîne divê ji bo insanan dîyarî be, ji bo te jî weha ye an na?*

– Ji bo nivîskar piştî ku pirtûka wî derket piyasê her tişt diqede. Êdî ew ne pirtûka wî ye, ya herkesî ye.

– *Gelo piştî çîrokan tu ê dest bi nivîsandina romanên bikî? Ji bo te jî çîrok qademyek ji bo romanê ye?*

– Na, ez vê yekê qebûl nakim. Ev tişteki çewt e. Dibêjin pêşî şîr, dawî çîrok, piştî hemiyar jî roman. Na, ev ne rast e. Mirov li derbasbûna gelek nivîskaran dinêre destpêk şîr e, şîr destpêkek hêsan e; lê şairî karekî zor e. Herkes nikare bibe şair. Gava em werin ser çîrokê jî; Di çîrokê de hûn romaneke girsehêz dixine nav çend pelan. Ev karekî zor e. Çîrok bêhtir nêzîkî şîrê ye. Bi gotinan re direqise. Zêdayîyekê jî qebûl nake. Ji Romanê re bêhtir sazgerî divê. Ji ber vê jî xelasbûn zor e. Di roman û şîrê de hûn dikarin bêhnên kin bistînin, lê di romanê de hûn ê her dem bi qehreman û di atmosfera wê de şer bikin.

– *Tu wek jîneke kurd li ser edebîyata kurdî çi difikirî?*

– Ji ber ku zimanê kurdî qedexe ye, dîroka wê jî nehatiye nivîsandin. Ji ber vê jî edebîyata kurdî a nivîskî jî herdem li paş maye. Ji ber ku dara hunerê li cîhên azad şîn dibin û meywe didin. Lê êdî wê weha nebe wek Brecht gotiye: "Ji ber ku weha bû wê weha nemîne." Em niha di pêvajoyeke dîrokî de derbas dibin. Çi êşeke girîng e ku di salên du hezarî de jî em hîn li van deran e. Bi qedexe û bi tabuyan tu welat nayê îdarekirin. Di welatên demokrasî bi pêş ve neçûye rewş weha ye. Mirovên ku nebe ferd nikare dilşa jî bibe. Ji bo mirov bibe ferd divê mirov bi zimanê xwe yê dayîkê zanibe. Gava mirov bipeyîve mirov wê demê dikare bifikire û binivîsîne jî. Hebûn ew e ku mirov karibe bi zimanê xwe bipeyîve û binivîsîne. Tirkîye niha çermê xwe diguhere, diviyabû biguhere jî. Biçûk bin jî hinek gav tîn avêtin. Di kovarên li ser hunerê de dosyayên li ser edebîyata kurdî vedibin û tîn weşandin. Ma diviyabû kurdan ji bo vê bedêl bidina! Tişteki jî vê tabûtir heye gelo; ku mirov bi zimanê xwe yê zayînê bijî.

– *Haya te çiqasî ji edebîyata kurdî heye?*

– Wek her car ez dibêjim kurdîya min gelekî qels e. Kurdîya min tenê têra zimanê gelî dike. Ez nikarim gelacîyeke edebî an siyasî bi kurdî bikim. Ez nikarim binivîsînim. Ez karim bi zimanê tirkî edebîyatê bikim. Xwezî min karîba bi kurdî ede-

bîyatek kiriba. Ger tu bi zimanekî mezin nebûbî û bi wî zimanî xewn nedîtibe, te ahenga wî zimanî zefî nekiribe, gelekî zehmet e ku tu bi wî zimanî binivîsînî. Gelek kes ji bo ez bi kurdî nanivîsînim min sûcdar dibînin. Ez wan kesan gelek cara bi heq dibînim lê ji bilî vê jî ez van sûcdarîya zarokî û bê sebir dibînim. Ger min karîba bi zimanê xwe binivîsanda çima ez nenivîsînim. Em niha xizmeta kultura serdest dikin lê dîsa jî em mîna zarokên dêmarîyê ne.

– *Niha zimanê te yê kurdî çawa ye? Tu di pêş de difikirî ku li ser kurdî tiştinan bikî?*

– Niha hebekî ez karim bixwînim. Ez gelekî nikarim edebîyata kurdî taqîb bikim. Gotinên nuh li min zor tê. Di demên pêş de ez dixwazim çîrokên xwe yên kurt bi kurdî binivîsînim. Lê ihtîmaleke mezin wê bi tirkî bê fikirandin û bi kurdî bê nivîsandin.

– *Li gora ku min niha bibîst te romanek nivîsandîye. Tu dikarî hebekî qala vê romana xwe ji me re bikî?*

– Di vê cografîyê de her roj mirov tînin kuşin. Bi hezaran mirov di girtîgehê de ne. Bi qîrînan dayikan em dijîn. Hûn di rewşeke weha de ne, tabî ye tiştên ku hûn binivîsînin jî di vê rewşê de derbas bibe. Romana min piştî salên 90'î di atmosfereke bi tirs li zanîngeheke metropolê derbas dibe. Li vir çar xortên kurd ku li xwe û hebûna xwe digerin, buhranên wan hene. Dawî azadîya xwe li çîya digerin, roman ev e, di vir de dayikek ku ketiye dû şopa lawê xwe û xwe li bajarê mirinê ê ku zaroktiya wê lê derbas bûye, dibîne. Di vir de koçberî, feqîrî û belengazî heye. Roman bi kurta hî ev e. Min her dem xwestîye êşa ku gelê min kişandîye binivîsînim. Ji ber ku ez nivîskareke gelî me.

– *Suzan Samanci, gelo rewşa te ya edebî û ya rojane ji hev diqete, an di nav hev de ye?*

– Edebîyat bûye rewşa min, bûye jîyana min. Ez li vir bêhnê distînim. Ev karekî zor e li vir. Bifikirin hûn li welatekî lipaşmayî dijîn û hûn jin in. Di ser vê de jî hûn kurd in. Gava ev hemû dikevin ser hev tişteki ecêb derdikeve holê. Erê em di rewşeke weha de dijîn û di salên du hezarî de ne. Feodalîte hîn li ser serê me sekinîye. Van yekan em li paş hiştine, jin li paş hiştine.

– *Ez gelekî spas dikin ji bo vê hevpeyvînê. Tişteki ku tu di dawî de bêjî heye?*

– Ez hunerê mîna xelasîyê dibînim. Em rewşa wan welatê ku hunera wan bi pêş de neçûye dibînin. Ger em bixwazim hebin, divê em di behra edebîyatê de, qet nebe li qiraxê wê avjeniyê bikin. □



SUZAN SAMANCI

## Dayika Hîvda

Cerdevanên diran zingarî di bin simbêlan de dikenin. Dema ku li ser benderê bi çekên ku avêtibûn milên xwe yên lewaz digeriyan, simbêlên xwe yên bi rişk di nava diranên xwe de dicûtin, ji aliyekî ve jî, bi orînê gewriya xwe paqij dikirin. Dayika Hîvda, ji pişt tenûra xerabe nerî. Lêvên wê diricivîn, dua dikirin dîsa... Tîrik di nava kefa destê xwe de gerand û çend gav avêtin, zendika xwe bi rûyê xwe paqij kir. Bi dengê irçênî, "ji Xwedê bitirsin! Ma min hindik di ber we de ked rijand? Em bi salan di nav hev de li ser vê benderê xebitîn. Tevî ku hûn dizanin çekên me tune ne jî, dîsa hûn ji devê deriyê me venaqetin", got. Serok Cerdevan Kero, berçavka xwe ya erzan ya rojê deranî, çembilkê wê xiste devê xwe û ber bi Dayika Hîvê ve qedimî. Çavên xwe yê tenê ku mîna zerika xwînê sor bûbû heciqand, "lê lê Hîvê! nebêje tune, û bêhna min jî teng neke... Tu dê keleşê bînî, û tu dê dudiyar jî bînî" got. Dayika Hîvda ji nişkê ve bi acizbûn, tîrika hevîr ya di destê

xwe de li erdê da, ” tunneeee, tunneeeee tune” heta ji wê hat qêriya. Kero yê serok ceşş mîna marê kor fîzînek ji xwe deranî û tûşt Dayika Hîvdayê kir. ” Kuro ez dibêjim keleş ew devê xwe li hev dixê û dibêje tune”. Firîneke mîna ya hespan ji firnikên pozê Kero dihat. Dayika Hîvda, bi zorê ji erdê rabû. Dema ku bi çarîka xwe ya qetiyayî porê xwe yê spî vedişart, bi zordayîna taqimê di devê xwe de jî, xwosiya xwe daqurtand. Dema ku destê xwe yê bi pitikên qehweyî dagirtî mizdida, dît ku bavê zarokên wê, ji avdana bexçe tê; te got qey ji nava wê halet (kindirê tê-lîn) qetiya.

Bi dîtina cerdevanan çimên Remo lihevdû ketin. Porê wî yê spî ji tirsan ricifî. Toza tune ji şelwalê xwe dawîşand, bi şewqa xwe rûyê xwe bawêşînk kir. Bi dilûcan silav li wan kir. Kero çavê xwe yê tenê korikî kir û pîspîs kenîya; bi şeqlbazîya roviyan li dara Remo digeriya. Remoyê mîna lepekî bi lêdanê ew ji hevdûn re avêtin.

Li ber germê dengê pîrêya kêzik biliyabû. Dengê sirsirkên ku seranserî rojê ji guhan neketibû, nema dihat. Nîfirên dayika Hîvda û nalîna hurik ya Remo dihate bihîstin. Kero, ji kenan zikopişt dibû, ji wan re bi devê xwe yê lapûr dijûnên bi tirkî ku ew nû fêrbûbû dida. Ji erdê rahişt torbeyek naylon derbasî serê Remo kir, bi potîna xwe ya mezin pêl sînga wî kir. ” Hîvê !”, bi borînê got, ” heta sibe êvarê divê keleş hazir bin” got. Hîvdaya ku nalîna Remo dihate wê û perîşaniya wî bi çavên xwe didît, xwosiya xwe daqurtand, bi çeneya xwe ya bi pirç, bi dengê melûl ”Baş e” got. Dema ku Kero bi cerdevanên nûpêkerî dikirin herin, bi kenekî mekroh, ” Keya Hîvda, were temaşe bike! Zilamê te bi xwe de mîz kiriye. Te kurên xwe yê nû pişo (newêrek) û bûkên xwe yê nû xweşik şandine bajêr ne? Nebêje me ew jibîrakirine...” gotin, û li pey xwe ecacokek ji tozê hiştin û çûn.

Dayika Hîvda, serê zilamê xwe yê şil ku li erdê bê tevger razayî bû mizda. Li lêdana dilê wî guhdarî kir. Ew bi zorê kişand ber sîhê. Dema dît ku şahdamarê wî lêdide kêfa wê hat. Ji çalê dewlek av kişand, serê wî pê şil kir. Remo bi çavên xwe yê nû xav li pîreka xwe temaşe kir, du nuqit ji çavên wî tevî porê wî bûn. Wek ku ew razî be, veciniqî. Şiliya şelwalê xwe his kir, ji pîreka xwe şerm kir.

Got çip û rabû lê bi deverû ve çû erdê. Dayika Hîvda, bi dengê nerm û rehm, ”bisekine bi ku ve!” got. Bi berxwedanê hevdû himbêz kirin.

Ronahiya heyvê li hêwanê bi biriqîneke fetist dilerizî. Xişxişa pûşan tevî tiktika kêzikên şevê li dîwaran deng vedida û di şevê de mezin dibû. Zûrîna seyên bi xurî, pirtepirta leylekê ku bi perên xwe pêk dianî, te digot qey dixwaze germa bêbext ji hev belav bike.

Dayika Hîvda, bi nalîna Remo ”Av, av” şiyar bû. Bedena wê di nava êşeke hişk

de bû. Dema ku ji bo rabûnê qewet ji stunê distend, dilê wê bi wê şewitî. Ji wê hewa bi wexm ku li rûyê wê dixist nefesa xwe stand û da. Selewata xwe anî, li stêrkan temaşe kir. Dema ku av ji cêrê li ser nêrdewanê dadigirt, ji bêdengiya gund saw girt. Hîrhîra kenê Kero di guhên wê de olan vedida. Demekê Kero karkerê wan bû, nok diçinî, genim dikişand qeboyê: di ber paqijkirina çala wan re kilam digot. Kero, ji Hîvdayê pirr dipelikand. Niha ew şirikê hertiştê wan e...

Yadêya Hîvda, eniya cemidî ya Remo mizda. Dema ku zilamê wê bi gulpên hêdî av vedixwar, wê jî li heyva di zerikê de temaşe dikir. "Ne tu dibînî, tiştên di me de dikin?", bi pistînî got. Dûvre dûxana sergînan nêzîkî serê zilamê xwe kir û xwe dirêj kir. Di bin çepilê xwe re li dûr meyizand, roniyeye korikî ku ber bi gund ve nêzîk dibe, ber çavê wê ket. Yadêya Hîvda, wek ku sehkarên wê miribin bû. Bi bêhişmendî duayên bêrêkûpêk ji lêvên wê kilol dibûn. Dema fêmkir minîbûs e ya ku tê, bi dilxweşiyeye bitirs zindû bû. "Yên çiyê ne" got. Xwe berda hewşa bi xalên ronî tije. "Hûn bi xêr hatin" got. Dengên metalîk, eksên ronî şev dixwarin, sîh mezin dibûn. Dayika Hîvda, şerbikê avê anî, dema şerbik dest diguhert Rodî, nêzîkî dayê bû, "Kero tadeyek mezin li we kiriye," got. Teqimê diranê yadê tiktikî. Bi çavên bêxem li deşta Gumîşsuyê eştand. Rodî, hilmek kûr li cixareya xwe da, "Ew di kolika li kêleka çem de dimîne ne wisa?" got. Yadê, xwosiyaya xwe daqurtand, nexwest bibersivîne; dûvre bi mebesta "belê" serê xwe hejand. Dema minîbûs dûr diket, şeva tije nehînî dihiliye, hespên tewleyê dihîriyan. Dayika Hîvda derket hêwanê. Minîbûsa ku li qûntarê girik sekinîbû, dît. Berbangê avêtibû. Dengên li çiyê di nava guncaweke pisporane de bûn. Ber bi destpêka hêwanê ve meşiya. Darên bîyan yên li peravê çem bi awayekî rîtmîk dihejîyan. Destê xwe bi awayê silavê danî ser eniya xwe û sekinî. Dûvre dît ku mîna keriyên kuliyan ji gir derbas bûn.

Bi pembetiyeye zelal î biroqanî wek ku çûk bi hertiştî zanin çikçik dikirin. Hîvda hate ber serê Remo. Remo di xewa giran de bû. Lihêfa xwe avête ser xwe, çavên wî çûne ser hev. Bayê honik xîşîna zêrîn ya simbilên hişk hildigirt. Dilê dayê teng dibû, çavên wê diqermiçîn. Xwest rabe avê vexwe. Êşa di sermilkê wê yê çepê de li hemû bedena wê belav bû, te digot qey hûtekî herdû destên xwe kirine qirika wê da ku wê bê hewa bihêle. Ew bi dengên çekan ku gund dihejandin veciniqî, Remo hejand. Xwêdanek cemidî avêt eniya wê, wek ku dê devê wê tiştêkî bibêje nîvvebû, dengê dawî ku hate wê, dengê dîkê li ser sifderê bû. □

Wergera ji tirkî: **SERKAN BİRÜSK**



# Gaziyek ji qederê

## BÊWAR ÎBRAHÎM

**H**o... ho mîrê min! Taca serê min, ronahiya tîpên nivîsînên min, heyveke ronîdayî li reşahiya jiyana min... tu bi Xwedêkî mîrê min bibêje; Çima ev zîmanê me wiha şêrîn e? Çendî em ji bo wî kar û xebatê bikin, em qet nawestin, çendî ji bo wî êş û azarê bibînîn, taliyê daqurtînin axî n qet ji me dernakeve, her birînek ku di canê me de vedibe, şitlek nêrgiz li dewsa wê birînê vedibe û dirêj dibe, digihêje asîmanê bilind, gaziyan li ber Xwedê dike, hewar dike û dibêje; - Ey Xwedanê dilovan kurd jî zarokên Adem û Hawa ne, ew jî mirovên xwedî dîrok in, deyaxa wan ji çiyayan jî bi hêztir e, çima weha te piştî xwe daye wan, hema carekê bi tenê, ewrekî ji wê dilovanîya xwe bi ser wan ve biborîne...

Ho... ho... mîrê min!

Birî n ji cendekên me dibezin, çiko cîhê wan li hola van cendekan nema ye û ew dixwazin bi cîh û war bibin... lê çima kurd bi tenê mişext û sorgon in; rojekê stemkarî ji nav wan der neket, xwî n ji birînan ranewestiya, êstir ji kaniyên çavan ziwa nebûn, buxçikên revandinê ji ser milan venebûn...

Ho... ho... mîrê min!

Bibêje! Te çi veşartok di bîra "Qeder" ê de dît û te çavên me li wan veşartokan venekir, bibêje! Çima keçeke mîna min hate binkontrolkirin? Min çi guneh kiriye ku ez rewanbar bibim? Qey ku bi kurdî bixwînim, binivîsînim, bigrîm, bikenim... guneh e? an rêxxwarî ye? bibêje mîrê min! ku kesên wefadar û kurdperwer mîna: Kone Reş, Ferhad Îçmo û Seîd Yusif li nav me nebûna, hingê dê rewşa Bêwarên mîna

min çi ba? Çima wiha şerê me dibe? bê guman em jî ji xelkên vê cîhanê ne, em ne jî Cobîtor û Biloto ne..

Ho... ho... mîrê min!

Em ji tîpên "Hawar" a te hawar dikin û ji niha û ta sed çerxên ku werin emê bêjin; Çima alozî para me ye? birakujî hevalê me ye? berjewendî dûtî me ye? Çima darên zeytûnan li hemû cîhanê geş in, lê yên di xaka Kurdistanê de kizirî ne, şaxsikestî ne, bê av in herdem tî ne...?

Ho... ho ... mîrê min!

Ne pênivîsa ku te "Hawar" û "Ronahî" pê nivîsand periya kevokêka spî bû. Çima kevokên spî li ser xaniyê kurdan ranewestin? Qey nizane ku em yekemîn gel in ku me stran bi navê wê gotine? Qey li dengê "Tehsîn Taha" guhdar nabin dema stira-na ( ez kevok im lê...lê.. kevoka spî ... way .. way..) bi wî dengê xwe yê çiyayî distirê? Sed mixabin mîrê min.! Ta bi kevokan jî guhên xwe bi qîr û ziftê girtin da ku axîn û hawara me derbasî mejî û dilên wan nebin...; lê nexe mîrê min! wê dewsa her axînekê bibe awazêke bê dawî, hingê kesek nikare wan awazan rawestîne, çiko ew awaz wê ji kanîyên comerdên mîna te derkevin û kanîyên comerdan rojekê zi-wa nebûn û qet jî ziwa nebin...

Ho... ho... mîrê min!

Stirîyên bêbextî û stemkarîyê cendekên wefadaran anîn xwarê, erdhejiya ku li wijdanên paqij ket paqijî û beraet ji hev pejirand, dilên bi rûmet qelişand... wefadarî û hevaltî bûne mîna çenteyekî dîplomasi di destên dizên "Aristokrat" de ku tişteki nadizin ji bilî paqijîya di navbera hevalan de, kêf û şademaniya serdêmên zarokan, evîna dilên keç û xortan, wefadarîya welatperweran,.. lê malwêranî ew e ku dizên wiha ji malê bin, çiko pêşîyên me gotine; (ray li dizê malê nabe).

Mîrê min..!

Nizanim ez gilî û gazênên xwe bi te bikim an bi qederê bikim! lê xweş zanibe, tu û qeder du hêz in. Rojekê we cûdabûn nêzîkî xwe nekir... da ku hûn sermedî, û hebûnê bihêlin ji para xwe re. Erê mîrê min!

Îro em tev li ser şopa ronahiya wê sermediyê ne da ku em di nav pencên tarîyê de winda nebin û hewar û gaziyên me di nav dîwarên bêdengiyê de neyên qurquçandin... □

# Hehecîkên payevaniya te ne



**MERVANÊ KELEŞ**

*Ji bo F. Cewerî*

Darbesta şahiyê li hinavên we girêdan  
Halan Derwêşê Evdî bi rimên wê

bêoxiriya  
bayistana  
çirisî  
cerisandin!

Mîna ku ji jiyana Xwedayan hatibin:

Gilgamiş li baskê gayê Enkîdo

kirin ....!

viyana: gihaştin  
nemirên  
bi qîvarên  
taya zikreş  
meyandin  
xwîn, xwîna Mîtra

tîbûn û xweziyên laflafk û berberokan  
di xuya sor de gevizandin!  
vîna pîrozgehan  
efsane û hingulîskên serberdayî  
di nav kafristana gij de  
tar û mar kirin!

Guhdar be!

Pakrewaniya Qazî  
qewlikên pirtûkên Şêx Seîd  
Mishefa Reş  
Zendavesta serxweş  
kubariya Simkoyê Şikakê  
bixwebaweriya pêşmergakî  
tûtîn û berzûriyên Mele Selîm  
biyanvaniya Berzanî  
dînbûna ramana Xanî  
qimçikên elfabêya Celadet  
bê-cirya Bro Têlî  
serkeviriya Ekîd û Mezlûm  
dêmtenikiya Leyla  
rehwaniya çiya  
şînxweşiya awazên Bavê Felek  
qiçeğiça pevçûna goşt û ar  
li  
zindan  
û  
sînema Amûdê .....

serkeftin û têkçûn

û

mirina keftşiyar

T E V berbûyên te ne

rivîna kildana mijankên hatina

TE

NE

qelenê peyabûna te ne

gedayên lavlava te ne

de tê bi rûmeta Zerdşê kal kî

tê  
p  
e  
y  
a  
b e!

## PAYEVANÊ

ji xuşîna  
xeftan û hûçikên  
xwe  
diyar be  
ji reşgirêdana çavşînkana  
daweriv!  
ji dêrana sûtina  
kewkujînê  
bi bişkiv!

## PAYEVANÊ:

êdî ji niva cendekî  
derbe  
êdî ji sîka Homa û Soma  
pêjnê  
daned  
pozbilindê  
peyabe  
mizgîncivînê, oxirrevînê  
peyabe!  
lîska heftokan  
rawestîna  
babîsoka bawî  
bixapîn  
nexapîn!  
me kurtêlên nanê kîjan  
parseksêwiyana xwari bû  
ku wisa tu me  
perî bi p e r î  
biperitîne ???

Guhdar be:

em ji mêj ve hevbendên Xwedayên  
kevirkirî

ne!

**BIBHÎSE:**

em du zarok in  
cîrîdê bi stîriyên sincan re dikin  
tiliyên xwe yên wînda direvînin  
ji peqpeqokên bê  
ji arama devê!

bi hespê cejnê re  
ne gihan  
hûn ne gihan  
EW derbas bû  
deng bi me veda  
em ne gihan

**WELATO!**

çend ji demê wê here  
çiqas ji hilimdariya kehreman  
ji me re hiştin!  
emê ku bi tenha  
tike-tika  
demjimarek  
bê nimre  
û  
çax bûn!

**XWEDAYO!**

em çendî zarok BÛN  
Me nizanî bû em ji kê direvin  
û  
çima?

berê me li aso bû  
û em negihaştin

**WAX.....!**

em çendî ZAROK bûn  
em ser dîl-girtina tava heyvê pevdiketin  
digiriyên bo bikenin  
dikeniyên bo bigrîn

li paş me melûliya mûman  
û banga hêstirên çavên dê:

”werin emirqutino werin”

û me  
deng  
ne  
di  
kir

bê guh bûn em  
bê çav bûn em  
tevzînoka

xura

bê debar bûn EM

Peyv lîstgeha me bû  
me nêçîra kuliyan dikir  
bo ku bifroşin erebkoçeran  
dûv re me meşkên dew û nivîşkê wan bi  
gwîzanên bêîman teraş dikirin!  
incûr û şimamokên wan bi morîkên pîrasêr  
dinikilandin .... û ji

nişkê ve  
em  
difirriyan  
mîna  
minminîkin  
bêguneh!

yan me mirîşkên wan direvandin û davêtin  
valahiya gerdûnê

ew li ser stêrkên  
nîvro  
lîs dibûn  
li dû wan erebkoçer  
kerûgêj dibûn  
roklêgerayî dibûn!

Xwedayo:

em çendî zirz bûn  
me dafik ji her... her tiştî re vedida me nanê hişk ji alifê çêlekan didizî û davêt

ji masiyên çem re ji ber ku wan bi devên wan yên vekirî ku jîbilî li ser avê ne dihatin girtin em serwer dibûn... lê bi rastî nîza kê tinaziyên xwe bi kê dikir ???!  
zarok bûn em!

dema wê bê xwedîya salixdanê em vedizîn  
dema me şora kurd di devê xwe de birûanî:

gelo ez kurd im?  
çima ez kurd im?  
kurd... yanî çi?  
û hiş dibûn  
dil miç û sar dibû  
((tê serê me têxi belê )) !!!

lê em ji lîska sermedî  
nedibûn  
kurd bûn

Li hemmî bîr û golên Qamişloke digeriyan, me kuç davêtin wan ku ji kûr ve dengê li hev ketina vîzîna kuçan û pelqîna avê bibhîsin!  
em bi cewşenbaziya kitikan xwedî bûn! bi qewsikên xwe me çûk û çivîk qulqulî di kirin! me kevok basko di kirin ku kêfa me bi wan nefire! ta mîro ji me qidûmşikestî dibûn! Em zarok bûn birako dema ku şevê bi ser me de digirt me xwe dida qoziyên sikakan ku em dabaşa roja buhurî raxînin mîna şervanekî nû hatî ji cengekê: nîzane çim lê bû û çawa jê filitî ??

DAYÊ tê bîra te:

tê bîra te dayê çawa bidizî bê ku em xwe bişşon em dirêjî livîna xwe dibûn ji bo ku reşreşkên dadmendiya şevê di sîng xilmaşiya te de veneciniqe!  
bi hemmû barên rojê em radizan, dest pêka xewnan firîna ser cihanên ne dît bû bi armancên her ku em nêzîkî wan dibûn wendatir dibûn... xewê xwe dispart balgeha sibê .....

Heyranê dayê: BÊJE

..... elenda mey baskşikestî di kîjan çengelê fala serserî de  
.....xerbiqiye?  
wax dayê  
çendî .... çendî zarok in.....  
bêje dayê??

*Uppsala ji 940503 , ta 940520*



# Ewrê reş


FIRAT CEWERÎ

*Xwedê mêrkujên te ji partiya xwe avêtine; ew niha, di germa te-baxê de, li kuçe û kolanên bajarê te parsê dikin...*

Gava tu sibehê zû ji xew rabûbû ser xwe, canê te giran bû, Gher derê te diêşiya. Te di xewnê de du xortên kincspî dîtibû. Ew bi dostanî nêzîkî te bûbûn û paşê demançe ji ber xwe kişandibûn û bera te dabûn. Guleyên wan bi nermî di laşê te re derbas bûbûn. Ne êş, lê te xweşiyek hîs kiribû, loma tu bi wan re beşîfî bû. Wan dîsa bera te dabûn. Tu dîsa bi wan re beşîfî bû. Ew lerizîbûn, lê tu bi wan re keniyabû. Wan ji tirsan demançeyên xwe avêtibûn û bazdabûn. Te bi dû wan de nêrîbû û te bi ken serê xwe vir de û wê de hejandibû. Dû re laşê te sivik bûbû. Gava te li xwe nêrîbû te cawekî spî mîna yên heciyan li xwe dîtibû. Û tu hêdîka bi laşê xwe yê sivik bi hewa ketibûyî. Tu bilind bûbû, tu bi ser ewrên spî ketibûyî. Lê ji nişka ve mîna baskên te bişikên, tu ji jor de ketibû erdê. Û tu bi wê ketinê şiyar bûbû. Gava tu şiyar bûbû, te tavlê li saeta xwe nêrîbû. Saet heftê sibehê bû. Diviyabû tu saet heft û nîvan li dikana xwe bûya. Te hê tesîra xewnê ji ser xwe neavêtibû. Te demekê bi ax û wax xwe di nava nivînan de biribû vî

alî û wî alî. Te êşeke mîna ku tu ji ser xaniyekê ketibî his dikir. Her derên te diêşiya. Jina te ya bi halkê çavlixew derengbûna rojê di bîra te de anîbû, xwestibû tu rabî ser xwe û herî dikanê. Te jî pê dizanîbû, dereng bû, lê mîna ku tu bi doşekê ve hatibûyî zemqirin, tu nikarîbû rabûya ser xwe. Gava dengê pîra diya te ji hewşê hatibû, tu hingî ji nava nivînan pekiyabû. Hêzek hatibû te. Tu pêşî bi ser dergûşa keçika xwe de xwar bûbû û te ew maçî kiribû. Keçika biçûk ya di pêçekê de bi maçîkirina te xwe biribû û anîbû û şiyar bûbû. Çer ku ew şiyar bûbû jî ew bi te re keniyabû. Paşê giriyabû. Lê diviyabû tu zû biçûya dikanê. Tu dereng mabû. Wextê te tunebû ku tu mîna her sibeh bi keçika xwe şa bibûya. Tu derbasî mitfaxe bûbû. Te ji selika nên pariyek nan jêkiribû û ji sarincê seriyek penîr derxistibû. Te hema li ser lîngan ew avêtibûn devê xwe. Jina te xwestibû ji te re taştê çêbike, lê ji ber derengmayînê te nexwestibû. Te li hewşê bi hêdîka destê xwe li piştê diya xwe ya ku hewş dimalişt, xistibû û tu di derî re derketibû.

Gava tu gihîştibû ber dikana xwe, du mişterî li ber derî li benda te rawestiyabûn. Ew mişteriyên te yên hertim bûn. Êdî hûn bûbûn dost. We bi hev re çayê vedixwar û sohbet dikir. We li ber deriyê dikanê henek bi hev kiribûn, te bi henekan kulmek hêdîka li zikê yekî ji wan xistibû. Wî jî mîna ku pir êşiyabe destê xwe avêtibû zikê xwe. Yê din ku simbêlreş û cênîkspî bû, bi henekan gotibû ku tu sibehan zû naxwazî ji hembêza Fatima Muxribî derkevî. Hûn keniyabûn. Te bi devkenî dikan vekiribû û hûn bi hev re derbasî hundir bûbûn. Te ji wan re kursî derxistibûn ber siya dikanê. Te xwestibû ew rûnên, lê ew bi lez bûn, wan du teneke boyaxa spî û firçeyek ji te kiribûn û çûbûn. Tu jî bi cihkirina firaxan mijûl bûbûyî. Dikana te ya biçûk her ku diçû mezintir dibû, firaxên te zêdetir bûbûn, mişteriyên te pirtir bûbûn. Bi tenê deynekî te mabû, te ew jî bidaya, bi gotina te rewşa te baş dibû. Te biçûkî pir feqîrî dîtibû, lê te nedixwest zarokên te jî wê feqîriyê bibînin. Tam gava tu li keçika xwe ya biçûk fikirîbû û te di serê xwe de zarokên din ku wê çêbibûna bi gewde kiribûn, li zen-



Wêne: George Segel. Bowery, 1970

gilê telefona te ketibû. Ya ku telefon kir jina te bû. Ji te re digot ku te demança xwe ji bîr kiriye. Te jî guh nedabûyê, te gotibû ma wê kî min bikuje? Bi rastî malbata te jî bawer nedikirin ku wê kes te bikujin. Te bi zimanê xwe dikarîbû, te li her derê her tişt nedigot, te kes jî neêşandibû. "Îro tişt tune ye" te ji jina xwe re gotibû û te pêwîstiya demançê nedîtibû. Paşê wê ji te ji bo keçikê cotek gore xwestibû û ji bo şivê bi te şewirîbû. Te şorebeyek nîskê û pelên dagirtî xwestibû. Lê te bîra ku tu ê wê şivê nexwî nebiribû. Mîna ku haya te ji xezeba ku bi ser bajêr de girtibû tunebû. Bajar bûbû mîna daristaneke ku nêçîrvan lê li nêçîra xwe digeriyen. Li serê her kuçê, li ber her dikanê, li pişt her mizgeftê, li dibistanê, nêçîrvan digihîştin nêçîra xwe. Nêçîrên ku hê bi miradê xwe şa nebûbûn. Ya rebî, ev çi ewrê reş bû ku bajarê te rapêçabû. Ev çi ewrê reş bû ku reşahî xistibû dilê bajariyên te? Ji ewrê reş dilopên jehrê bi ser bajarê te de dibariyan. Di tîrêjên rojê de awirên mêrkujan diyar dibû. Keçên bajarê te yên bi stûyê Nefer Tîrî û bi spehîriya Afrodîtê çilmisibûn, ji bo lixwekirina kurtekirasekî, qebhet bi ser wan de dihat, tu bi cezayê qebhetê yê li welatê xwe dizanî! Lê haya te ji herdu xortên ku ji do de li pey te bûn, tunebû. Gava te di germa tebaxê de kursiya xwe derxistibû ber derî, hingî çavên te li herdu xortikan ketibû. Wan firsend nedabûn te, her yekî demançeyek ji ber xwe derxistibû û bi xedarî bera te dabûn. Tu ji ser kursiyê gindirîbû erdê û te xwestibû tu xwe bi çarpiyan biavêjî hundirê dikanê. Lê wan ji pişt ve jî bera te dabûn. Tu li erdê perpitî bû, te destên xwe avêtibûn tenekeyên boyaxê yên li ber derî, lê wan jî alîkariya te nekiribûn, bi ser te de hatibûn xwarê. Tu di nava xwîné de mabûyî, te bi wê rewşê bi stûxwarî li mêrkujên xwe nêrîbû û gava tu bi wan re beşîş bû, wan ji tirsan baz dabûn. Paşê, laşê te sivik bûbû. Gava te li xwe nêrîbû, te cawekî spî mîna yên heciyan li xwe dîtibû. Û tu hêdîka bi laşê xwe yê sivik bi hewa ketibûyî. □



**SILÊMAN DEMIR**

Çar roj bi ser çûna Hesen ketin. Çavên Sara Çher li rêya wî bûn, destê wê di dilê wê de bû. Serê nîvsaetê carekê derdiket û li rê dinerî. Roja pêncan, ber êvarê, tavi lê dît ku Hesen di rêya ku tê re çûbû re, tê malê. Xiroşê û xweşiyê bi hev re girtin dora dilê wê. Gazî zarokan kir, mizginiya

ku bavê wan dihat da wan. Hersêyan hîna li hundur qîrînên dilgeşiya ji bo hatina wî dan. Li ber deriyê hewşê bi lez di Sara derbas bûn û çûn pêşiya wî. Sara giha hinekî tenê here pêrgî wî ve. Hesen, zarok hemû bi dilovanî û dorê maçî kirin û bi ken û kefxweşî got "ha ji we re şekirê we... de herin hundur û bixwin, lê tu pevçûnê nekin":

Hesen têra zarokan şekir ji wan re anîbû. Jê memnûn bûn, bi şekir dilgeş bûn. Dan dû hev û bi lez çûn hundur.

Hesen ji nişkê ve dît ku li ber deriyê hewşê bi Sara re tenê maye. Sara li ba wî hêsirên xwe yên ji ber kefxweşiya hatina wî û tirsaxetera kamax zuwa dikirin. Hesen ew bi dilovanî û ji dil maçî kir, hêsirên wê bi tiliya xwe ya girdê zuwa kirin, ew hişk himbêz kir û dîsa maçî kir.

Sara bi wan kirinên wî kefxweş bû, lê wê bîstikê bi xwe, xebereke xweş jî bi qasî maçîkirin û himbêzkirinan dixwest. Lê xwe dîsa li bendî ku Hesen ji ber xwe ve bi-

bêje, girt.

Hesen destê xwe bi dilovanî li newqa wê pêça, berê wê da malê û pêşî li hal û wextê wê û zarokan pirsî. Wilo çûn heta ser dika ber derî û li ser du kursiyan rûniştin. Roja êvarê dabû wir, xweş kiribû. Xweşî diket dewsa westana di bedena Hesen de. Pirsên sivik dikirin û dixwest bizanibe bê ma gava ne li malê bû halê wan çî hal bû. Lê Sara mecala pirsê a pêşî girt û navbir da wî babetê ştexaliyê.

Sara got:

"Te çî bihîst gidî?"

Hesen got:

"Bêhêvî ye Sara can. Heta niha hew ez tenê nehatime girtin. Wê bên min jî bibin. Her rojê, her saetê karin bên min bibin" û li ber xwe nerî.

Keserek kişand. Piştî bîstikekê, îcar got "divê em zû ji van deveran herin Sara. Em ê herin Iraqê. Em ê herin ba merevên min. A herî baş çûna wir e".

Sara behîfî got "Iraqê? Çawa? Ma tu bawer î ku wê li wir cîhek bi destê me bikeve? Ma gelo tu rê ji çûna Iraqê vê pê ve tune ne? Ma gelo em nikarin tişteki din ji xwe re bikin?"

Hesen got "ez fikirîm û min xwest ez rêyeke din peyde bikim. Lê mixabin tu tişteki baştir nayê bîra min. Em herin ku, ew ê bên min. Wir herî baş e. Tişteki bi me neyê. Em ê heq ji xwe derbikevin".

Hesen li çavên Sara dinerî. Êdî deng ji Sara çênedibû. Nivbehîfî û ecêbmayî bûbû. Piştî piçek bêdengiyê, Hesen pirsî, "ma gelo pêşniyareke te ya baştir heye?"

Sara bêdeng lê nerî. Tu tişteki ku bigota, tu bersiveke ku bida, tune bû. Hesen gotibû û jê pê ve tu rêyên din jî tune bûn. Di wî derî bi xwe de û ji ber xezebeke wilo, tu rêyên revê ên din tune bûn. Mala bavê di devereke fikra wê de piçekî hatin bîra wê, lê zû ji bîra wê çûn. Sara piştî bîstikekê got "na Hesen. Xuya ye ku ew rê tenê li ber me heye. Lê ez dîsa jî bi şik im Hesen. Em ê çawa bikin? Em ê li Iraqê çî bikin? Em ê xwe çawa xwedî bikin?"

Hesen got "rast e. Xebera te ye. Lê... lê min hin pere ji birayên xwe deyn kirin. Em ê mîhên xwe jî bifiroşin. Em ê demeke baş dirêj xwe bi wan xwedî bikin. Em ê bi dû re, li wir rêyeke xwe xwedîkirinê peyde bikin. Bawer be em ê peyde bikin".

"Baş e, bila wilo be. Lê ma kengî û çawa?"

"Em çiqaştî zû herin, baştir e. Ez dizanim ku ew ê ne dereng bên min bibin. Wê bên vir. Ez nikarim li vir li bendî wan bimînim. Mana min a li vir dînitî ye. Divê ez herim. Divê ez dîsa herim. Ez ê îcarê herim gund ba mala birayên xwe. Min bihîst ku hin diçin Iraqê. Ez ê herim baştir bipirsim û rêyekê eseh bikim. Tu jî hema

bi dû min re dest pê bik, xwe kar bik û were wir. Ez ê li vir ji gundiyan re bibêjim da ku bên alîkariya te bikin. Ez ê bikim ku malê bar bikin û bînin gund ba mala birayê min. Nekeve tirs û mereqên mezin Sara. Zarokan netirsîne. Em ê heq ji vê yekê jî derbikevin”.

Sara serê xwe hejand û jê re eşkere kir ku bi gotin û baweriya wî re ye. Wilo di wê yekê de li hevdu kirin. Wê wilo bikirana.

Li gora ku Hesên di wê tirsê mezin a girtinê de bû jî, wê êvarê dîsa li malê ma. Dixwest bimîne. Dixwest xweşiyên şevê bi Sara re par ve bike. Bi kêfxweşî ma. Lê sibehê zû rabû û xwe dîsa ji çûnê re kar kir. Dîsa pêşî wek cara din taştê bi malbatê re xwar. Qet nedixwest bê taştê here. Bi dû re îcar dîsa rabû ser xwe, ji ên biçûk dest pê kir û ew bi dorê maçî kirin. Piştî wan, çû Azad di dergûşê de maçî kir û derket. Sara da dû wî. Hesên ew li ber deriyê derve, himbêz kir û maçî kir. Ew dîsa û dîsa maçî kir. Û ew cara dawî tembî kir da ku bêhna xwe fireh bike û qewîn be.

Sara got ”de baş e, de here îcar” û hêsirên xwe zuwa kirin.

Hesên dîsa çû. Çûneke ku soza vegeza wê ne dabû wê bû. Wê Hesên careke din nema vegeziya. Wilo li hev kiribûn. Gava Sara bi van ramanan bi dû wî de lê dine-rî, tirs û saweke nenas diket nava wê. Baraneke hûrik a bêrawest dihat, lê Hesên dîsa jî berê xwe da ser rêya nav çiyên çû.

Zarok jî derketibûn ber derî. Wê carê, wek ku di tiştinan derxistibin, bi xişûş ketibin bûn. Di nav hinek tirs û xiroşê de, destên xwe jê re hejandin û gotin ”dîsa zû were baba, dîsa zû were baba” û bêdeng û bêlebat rawestiyan. Wê carê tembiya şekir lê nekirin.

Hesên got ”ez ê dîsa zû bêm, ez ê zû bêm, ya jî belkî hûn bên... lê hûn jî sozê bidin min ku hûnê dilê dêya xwe nehêlin û bi a wê bikin.” û destê xwe ji wan re hejand û piştî xwe da wan.

Sara li ezmên û li baranê nerî û bi dû wî de bang kir: ”sozê bide min Hesên: sozê bide min ku hema gava te nû tê derxist te sar e, tu dê herî di şkeftekê kevî û agirekî ji xwe re bikî. Sozê bide min Hesên”.

”Ez sozê didim te Sara, gava min tê derxist ku min sar e, ez ê herim di şkeftekê kevî û agirekî bikim. Soz. Mereqan nexwe. Ez rica dikim tu dê mereqan nexwî”.

Sara destê xwe jê re hejand û got ”baş e, baş e... ez ê qewîn bim”. Gava destê xwe daxist, di ser çavên xwe re daxist û hêsirên xwe zuwa kirin.

Bi dû wî de dinerî. Dinya baş sar bû. Zarok zû çûn hundur. Lê heta ku Hesên di nav sermê û baranê de, hêdî hêdî ji ber çavên wê wenda bû û çû, wê li ber deriyê hewşê lê nerî.

Sara li wir bi tirs û taswasan re tenê mabû. Ramanan ew birin û anîn. Kereh bûn. Gelo wê dîsa hevdu bidîtina. Gava Sara ew pirs ji xwe dikir, şikên kereh diktin dilê wê û nikarîbû tu garantî bidana xwe. Ên ku Hesên xwe ji ber wan dida alî, xurt bûn, zalim bûn û li hemû deveran hebûn.

Îcarê Sara li malê tenê ma. Xwe wek jinbiyekê bêsiûd didît. Lê soza ku wê qewîn bê, dabû Hesên. Dixwest soza xwe bîne çê.

Piştî çûna Hesên, îcarê dora kirina karên ku tê de li hevdu kiribûn bû. Divabû îcar wê jî xwe kar bikira. Hema wê rojê bi xwe Sara dest pê kir û mal da ser hevdu.

Piştî hefteyekê, muxtarê gund, mal û Sara û zarok li traktora xwe siwar kirin û ew birin gundê birayên Hesên. Li gora xebera ku Hesên şandibû, divabû derengtir nemana.

Wê êvarê li wir man. Êvara piştî wê jî, birayê Hesên ê biçûk ew birin gundekî nêzîkî hidûdê Iraqê. Hesên li wir li bendî wan bû. Ew ê wê êvarê bi xwe di çemê Hîzil re derbasî Iraqê bûbûna. Hesên xeber wilo ji wan re şandibû. Çûna wan a jî gund, mecala derbasbûnê û xebera ku Hesên şandibû, xweş li hev rast hatibûn. Karên wan û pîlanê wan heta wî çaxî xweş dimeşyan.

\* \* \*

Gava gihan gundê ku Hesên lê bû, roj hîna qamekê bilind bû. Textî li ber deriyê hewşê sekinî. Hesên û mazûvanê xwe derketin pêrgî wan û xêrhatin li wir dan wan. Hesên û zarokan xwe zû avêtin hevdu û hevdu maçî kirin. Wî û Sara bi beşîşîn û awiran dilovanî, hesret û hezkirin pêşkêşî hev kirin. Bi dû re Hesên dîsa vegeriya oda zilaman, lê Sara û zarok bi kevaniya malê re çûn aliyê malê û şiv bi wan re xwarin. Çaya piştî şivê jî vexwarin.

Gava îcar dinya ker bû, Hesên û malbata xwe ketin rê û berê xwe dan hêla çemê Hîzil. Ew, bêyî tu pir û tu peymanan, qonaxeke li pêş li bendî wan bû.

Şeva wan, li gora şevên wextê salê, şeveke sar bû. Lê wext û şev ji bo derbasbûnê rast bûn. Pêşî reş bû û bi dû re jî dibû hîvruhnî. Wê eskerên nobedar di reşayê de derbas bikirana û çem jî hema berî hîvruhniyê.

Wilo gelekî baş bû. Wê meşa dirêj a li Iraqê, çaxê hîvruhnî bû xweş bikirana. Ew şeva ku bi wan taybetiyan bû, bi zanebûn hîlbijartibûn. Hesên û ên ku alîkarî pê kribûn, ji ber wilo ecele kiribûn.

Ji bo ku Azad bi rê de raze û negirî, Sara bi rojê pê de qet nehiştibû ku ew raze. Ew her digiriya, dixwest ku raze, lê Sara ew şiyar dikir û nedihîşt ku raze. Giriya wê ji ber bêxewbûnê, agir bi kezeba Sara dixist, lê wê dîsa jî nedihîşt ku raze. Ji ber



ku a rast, dîsa jî ew kirina wê bû. Divabû bi rê de, bi rêya di nav kozik û kemînên eskeran de, negiriya. Hesen û Sara ji zarokên din re gotin ku ew ê biçin Iraqê û rêya wan di ber eskeran re derbas dibe. Ji ber wilo jî, heta ku babo bibêje em xelas bûne, divê ew bêdeng bin. Divê bi rê de dengê xwe qet dernexin. Hemûyan serê xwe hejandin û dan xuyakirin ku ew ê wilo bikin. Bi wê bazarê derketin rê.

Hesen rê û dever xweş nas dikirin, lê dîsa jî bo ku ji ber xeletiyêke biçûk, bi serê ve neçin ser kozik û kemînên eskeran, yekî ku rêya revên wilo baştir nas dikir, bi wan re çû û rêberê ji wan re kir. Lawê mazûvanê wan bû. Wî tenê bi esehî zanîbû bê esker li ku vediketin û diman. Wî gelek caran xelk biribûn ber çem û ji wir anîbûn. Bûbû rêberêkî jîr. Ew pêşî diçû û malbatê jî dida dî wî. Geh dimeşiyên û geh jî di nav dar û deviyên de rûdiniştin, diponijîn û hinekî li rewşê guhdarî dikirin. Divabû û dixwestin bizanibin bê ma tu guhertin di cîh û kozikên eskeran de bûne, ya na.

Hesen, Azadê biçûk kiribû ber himbêza xwe û kêsek jî avêtibû nav milê xwe. Sara jî bi destê herdu keçikên biçûk girtibû û kêsekî wek ê Hesen avêtibû nav milên xwe. Nêrgîzê bi wan re dimeşiya, wê karîbû. Û rahiştibû kêsekî biçûk jî.

Meşa wan, meşeke sext û bi hêdî bû. Lê a soxî wilo çûn heta ber çem. Zarokan hinek zahmetiyên ku berê tu caran nedîtibûn kişandin; geh ketin, geh likumîn, lê dîsa jî tu dengên ku belan ji wan re bînin, ji xwe dernexistin.

Îcarê li ber çem bûn, xwe di nav diriyan de veşartibûn. Rêya pêşî wilo bi ewlehî çûbûn. Tirsax xetera herî mezin ew hêdî hêdî berdan. Man li bendî îcar jê û pê ve. Li gora ku ji wan re hatibû gotin, ew jî hêsan bû.

Li gora lihevdukirinê, wê kelek li cîhekî ji wan deran di nav dirî û bîhikan de li bendî wan bûya, ya jî heger ku ne li wir bûya, ew ê bi dî re illehî bihata wir. Li gora peymanê, wê hevdu bi fikandîneke tenê a nizm, peyde bikirana.

Hesen dengêkî nizm fikand. Lê fikandina wî bêbersiv ma. Hesen hinekî li dora xwe nerî, der û dor bi çavan û texmînê pîva. Cîh rast bû. Rêberê wan jî got "rast e, cîh, vir e. Lê berî ku hîv derbikeve, divê ez bi xwe vegerim malê. Ya na ez ê ji eskeran re bibim nîşangeh, ez ê sax venegerim malê".

Rêberê wan li ser vê yekê rabû vegeriya malê û Hesen û malbata xwe jî li wir man. Mana wan, maneke gelekî bi xeter bû, lê tu rêyeke din jî li ber wan tune bû. Li gora xebera ku ji Iraqê wan re hatibû şandin, mirin ne tê de, lê çî yê din bûbaya bila bûba, wê kelek bihata pêrgî wan. Hesen bi wê sozê ewle bû. Ji Sara re ew yek wilo got. Û got heta ku ew bikaribin bêdengiyê biparêzin, ew di ewlehiyê de ne. Hinek hêsanî wilo da wê û ji bo fikandîneke din, hinekî man.

Li der û dora xwe û jora xwe nerîn û man. Dengê hin kêzik û teyrikan di ber ê avê re dihat bihîstin. Ê kundekî ji zinêr dihat. Çiya ber bi ezmên ve, bi saw bilind dibû. Ezman çik sayî bû, bi stêrikan xweş xemilî bû. Dora serê wî, bi şemala hîvê rengêkî zîvînî girtibû.

Qederê çixarakê wilo bêdeng man û nerîn. Hesen ji nû ve dîsa fikand. Lê dîsa tu kesan bersiv neda fikandina wî. Dîsa bêdeng man. Ew û Sara herdu hinekî bûn bi taswas, lê diviyabû heta ku hinek bihatina, ew li wir bimana.

Wî çaxî Sara, Azadê biçûk ji Hesen stend. Xwest ku li ba wê be. Sara ewle bû ku Azad di himbêza wê de xweştir radize. Ewle bû ku himbêza wê nermtir û germtir e. Xwest ku cihê wî xweştir bike. Hesen jî bi eshî zanîbû ku Sara, wî ji ber wilo jê dixwaze. Lê tu tiştekî wî li dijî wê helwesta wê tune bû. Xebera wê bû.

Hinekî wilo jî bêdeng man. Qederê çixareke din man. Îcarê dicemidîn. Heçî Azad bû, ew bê xew bû û bi beraniyekê qalind baş hatibû pêçan, ew xweş radiza, lê herdu keçikên biçûk kelogirî dibûn û gazin ji sermê dikirin. Guhê Hesen li ser pêjin û dengê fikandinekê bû.

Lê bala Sara bi xwe, bi qasî ku li ser pêjin û fikandinê bû, wilqasî li ser zarokan jî bû. Sara bi pispistekte bi dilovanî ji nû ve dîsa anî bîra wan ku eskerên tirkên li wan nêzîkan hene û divê dengê xwe qet dernexin. Ji wan re got, heger ku dengê giriyê hin zarokan biçûya eskeran, wê bihatana û hemû bibirana. Îcar a baştirîn ku di himbêza bavo kevin û dengê xwe dernexin. Hesen li ser gotina wê, ew ber bi xwe ve kişandin, ew kirin himbêza xwe, bin qapûtê xwe û çepilên xwe li wan pêçan. Sara, bêdengî, bi alîkariya Hesen wilo dîsa ava kir. Hew dengê ava çem tenê dihat.

Ruhnîya hîvê xwe hêdî hêdî berdida ser der û dorê. Wê hinekî derengtir bida ser wan û çem bi xwe jî. Çiya diket ber wan, ser wan dikir sî. Lê çem karîbû di reşê de jî bi hemû hêza xwe biherikiya. Ji ber wilo jî xuşîneke gefok lê ketibû. Dengê xwe bi ser ê hemû tiştan dixist.

Bala Sara çû ser û lê nerî. Saw ji dengê çem ket dilê wê. Çem bi awira xwe pîva. Hukmê avêtina kevirekî bû. Aliyê din Iraq bû. Lê ew hukmê wilo hindik, tije xeter û saw bû, tije tehdît bû. Hat bîra wê ku li bendî ku ew û zarokên xwe û mêrê xwe, xwe biavêjin nav wan xeteran in.

Tirseke pir mezin, ji ber wê yekê nediket nava wê, lê dîsa jî nedixwest ew wextê hanê bê. Zû tê derdixist ku mana wan a li wir bi xwe, jê ne hindiktir bi xeter e. Lê bêgavên manê û derbasbûna di çem re bûn. Gava Sara di nav wan fikir û gumanan de bû, ji nişkê ve dengê fikandinekê ket guhê wê. Hesen jî bihîstibû û zû bersiv da. Dengê fikandinê careke din jî hat. Wî çaxî Hesen tê gihîşt bê ji ku tê. Hinekî di ser

wan re bû.

Hesen got "de ka îcarê hêdîka rabin ser xwe, rabin em herin wir". Malbat rabû ser xwe. Hesen ew bêdeng û hêdî hêdî birin wir. Bi rehetî çûn. Ji xwe nêzik bû. Li wir, dîtî ku xortekî girs, bi qewet û simbêlmezî di kelekekê de li bendî wan e. Ê ku li Iraqê bi merevên Hesen re bazar kiribû ku wê wan daxê Iraqê bû. Xwe bi navê Mistefa da naskirin.

Pîştî ku xwe wilo bi kurtî bi navê xwe da naskirin, got "de fermo, siwar bin... lê zû û

bêdeng. Zû berî ku hîv bilind bibe û ew jêra çem bibe ruhnî. Tirsê min ji wê tîsê ye ku wê çem me bibe heta wir. Av gelek e. Gelek baran hatiye".

Devera ku Mistefê behs dikir, dor sêsed metroyekî dûr hebû û bi qasî ku xuya dikir, dor deh-pazdeh metroyan jî di binya wan re bû. Çem çawa dadiket, çilo diherikî wir, ne kifş bû. Lê li devereke berî wir, dengê gumîna çem bi awayekî din dihat. Sara û Hesen bîstikeke kin li wir nerîn, guhdarî kirin û zû dîsa berê xwe ji wir guhertin. Wext li wan dereng bû.

Sara, pêşî tu maneyên xerab nedan gotinên Mistefê yê di derheqa çem û avê de. Lê wan gotinan, dîsa jî zû hêza çem a rast anî bîra wê. Li Hesen nerî û ji xwe re got "tu tişteke nabe, bi qeweta xwedê tu tişteke nabe... min bihîstiye ku gelek wilo derbas bûne... tu tişteke nebûye, min nebihîstiye..."

Sara pêşî ket kelekê. Li çem nerî. Aveke pir, xurt û malmîrat bû. Gava nigên wê ji erdê qut bûn, ji nû ve terqîn ji dilê wê hat. Sara li kelekê nerî. Bi destan saxtî kir.



Grafik: Serhad Bapir

Ew jî ne tu kelek bû. Sawê girt bedena wê. Heger gengaz bûya, wê vegeer pêşniyarî Hesên bikira. Lê êdî dereng bû. Biryar, çûn bû. Ji ber wilo jî bêdeng û zû, zarok yeko yeko ji destê Hesên girtin. Erê rêberê wan ji wan re gotibû ku esker wî çaxî di xewê de ne û li dûr mane, erê zanîbûn ku gotina wî rast bû, lê dîsa jî li wan dereng bû. Heger ku bihatina dîtîn, tu mecala wan a ku bikarîbana xwe xelas bikirana, tune bû. Here were demançak bi Hesên re hebû. Wê demança wî li dijî gawirên ti-vingên automat ên eskeran, bi kêrî tu tişteki nehatiba.

Ew tiştê ku jê re kelek dihat gotin, ew tiştê ku wê pê derbasî aliyê çem ê din bi- bûna, bi Sara ecêb hatibû, pê bêhêvî bûbû. Bi dîtina wê re, tirsî ku ketibû nava wê, zû mezintir bû. Pir ewle xuya nedikir. Wê tişteki ji wilo baştir hevî dikir. Tavilê dest pê kir û bi destan xwest bi esêhî bizanibe bê ka ew çi ye.

Li gora ku Sara jê fam kir, ji hemû tiştan bêtir dişibiya lastîka hundurê tekerekî traktorê û cilîkek bi nava wê ve hatibû dirûtin, ya jî girêdan. Wî cilîkî, ne ku av jî bernedida hundurê wê. Ji xwe qiyameteke av tê de hebû. Tiştê ku xuya dikir, ew cilîk, hew ji bo ku mirov jê de neketa nav avê bû.

Ew yek baş bû. Lê... Lê dîsa jî xuşîn û birîna çem a zalim ew her ditirsand. Wek ku bêrawest ew bi birîna zarokên wê, a mêrê û a wê bi xwe, tehdît dikir. Ew bi he- ter tehdît dikir. Gava ku Sara lê guhdarî dikir, jê fam dikir, jê re wilo digot. Wek ku bi gotinên pir eşkere ew yek jê re digot. Wê bi xwe, wilo jê fam dikir. Çemê za- lim her wilo jê re digot. Lê, Sara dîsa ne dixwest jê bawer bike. Dixwest xwe li ber bigire. Nedixwest wilo bi hêsanî bê tirsandin û jê bawer bike.

Sara bi Hesên bawer bû, ew li ba wê bû. Lê nerî, zû xwest wî bibîne. Hesên li wir bû. Wek çiyayekî li hemberî wê jê re sekinî bû. Ew besî wê bû. Ew ê ku mêrê wê bû û wilo jê hez dikir, ew ê ku wilo dilovan û navmîlpahn bû, ew ê ku bi zend û bendên mêran bû, ew ê ku bi soz û bext bû, ew ê ku egîtê wê û xwedayê wê bû, li wir bû. Gava ew li wir bûya, wê tu tişteki nikarîbûya li ba wî bibûya. Heger ew bi xwe teslîm nebûya û ji wî re sextir nekiriba, jê re hinekî hêsanî bikira, wê tu tişteki nebûya. Sara wilo bawer bû û ji ber wilo jî xwe zû ji hemû tirs û şikên herî kamax azad kir. Lê gava ku kelekê ne bi awayekî pir ewle dest bi hejê kir, Sara, Azad, dîsa di himbêza xwe de hinekî hişkî girt û destê keçîka biçûkê rastê zeft kir. Li gora ku li hevdu kiribûn, wê çavên Hesên jî li ên din bûya. Lê dîsa jî jê re got "zarokan baş zeft bike Hesên".

Hesên got "baş e Sara can, ez ê wan bigirim, bila îşev dilê te safî be" û bi destê herdu keçîkan girt. Lerza tirsî ku ketibû dengê Sara, tirsî ku nava Hesên bi xwe jî. Hesên li çem nerî. Er ê Hîzil bû, lê êdî mîrato qet nema Hîzil bû, êdî Amazon bû.

Fireh bûbû, bilind bûbû û har bûbû. Ava wî bi xuşîn di ser hev re diqulipt. Xumîn û gumîneke wek a aşan lê ketibû. Tirs, bû ricf û di bedena wî de geriya. Lê tirsaxwe qet neda xuyakirin.

Sara li dawiya kelekê rûniştibû. Asas tu dawî mawiya wê tune bû. Lê li gora rûniştina Mistefê û çûna kelekê, cîhê wê li dawiyê bû. Wilo baş bû. Wilo hemû tişt di bin kontrola wê de bûn û li ber çavên wê bûn. Nerî, ew hejmartin, hemû li ba wê bûn. Temam bûn. Ji çûnê re amade bûn.

Û êdî Mistefê kelek hêdî hêdî ber bi nava çem de bir. Ew bi bêrika xwe, xweş dibir. Gava Sara dît ku Mistefê wê wilo xweş dibe, hinek hêsanî û ewlehî ket dilê wê. Tu xeteran di çûna wê de xuya nedikirin. Tirs û şik bêmane bûn. Mistefê got "sexrî, hew heta ku mirov kelekê bibe nivê çem ê din e. Hew nivê çem tenê hinekî bi xeter e. Çem li wir xurt diherike, lê ez ê heq jê derbikevim. Bes hûn zarokan baş bigirin, wekî din hêsan e".

Hesen dîsa jî ji zarokan re got ku divê di nivê kelekê de, di nav avê de rûnin û xwe bi çîmên wî bigirin. Sara gotina wî dubere kir û zarok wilo bi cîh kirin. Ew bi xwe jî daket di nav avê de rûnişt.

Hesen ji Mistefê pirsî bê ma berê jî xelk bi wî awayî derbas kiribûn. Mistefê, bi awayekî gelekî lixweamin got "bi kêmasî sed çarokan kek Hesen... ez bavê Salar im, qet netirsin".

Gotina wî hinek hêsanîya din di derheqa wî tiştê kamax ku dikarîbû bibûya de, da Hesen û Sara. Lê tam wî çaxî bi xwe, îcar kelek xurt herikî ber bi jêr ve. Herikî û xurt çû. Mirov îcar xweş di hêza xurtbûna çem derdixist. Kelek li ser avê bû wek pelekî daran. Mirov didît ku êdî Mistefê bi bêrika xwe xurttir dixebitî. Mirov didît ku êdî bêrikê tu feyde jî nedikir. Êdî kelekê serî jê stendibû û ji xwe re diçû. Ji bo ku wek wî dixwest nedibû, bêhna wî teng bûbû, îcarê xeber didan. Ji Hesen re got "keko tu jî dakeve li jêr rûnê û çavên te li zarokan bin". Bû kurpîna dilê Hesen û Sara. Hesen hişk bi destên herdu keçikan girt. Çûna kelekê tişteki nedîtî û dûrî aqil û texmînan bû. Kelek pir xurttir diçû. Mistefê bi bêrika xwe pir xurttir dixebitî, lê êdî kelek nema di bin kontrola wî de bû, ew mabû ji avê re, mabû ji herka wê re. Bi ku de bibira êdî esil ew bû.

Gava Hesen û Sara dîtî ku doşa xetera rewşê gihaye heta wir, tirsê û poşmaniyeke kamax xwe ji nişkê ve li bedena wan pêça. Lê êdî tu tiştên ku bikirana tune bûn. Çavên wan li avê, li kelekê û li zarokan bûn. Bi qasî ku Sara ne dîndar bû jî, çend due ji xwedê kirin.

Hesen û Sara didîtî her ku kelek bi jêrtir de dadikeve, xurtbûna hêza avê eşkere-

tir dibe. Avê ji bin ve lê dixist, ji herdu teniştan ve lê dixist; av dibû pêl û gir û derdiket pêşiya kelekê. Ew bilind dikir û dadixist. Ew wek periyekî diavêt vî alî û wî alî. Xwe di hundurê wê de girtin jî nema hêsan bû. Û ji nişkê ve wek ku kelek ji jor de bikeve, daket, dîsa bilind bû, ber bi çepê ve çû û hîn xurttir çû ber bi jêr ve. Wek ku av ji meşkan birije ser wan, ji çar aliyan bi ser wan dabû. Wek ku kelekê xwe di bin avê hilda û derket, bû.

Îcarê şiklê herika avê bi awayekî din bû. Xumîn û gumîn pê ketibû û ew dibirin. Wek ku kelek ji derencên bilind diket, wek ku taht û dîwaran diket, dibû. Geh kelek bi poşan diçû pêlan û geh jî pêlan sênga xwe difan ber kelekê û ew di ser xwe re diavêtin. Tavilê kelekê xwe di bin avê hilda û derket. Tirs wî çaxî li zarokan bû girî û qîrîn. Hewar kirin dê û bavê xwe. Sara wî çaxî xwe zû şaş kir. Tirsê zora wê bir. Ew şikên herî kamax hişê wê û mejiyê wê dagir kirin. Tirsê û xiroşê, herdu dest û lepên wê ji kontrola mejiyê wê derxistin. Êdî Sara mirin bi çavên xwe didît. Êdî didît ku kamaxiyê dest pê kiribû. Got "çavên te li herdu keçikan bin Hesên" û wê bi xwe Azadê biçûk hişk kir ber himbêza xwe û ji bîra kir ku destê keçika herî biçûk berda ye. Keçikê xwe bi kirasê wê girt. Lê Sara pê nehisiya. Hesên xwest zarokan aş bike. Lê nema dibû, hemûyan xeter bi çavên xwe didîtin û êdî bi bedena xwe his dikirin. Carê rimekê bilind dibûn û diketin. Di wî halî de gotinan alîkarî nedikirin.

Mistefê di nav panîkeke kamax de bû. Nema zanîbû bê wê çi bikira. Êdî dev ji karê birêvebirina kelekê berdabû û li jêr, li ser cilika di navê de rûniştibû. Kelek bi xwe diherikî, bi ser pêlan de diket û radibû. Mabû ji avê re. Û carekê îcarê ji nişkê ve xurt ber bi rastê ve fitilî û rabû. Dîsa daket û ber bi hêla çepê ve çiveke teng girt. Pêşiya kelekê daket, bi dû re dor şêst dereceyan rabû û dîsa daket. Di saniyeyekê de ên ku li pêş rûniştibûn firiyan paş û dîsa wilo vegeriyan cihên xwe. Dîsa pêlên avê xwe li wan xistin. Dîsa av wek ku ji meşkan birije ser wan bû. Gava dawiya kelekê bilind bû û dîsa daket, keçika biçûk ji kelekê bilind bû û li rastê Sara ket nav avê. Sara, saniya herî dawî giha bi nigê wê bigire û wê ji nav avê derbixe. Zimanê keçikê şkestibû. Êdî ji dengê tirsê, ricfê û kuxt kuxtê pê ve, jê nedihat. Şok bûbû, lal bûbû. Nikarîbû bigiriya jî. Gava ku Sara ew xelas kir, ji nû ve tê derxist ku Azad ne di himbêza wê de ye. Sara bi qîrîneke ku tirseke mezin kir nava zarokan, Hesên û Mistefê, xwe avêt nav ava li ser cilika di kele de û lê geriya. Wek dînan lê digeriya. Lê Azad di wir de nedît. Ji nû ve bi qîrîn û nalîn got "Azad ket nav çem Hesên" û kir ku xwe biavêje nav avê.

*Dûmahik di hejmara bê de*

## Jana hezar salan

### JÛR DILOVAN

Tu...

Binêre tu

Marê reş

Sabûna bin lingê min

Û tîra dirêjî çavê min

Tu...

Kelem î tu

Di zengelora min de

Tal

Talîşkî

Û zilindar

Ne tê jor

Ne diçe xwar

Tu...

Kwînêr î tu

Kwînereke şebûtî

Nêm girtî

Û têr edab

Ne der dibe

Ne diferike

Tu...

Xencer î tu

Xencereke zingargirtî

Bê kalan

Tu çikandiye di dilê min de

Û di destê dijmin de ye

Destikê te

Ev jan

Ev eş

Ev kul

Û ev kerb ya hezar salan e

Tu...

Bizanibe tu

Marê reş

Kelemê di qirika min de

Bizanibe

Kwînêra qemçika min

Û tu jî bizanibe

Xencera destê dijmin

Ku di dilê min rakirî

Serî li mar diperçiqîne îro

Pir bûne bijîjkên me

Hekîm û dojdarên hêl

Tune dikin kelem û kwînêran

Neşter dikin

Diqelînin

Û agirê egîdan

Şewata wan lehengan

Ne xenceran bi tenê

Zirx û pola dihelînin.

## Rênasans



### RÊNAS JIYAN

kew zixuran dineqînin ji ser xaniyan, bixur difûre ji nav baskên wan  
mêkew jinbî mane û lûsiyane li ser qelemên qelenên wan qesîde  
paleyên çûnê bi dengên dîkên sibê re ketine rê,  
fêrîk dilşa ne havînî li ber siya avê  
qehfê serê te motika gerdûnê, mexzena xwînê  
korm e navika te şêr jê dadilêsin zemzemê  
hewqa mîlenyûmê ye çehlên çavên te, li bibikên keviran binihêre  
wext û cih hîn jî dêlikeke tûle  
û ji malxeyidandinên te: nogineke li ber singê xwe mexel hatiye ye  
baş bişidîn bê tu ê çiqasî veşêre ew pûngên buxçika xwe  
zîwana salan a nav emrê xwe bineqîne, hela bê dê çend sal ba jê dawerive  
xaçîrêk xirxal, rê xizêm li keraxa rêwîtiya te  
de were xwe nekuje?

dilqê nê sar

pûtê avê şikestî

qirdê avê mar

şopa axê tazî

zimanê te kol

peyvên te dol



bayê felcê li siya te xistiye  
 ji xela keriyên kuliyan û vir de hecerul eswed e lêvên te  
 li xirbê veşartoka huznê te serê hehecîkan hilqetandiye  
 li baxçeyê diranên nermik derxistiye, te beybûnên min mêtiye  
 pixêriya te şîn vêketiye û stiriyên hêtûnê baş alastiye  
 mêrxas dibin tirsên li navrana newala pûç, dibin qûç  
 agirê te pizanê xwe avêtiye li ser doşeka bêderman  
 kêzikan çargavên te xwarine karika çav axirzeman  
 hûtekî heftserî xwe ramedandî ye li ser riya te ya qitrankirî  
 tu ji qehran dikenî bi diranên xwe yên hinekirî  
 hatiye newîşandin qilafetê qirdê te li ser qehfikan vajî  
 riyên tu li wan dibûn rêwî kawîk in êdî  
 tiya sûravkê! min ji te re bajarê çelkaniya dîtiye: hestî  
 û tu birîneke beradayî bi destmalka destê serkêşê govenda pêçayî  
 de were û neteriqe?  
 tu ez im  
 ez em im bi qasî şînbûna bûzê, deryayê û êvarê  
 xwêdana ji zewkê cemidî ye di bin konê ji tofanê  
 hatiye şuştin bi berfa sor, şîlaqa hudûdên ji beligoşkên xwe derbxwarî  
 tarî:  
 qantirek hatiye fehl: egzotîk zaye  
 çirûskên te hê nuh nuh dadigere çelê xwe  
 ji kevirê qul û vir de, te agir bora  
 biskên qulingên porşehkirî daye min hay jê heye  
 di curn de danû ne dilê me

*26ê Adarê*

# Derbe



SELAHATTİN BULUT

Generalên artêşa tirk dîsa derbe çêkiribûn û tirsas Apê Reşo ya ji leşkeran bûbû çar qat. Wesweseyekê navperûkê xwe avêtibû dil û mêjiyê wî û bernedida. Qûçên nav zeviyar, komikên kevîran, reşeyên bostanan, dar û deviyên li der û dora gund li ber çavên wî wekî leşkeran xuya dibûn. Dengê bihatayê, wek dengê reperepa lingê leşkeran hatibê, vediciniqî. Du kesan bi dengê nîzim bi hev re biaxifiyana, dikete gumana ku fermana wî rabûye û jê vedîşêrin. Ji xwe çûyina cem pîreka xwe, ji derbeyê û vir ve ji bîr kiribû. Doxîna wî ne li helal û ne jî li heram venebûbû. Bi şev heta dereng rûdinişt, cixare li ser cixarê dikişand û heta ber destî sibê xew bi çavan nediket. Gava ku hilmekê serê xwe daniya jî, di xew de, bi dengê bilind bi tirkî diaxift.

Apê Reşo di qesreke kevin a terikandî de dima. Dîwarên qesrê bilind, terklêketî û qelişandî bûn. Gava di xew de dengê gotinên wî yê bi tirkî, di hundirê odayê de, zîz bûn, li qaba xanî ketin û olan dan, got qey leşker li wî diqîrin. Tirsîya û ji nişka ve ji xew çend bû, di teşiya xewê de, denginên gotinên Tirkî jî di nav de hati-bûn guhê pîreka wî jî. Bi çendbûna Apê Reşo re, ew jî hol bû. Herdu bi hev re, li

ser simûçkên lîngan û bi dizî ber bi şivakê ve meşîyan; li derve nêrîn, belê tu kes tunebû. Hilma xwe çikandin û qederekê guhên xwe dan derve; belê ji xêni dengê şevên payizê tu deng nehat gohê wan.

Ecêbmayî mabûn. Denginên bi tirkî hatibû wan; ji vê yekê tu goman nedikirin, lê kî bûn û bi ku ve çûbûn; bi vê yekê nizanibûn Li hevdû zivirîn, bi çavên tije tirs û tije pirs li hevdû nêrîn û wulo man. Çiqas wilo man, wan bi xwe jî nizanibûn. Dû re çavê wan ji hevdû qetiya û berê wan kete aliyê ku zarok lê di xew de bûn.

Zarok cote cot, sero bino di ber hev de razayî bûn. Dilebitîn, xwe dixurandin û lihêf ji ser hev kaş dikirin. Lingên wan li ber pozên hev bûn, pihên li dev û diranên hev didan, hevdû tam didan û xwe diqelaptin vê hêlê û wê hêle. Dema ku xwe ji ser milekî diqelaptin ser yê din, bîhna fisê quftikên pîvazan yên ku ji êvar ve xwera-bûn, di ber valahiya kêlekên lihêfan de li odayê belav dibû.

Apê Reşo bi pozê xwe girt û fetîlî ser pîreka xwe û got,

– Keçê van gedên te em xinanî kirin. Ew jî tev li te hatine. Wekî te qûnsist in. Hela here li binê wan binêre, ev ne wek bîhna fisan e.

Apê Reşo hê nû peyva xwe qedandibû, ji aliyê ku xesiya wî ya pîr lê razabû, tirek bi dengêkî pîr bilind, wekî ku tu tivingekê biteqînî, wek çapliyê, li orta qaba qesrê ket û deng veda û di hundirê odê de ji dîwarekî pengizî diwarê din û li ber lingê Apê Reşo ket û kir qireqir. Xwesiya wî ya pîr, bi dengê tira xwe re ji xew çend bû û gote qey leşkeran girtiye ser malê, kire gazî û xwe avêt pişt sindokê; piqîn bi Apê Reşo ket. Ji derbê û vir ve tu ken bi wecê wî neketibû. Wekî ku dixwest heyfa xwe hilîne argûşkên wî ji hev çûbûn û bi tevahiya dengê xwe dikeniya. Nola vizika ku li ser teht hatibe avêtin, lal bûbû. Pîreka wî ji vî halê wî tirsîya; çend kulm li pişta wî xist û jê re got,

Ev çi ye? Mehtirûmê! Bes e! Hebekî hilma xwe veke, wextî tu bifetisî!

Apê Reşo ji ber hêla kenîne qedereke din jî, wilo hejiya. Hêdî hêdî sar bû û sekinî. Destê xwe di ser sitûyê pîreka xwe re avêt û jê re got:

– Ya hurmê, em herin rakevin. Tiştêk tune. Ew gotinên bi tirkî yên ku bîstek berê hatibûn me, xuya ye ku ew jî ji ber lîvên kulîmekên diya te derketine

Apê Reşo wê şevê piştî bawer kir ku dengê peyivîna tirkî û dengê teqîna tivingan tev ji xwesiya wî ya pîr derketine, rihet bû. Helala wî hate bîrê. Canê wî germ bû û xwe xwerand; milên xwe vekir, tajan da xwe, pişta xwe qirpand û tiliyên wî şemîtin ser gulfa doxîne.

Apê Reşo wê şeva, heta ku melê sibê got, "Elah û Ekber," pişta xwe neda erdê. Serê sibê, dema ku şalwarê xwe kişand xwe, doxîna xwe - bi qasî ku şalwar jê neke-

ve- sist girê da; destê xwe li pişt qûna xwe avêt ser hev û bi pozikê solê derî heta dawiyê vekir û xwe avêt derve. Li ber deriyê hewşê, pê li lingê kûçikêkî ku xwe li ber berojk vezelandibû kir û di ser re derbas bû. Zûrina kûçikê çû û di felekan re derket. Bi deng re kûçikên gund li cihê xwe guhên xwe mûç kirin û bi dengêkî bi şewat reyîyan. Kûçikê pêlêbûyî, li ser sê lîngan hilimî û baz da; heta ku ji ber çavan wînda bû, li dû xwe nenêrî.

Yên ku wê rojê meşa Apê Reşo ya ku di nav gund de kir, dîtî; gotin herhal derba leşkerî ya Tirkîyê bi ser neketiye, leşker ji herêmê vekîşiyane û bi halekî xerab, polî poşman vegeyriyane Enqerê. □

## Keça Delal Mereş

Hê di dergûşê de ji te re digotin:  
Bavê te Kemalê mezin e,  
ew tu caran zaroyên xwe bi tenê nahêle.  
Ew çend car bûn ji te dipirsîn:  
Kî bavê te ye, ma ne ew hij ji we hemiwan dike?  
Hindik ma bû, tu ji bîr bikî, zimanê te bi çi zimanî dipeyive.

Di xwendegehê de agir berdidane dilê te:  
Ez serbilind im, ko ez keça te me.  
Tukesî, te jî, ne diwêrî bigota:  
Ez kurmanc im, ezê bi tenê li dijê we hemiwan rabim  
û ber bi gunehê xwe werim, va ye, ez ne tirk im.


Gelo vî bavî tu çiqasî rind xwedî kiriye,  
da tu ji wan re weke kûçikêkî bi hefsar,  
weke keçeke xapandî, ko li esil û fêslê xwe serî lê geraye,  
yeke ko di nav hevalên xwe de, bi dil birîndar,  
birîndar û tim bi paş ve mayî:  
Bêrîvanek li qurçika paşî ya vê dinyayê.

Gelo ewê çi be, gava rojekê tu bi xwe bihişî,  
ko ew tu caran ne bavê te bû?  
Gava di nava dilê te de hestin hişyar bibin,  
ber bi ezmanan bikevin û weke refên azad  
yên qaz û qulingan li sînorên Kurdistanê bigerin  
û di nav lîsê dilên xapandî de deynin?  
Li wê derê, devera ko dibêjin:  
Êdî em hew li rengê çekan dipirsin.

**ZERDEŞT HACO**

*(Payîza 1998an)*

# Ij we ra wişt!



PERWIZ CĪHANI

Gava ko nameya te digehîşte destên min, min ew wek çawa ko tu bixwe giheştibî ber destên min, pêş da bi dilovanî û hijmekariyeke sosret, ko ji serekaniya dilê minî pîrevîn serekanî girtibû, dida ber sîngê xwe û digel dilê xweyî wargehê derd û kul û kîn û vînê dinasand. Li dû ra min ew bi hijmekarî bêhn dikir û bi bêhn-kutk devê pakêta nama te bi meqesek tûj bi lez û bez lê bi ser û ber, û bi hemmet vedikir, dako nebî nebî goşeyek ji wê bikeve ber meqesê û goşa dilê min pê biêşe. Gava ko devê pakête vedibû, bêhna xunava li ser gula tefeşa te, xûdana dest û pencên te weke bêhna bihiya sendoqa dapîrê mal û mezêlê dilê min dadigirtin. Bêhna te tijî sebeta sîngê min dibû. Sîngê min dibû sebetek tijî ji halhalkên zozanan û sosinên terazinan. Min nama te weke kotîrek şîne balnexşîn ji hêlûnê derdanî û çavên min yên tamezro wek cotek eluhên tîjbal û dijnêçîr ji serê namê ta binê wê per lêdidan. Bi dîtina destnivîsa te ra çavên min geş û dilê min xweş dibû. Min bêhna te û têhna te li nav tek tekê peyvînan da bi çavên dilê didîtin û bi difîna giyanî bêhn dikirin û pîr bi sebeta sîngê xwe ew bêhn û ew têhn heldimijand û dikişande qafê xwe û mejiyê xwe pê zaxav dikir. Min li nava tek tekê peyvînan da, li nava hemû xêz û xêzikan da wêneya te didît. Giştî nuqteyên wê wek dilopên ji ronahiyê dinuqurîn

nav dilê min. Her nuqte û xêzekê hezaran peyamên neragehandî radigehandin. Eluhê dilê min bi lez per lêdida û da ko digehîştîm binê namê. Destêneya te li binê namê da destê xwe li min dihejand û xatirê xwe ji min dixwest. Ez bi destêneya te ra, ji çawaniya te ya rewanî û giyanî agehdar dibûm û haya min ji rewşa te dibû. Naveroka nama te her çi dibû bilanê, lê min li nav xêzên wê yên çiloçepo û qîloqaco da meşîn û rêveçûn, rabûn û rûniştin, gotin û axiftin, reng û deng, hênijîn û bênişîn, bişirînên şîrîn û girnişînên te yên tal bi çavên dilî didîtin û bi guçkên giyanî dibihîştin. Bila qet min û te me hevdu li dirêjaya temenê xwe da, heylo li xewnên şevane da jî nedîtiba, lê bejn û bala te, hulm û gulma te, bêhn û têhna te, dihatin ber çavên min û difina min digel wan nasiyar dibû. Min tu bi destxetê te ra, bi xwar û xêçên xêz û xêzikan ra nas dikirî. Min xû û xideyên te, rê û rewîştên te, bi çawaniya xêzikan ra, bi bêhna xûya te ra ko digel nivîsînê li ser tefeşa namê rûniştibû, nas dikirin. Ez bi dil û giyan li pêşberî te rûdiniştîm û min bi te ra bi hûrgilî gilî û gazinde dikirin û gilî gazindên te jî bi can û dil dibihîştin. Ew gilî û gazindên ko ji devê me ra jî derneketine û me ji çi kesî ra negotîne, me ji hevdu ra deve bi derziyê ra dikir û li rêka rewanî nehênî û razên sergirtî li hevdu diguheştin. Ez û tu, em li nav neynûka can û xodîka rewanan da, li himberî hevdu rûdiniştin û min û te, me nedîtî û nebînayî hevdu himêz dikirin û li quncikê ronahî da me ramûsanên asimanî û nexwestî raberî hev dikirin. Ez li çavên te da û tu jî li dilê min da bûy. *A, dilê min, dil le dilî kul her agadare. \**

Loo! Delalê dilê min! Lêê! Delalîka ber vî dilî! Ew dem êdî neman. Pêşketina têknîkê ew jî ji me stand. Ew jî ji me ra, ji min û te ra gelek dît. Pêşketina têknîkê hêdî hêdî û nedîtî û nebînayî wekî kula Mûşê û Helebê, bînanî xurkê binva kete nava wê dilxweşiya me da û ew li binî da qoqiland û herifand û binve û nepenî, bi nermebirî ew dilxweşiya me qurtisand û birî. Destnivîsa te bû nivîsara maşînî. Êdî çavên min nikarîn te li nava xwar û pêçên xêzikan da bibîne. Pît û peyv û nuqte û nuteşan wek acurên maşînî, hemû hindî hev û li yek rece û yek endazê da hatin darrijtîne. Êdî naz û xesm û vîn û xeşma pêşîn li nava wan da neman. Ew bejn û bala te, ew rewî û kewta te, ew reng û deng û heng û ahengên te ji nama te koç kirin û çûn. Êdî çavên mine dûredij nikarîn wê bejnê li nava namê da bibîne û tîna dilê xwe pê bişkîne. Lê hê jî destêneya te li binê namê da mabû. Herçend ko tenê bû jî, lê dikarî bi hej û livên nediyar, ko tenê çavên evîndarên dilkizirî û bêhnçikiyayî û hinavhingaftî dikarin bibînin, destên xwe li min dihejandin û malavayî ji minî nemalava dikirin. Hê jî dikarî hindek raz û dilgotkên sergirtî li nîveka me da ser veke.

Herçend ko destxetê te, xîzikên xwar û xêç nedigehîşte destên min, lê hê jî ciyê

dilxweşî û sipasbêjîyê mabû. Mirovi dîsan jî dikarî pişkek ji hebûna te, têhn û bêhna re li nava kaxeta nama re da, li nava çawaniya pêçan û girêdana wê da bibîne û zara dilê xwe pê bihewîne. Kaxet ji layê te va hatibû pêçan û şandinê. Destên te li kaxetê ketibûn. Min hê jî dikarî ew kaxeta ko ji layê te va hatiye şandin û pêçanê bida ser sîngê xwe û bêhn bikira û kul û derdên xwe pê sarêj bikira. Hê jî min dikarî pişkek ji reng û rûyê te, li nav qetên kaxetê û pêçana namê da, li nav destêneya te ya li biniya namê da bidîta. Hê jî min dikarî te li himber xwe da seh biki. Te hê jî li dergê dilê min dida û te xwe dida ber dergê mala kul û derd û jan û keseran û bi evîndarî digot:

– Malê! Salamalê! Ij we ra wîşt! -

Lê delalîka ber vî dilî! Lo xoşewîstê min! Ewê dilxweşîyê jî mala xwe bar kir. Têknîka malçol ew jî nehîşt. Erê dilê min! hêdî hêdî nama te ya maşînî jî nema. Maşînnivîsî û xêvjimêrnivîsiyê ciyê xwe dane faksê. Dezgeha faksê difiqandê û navê te li ser kaxeta min dinitiland. Li cîhê wan nameyên cuwan da tenê hindek xwar û xêçên reşbelek li ser kaxeta min lê bi navê te rûdiniştin. Ne bêhna te ma, ne têhna te. Ne rengê te ma, ne dengê te. Lêmiştê çi tişt nehîşt. Name û nivîsîn û dil û cerg û vîn û şîn û evîn hemû bûn hindek pûş û pelaş û asin û asinewale û lak û laylon û benîştok. Heylo li mino! Heyla li teyê! Çi sosretêk reş û giran bû! Li ciyê wan hemû xweşî û dilxweşîyan da, li ciyê wan hemû reng û deng û saz û avazên asimanî da, tenê maye silavek hişk û hola, req û rût wek berekî berk û bêgiyan. Faksê jî ciyê xwe da E-mailê.

Êdî ne mirov dikare te bibîne, ne jî te bibêhne. Êdî mirov ne bi bêhna te dihesê û ne jî bi têhna te. Êdî mirov nikare destê xwe li dewsa destê te li ser kaxeta nama te bixîştne. Ne jî xûya te ko li ser tefeşa namê rûniştibû bibêhne. Tenê xêvjimêre, ko li pêşberî mirovi rawestayê û wekî ziyayekî bîrsî, wek marê Hurêş devê xwe ji hev vekiriye û hemû vîn û evîn û hejîk û xwazîkan dadîqurtîne. Asinekî reqî rût. Benîştokek vik û vala.

Ax! Xwezî carek dî te bi destxetên xwe, bi wan tiliyên xwe yê marmarî û pencên xwe yê armûşîn lepên xwe yê nerm û nol ji min ra nameyek binivîsiya. Ax! Xwezî carek dî çavên dilê min bi dîtina destêneya te ronahî biba. Oxweyş! Çende xweş bû ew demana!!!

Berbanga sibê, paşî xewnên nîveşevan.

06.01.2000 Zürich

\* Rêzek ji wê helbestê ye, ko min ji Marîf Axayî ra nivîsiye.



# Beşa pêşîn: Jana Qirden

## YAQOB TILERMENÎ

Golbimasî û Çiyayê Nemrûdê

Di navbera herdûyan de pira mîna deryayeke ku ji axa biadan pêkhatî cih girtibû.

Axa afirî bûbû wargeha afirandina pêxember û yezdanan

Warên pêxember û yezdan lê mane

Bûne zilûmkarxaneyên mirovên li wir jiyayî

Lewma zilûmkar ji hêlînên bilind hez dikin.

Ev fikir yek bi yek di serê Xelîl de zîl dabûn. Di çarçoweya li dîwêr daliqandî de, her du sitûnên ber bi ezmên ve dirêjbûyî û bilindbûna Çiyayê Nemrûdê dîtibû. Ew deşta bêserî û bêbinî û Çiyayê Nemrûdê: Hêlîna Yezdanan. Di navbera her du bilindahiyên de axa ji rengê xwînê -axa sor- xuya dikir. Ev şeva sisêyan bû ku Xelîl ji xew şiyar bûbû û li ber wê çarçoweyê rawestiyabû. Janeke nedîtî di canê xwe de hîs kiribû. Jana pizika mewîjokê xew li wî herimandibû. Ev jan, janeke ku ji hêla Yezdên bi qirden hatibû dayîn...

Mewîjok salê carekê di zendê destê wî ê çepê de derdiket. Her carê jî serê mewîjokê bi rengekî elem digirt. Sor, zer, reş... Dermanê wê li gora gotinên yextiyaran tayek bû. Divê tayê di rengê elemê de, di pizikê de bihata rakirin. Lê Xelîl vê carê tu ta tê re ranekiribû. Lewra rengê elemê ne dihate fahm kirin. Şeva çaran ji ber jana pizikê ne kiribû der û giriyabû. Çar hêsir ji çavên wî dageriyabûn û çend peyv ji devê wî derketibûn:

Nola yezdanê rojê REA ez jî ji firmêskan afirî me

Şeva çaran, şeva herî dirêj bû, tev li jana nedîtî... Li tayekî reng wendayî geriyabû. Ji ber ku tiştên wendayî ji bo wî xwedî dîrokek bûn. Pizbenekî di şûjinê re rakirî, bûbû dermanê pizika mewîjokê. Wê şevê jana qirden li Yezdên vegevandibû. Bi wî hawî şewt şikestibû.

Beyana sibehê li ser dengê pisîka xwe yî reş hişyar bûbû. Divê çûba dibistanê. Ev sê salên wî mîna robotekî sazkerî radibû, diçû qedemgehê, ser çavên xwe dişûşt, riha xwe kurr dikir û berê xwe dida dibistanê. Ne serma, ne seqem, ne ba û ne bager jê re bûbûn asteng. Tenê dema ku nexweş biketa û di betlaneyan de, nediket wê rêyê. Ji ruhê xwe, ji kargeran û ji şagirtan off bûbû. Hema li mahneyekê digeriya.

Ev sê sal in, dardaroka demjimêra li dîwêr daliqandî, bi dengê xwe yî jehrdadayî di guhê wî de serdestiyek ava kiribû û li gora wê demjimêrê rojên wî dest pê dikir. Tew dengê demjimêrê nema di guhê xwe de his dikir: Hîn bûbû. Lê rojekê şagirtêkî wî, zarokekî yanzdeh salî ew ji wê xewa mirinê şiyar kiribû, wê rojê şîret li şagirtan kiribû:

Ev demeke dirêj e ez dikevim waneyên we  
We dîtiye destê min bi we bûye  
Zarok hê di çêbûna xwe de dibin bengînê pergale  
Pergal ji we zarokan dest bi radestiyê dike  
Pergalparêz dizanin ku giyanê we lawaz e  
Bi tirsê bavê û bi tirsê bavê mezin û bi tirsê bavê herî mezin we ditirsîne  
Hûn tirsê bi darê zorê dipejirînin  
Ez ji we re dibêjim vê mezinatiyê nepejirînin

Çima lêxistinê layiqî we dibînin  
Li malê  
Li dibistanê  
Li meydanê  
Li hêla din piştî mirinê  
Çima wê lêdanê  
Ez ji we re dibêjim hînî nabûnê bibin

Hûn heta şeş heft saliya xwe bi zimanekî diaxivin  
Hûn ji nişkê ve dibin hêsîrên zimanekî din  
Tevlihev dibin tiştên hînbûyî  
Lêdan li ser lêdanê dibe para we  
Ez ji we re dibêjim nebin hêsîrên zimanên din

Xelîl li hundurê dersxaneyê mîna kesekî serxweş diçû û dihat. Ji çavên wî xew di-

herikî. Pizikeke piçûk bûbû astenga xewa wî. Peyvên ku niha ji devê wî derketibûn, bi wî jî ecêb hatibûn. Wek mirovekî ji derdora xwe xatir bixwaze û venegere, axivîbû. Ku axavtina xwe qedandibû, dest bi waneya xwe kiribû. Li deprêş hinek nav, hinek hevok, hinek hejmar nivîsandibû û şagirtêkî xwe vexwendibû deprêş. Şagirt qam kinik û dagirtibû. Li gora yanzdehsaliya xwe dişibiya zarokekî nû biserlingankerî. Şagirt rahiştibû jêbirê û yek biyek nav, hevok û hejmar jê biribûn. Bi tebeşîra sor ew şîretên mamoste yek bi yek li dû hev rêz kiribû. Dîmena bextewariyê ev e. Lê, pergalarêz mamosteyan wek darê zorê bi kar tîne. Divê pêşîn haya we ji we hebe! gotibû. Bûbû tîqtîqa wî û xwe li erdê xistibû. Mamoste Xelîl bi çavên matmayî li wî nerîbû û wî jî xwe li erdê xistibû.

Xelîl lingek rakiribû û yek danîbû. Zarok hemû xistibûn destê hev û ew jî di serî de, dest bi dîlanekê kiribûn. Koma dîlanê bi wî hawî daketibûn heta hêwanê. Mamosteyên din bi çavekî bişik, mamoste û şagirtên dêhn gotibûn. Du mamosteyan bîzorê Xelîl bi rûniştandin dabûn.

Xelîl heta niha tu carî ewqasî kêfxweş nebûbû. Xemên xwe kêm kiribû. Demek berê xwe ji fikrên olî saft kiribû. Ji tu kitêbên olî hez nekiribû. Paşdemayina civakê bi olan ve girêdabû. Ji ber vê sedemê li hember olan helwesteke tûj nîşan dabû. Li gora fikra wî olan bi peyvekê mirov ji xwe ditirsandin. Ev peyv, peyva Yezdên bû. Ev bêje ji ferhenga Xelîl derketibû.

Wê şevê, Xelîl li ser dev paldayî, li kirinên şagirtê xwe fikirîbû. Bextewariyekê di mejiyê wî de cih girtibû. Bi xêra zarokekî yanzdeh salî hînê bextewariyê bûbû. Rahiştibû mirêka destan û li awirên xwe temaşe kiribû. Heta îro çawa ev awir nedîtibûn, li xwe şaş mabû. Bi xwe re peyivîbû:

Divê sibehê ez dev ji mamostetiya xwe berdim  
 Divê sibehê ez ..... xwe berdim  
 Divê dusibehê ez dev ji jina xwe berdim  
 Divê dusibehê ez .....xwe berdim

### Beşa navîn: Mewijok

Dema ku Xelîl dest bi xwendina zanîngehê kiribû, bavê wî birê wî ê piçûk şandibû dû wî. Xelîl bi birê xwe re hatibû malê. Li hewşê pêrgî diya xwe bûbû. Pêrgî mirûzekî daliqandî bûbû. Fahm kiribû ku bangkirina wan ne ji bo xêrê ye.

Bavê Xelîl, kurê min, hela wer li tenîştâ min rûne, çend gotinên min hene! gotibû. Axavtina xwe ne qedandibû:

Kurê min, berî ku em werin li vî bajarî cîwar bibin, bobelateke mezin hate serê me. Lawê Eliyê Evdî, Biro dest avêt namûsa xwişka te Sarê. Sarê xera kir. Ji ber ku temenê wê piçûk bû, li Biro mahrkirin ne gengaz bû. Jixwe Biro di bajarekî din re derketibû. Çiqas bavê wî xwe avêtibû me jî, me ewqas carî ew qewirandibû. Hîna werê pismamê te Nûhat bû qesasê Biro. Dijminantiyeke tund di nav me de ava bû. Axa û maqûlên derdorê hatin ser dozê. Me biryara di dozê de hate sitendin, qebûl kir. Ez û her du apanên te em ji erd û malên xwe bûn. Ew roj e, ev roj e, em li vir bi cîwar bûne.

Gotina min ev e, niha zemanê xweha te hatiye û divê em wê rûşeyê ji ser xwe rakin. Ez û apanên te peyivîn. Emê Sarê li pismamê te Faro mehr bikin. Lê divê tu jî bi xweha Faro re bizewicî. Wek te fahm kir wê berdêlî çêbibe.

Xelîl bûbû wek ku tu kûzeke ava cemidî bi ser wî de dakî. Nema dizanîbû wê li halê Sarê bifikire, wê li halê xwe bigrî. Pêşî got, nabe, ez qebûl nakim!

Bavê wî got: "çawa tu qebûl nakî?" Wî got: "ez mîna xweha xwe, li Edûlê dinihêrim. Em bi hev re mezin bûne, me bi hev re nan xwariye û di navbera me de tu ferqa xweh û biratiyê tune. Dilê min li wê xera nabe. Jixwe ez hîna şagirt im, ne wextê zewaca min e jî."

Xelîl çiqas li ber xwe da jî, ew hêz bi xwe re nedît ku biryara bav û apanên xwe xera bike.

Di hundirê deh rojan de Sarê li Faro, Edûlê li Xelîl mahr kirin. Melayê ku du, sê caran ketibû qirika Xelîl, mehra wan birîbû.

Xelîl heft şevan ketibû odeya xwe û her carê bê xerakirina livîna xwe ji odeyê derketibû. Hêviyeke şikestî di dilê wî de hebû. Heta taliyê çavên xwe bera revê dabû. Jixwe Faro û Sarê bi ser ketibûn. Bavê wî her heft rojan hatibû bi wî re şer kiribû, her carê wî bi nezilamtiyê tawanbar kiribû. Şeva heştan Xelîl xwe radestî peyvikan kiribû û livîna xwe xera kiribû. Edûlê bi fediyeye mezin rahiştibû kevnîkê xwînê û dabû destê xesûya xwe. Xesûyê di nîvê şevê de, bi dengêkî hişk lîlandibû. Xelîl serê sibehê, bêyî xebera tu kesî berê xwe dabû zanîngêhê.

Pîştî ewqas rojên nexweş mehek derbas bûbû. Xelîl bi ser malê neketibû. Her du apên wî hatibûn bîzorê ew biribûn malê. Xelîl ji wê şevê pê ve destên xwe nedabûn Edûlê. Sal di ser re derbas bûbûn. Du xwarziyên wî çêbûbûn; lê wî destên xwe nedabûn Edûlê. Hinek hevalên wî çûbûn serê çiyê, hinek hatibûn kuştin, hinek hatibûn girtin; lê wî destên xwe nedabûn Edûlê. Li zanîngêhê keçekê dil dabû wî û

daxwaza hevaltiyekê li wî kiribû; lê Xelîl destê xwe nedabûn Edûlê. Xebera çêbûna xwarziyê sisêyan hatibû, Edûlê roj bi roj lawaz û hişkolekî bûbû, lê Xelîl ji a xwe daneketibû û hîna jî destên xwe nedabûn Edûlê. Bi vê helwestê bav û apanên xwe şermezar kiribû.

### **Beşa dawîn: Pozben**

Vê sibeha ku daxwaznameya îstîfa xwe dabû destê midûr, pirr kêfxweş bûbû. Şagirtê wî ê yanzdeh salî hatibû ber çavên wî, di ber xwe de peyivîbû:

Ku ez çav li rewşa wî ketim  
Mîn got qey minminikeke temenkurt e  
Bi rastî zêde dişibiya minminikekê  
Bi kenê xwe re azadfirîna wan dianî bîra min  
Wexta ku min destê xwe dirêjî wî kir  
Mîn digot qey wê bêje FIRRR û here  
Lê bû sedema vekirina vê riyê  
Ez hê jî di bandora wê rojê de me

Midûr û hevalên wî çiqas li ber wî geriyabûn jî fêde nekiribû. Kuro were dev ji van kirinan berde, min digot qey li vê dibistanê zilamek hebe tu yî, lê mixabin!..

Peyva midûr hebekî li telê Xelîl ketibû. Gotibû: "Ez ne zilam im û ez nabim zilam jî!.."

Midûr: "Wê çaxê qîra te kiriye!" gotibû.

Li vegerê Xelîl xwe pirr rehet his kiribû. Wek ku barekî pirr giran ji ser xwe avê-tibe, bi xew ve çûbû. Ku çavên xwe vekiribû, şagirtê wî hatibû bîra wî:

Divê kes li ber tavika kesî nebe sî  
Divê her kes xwe bi siya xwe bipêçe  
Hîn gelek kesên wek şagirt xwe di bin siya xwe de vedişêrin  
Ji bo ku rûmeta wan bê fahm kirin  
Divê mamoste yek bi yek li cewherên şagirtên xwe bigerin

Xelîl berê xwe dabû bajarê ku mala bavê wî lê. Bi sê telaqê bê fitwe, ez Edûlê berdim! gotibû. Bavê wî xwe li wî rakişandibû, demançe lê kişandibû. Xelîl sînga xwe

heta jêr li ber wî vekiribû û: "Ne tu yê min bikujî, vaye ez amade me!" gotibû. Diya wî xwe bi ser wî de avêtibû. Birê wî bi destê bavê xwe girtibû. Xelîl pêxwas derketibû û çûbû. Bajarek li xwe heram kiribû. Ketibû ser şopa bajarekî din. Bajare pêşîn bêbextî li wî kiribû; ew pêxwas bi ser bajarekî de şandibû, tiştê ku li zora wî diçû jî ev bû.

Diwaroj li dû Xelîl dimîne. Dahatûyê gav dike. Li jineke wechişk rast tê. Şên xwe di agirdanka wê de dikuje. Ne li bavê, ne li jinê, ne li dibistanê, ne li Yezdên û ne li berjewendiyên jiyane difikire. Xwe berdide. Xwe berdide. Dijî. Dij. Di. D....

□

# Arjen Arî gotinan di hingivê helbestvaniyê dadike

Îsal serê salê, pirtûk-xana me kurdan bi pirtûkeke din dewlemend bû. Pirtûka ku ez bahsa wê dikim, a Arjen Arî ye. Pirtûkeke helbestan e û a wî ya pêşî ye. Navê wê, ramûsan min veşartin li geliyekî, ye. Pirtûkeke biçûk e, lê li gora pîvanên mezinbûn û biçûkbûna pirtûkên helbestan, pirtûkeke wek adetê ye, wek piraniya pirtûkên helbestan e. Lê bi naveroka xwe û kapasîta xwe pirtûkeke mezin e. Di nav weşanên *Avesta* de li Stenbolê derketiye.

Ji çapa pirtûkê û wêneyê li ser jî pir hêsan xuya dibe ku pirtûkeke helbestan e. Navê wê, xweş li naveroka wê tê. Navê wê, navê hisreta derketiyan û evîndaran e. Ji ber ku ji çend helbestên dilêriyê pê ve, helbestên Arjen Arî bi piranî di wê derheqê de ne. Ji gelek hêlan ve rahiştiye herdu teman. Bi dos-



tanî û dilovanî serê pizika ku ji ber wan herdu tiştan di dilê mirov de çêbûye, dişeqitîne û mirov bi xwe re dibe warê helbestên xwe. Bi baweriya min, wê piraniya kurdan rewşa xwe û êşa xwe di pirtûka wî de ravekirî bibînin, wê evîndar, derketî, belengaz û kurdperwer bi kêfxweşî bixwazin helbestên wî bixwînin. Û gava xuşk û dayikên xortên me yên bi

avêdeçûyî carekê li wan guhdar bikin, wê bi îşk îşk bixwazin ku careke din ji wan re bîn xwendin. Ev yek biserketinek e.

Heger navê tu nivîskaran li ser pirtûkê tune bûna jî, min ê bi hêsanî tê derbixista ku pirtûka Arjen Arî ye. Min gelek helbestên wî xwendine û min zimanê wî û stîla wî fam kiriye. Ew ne wek tu kesan û tu kes jî ne wek wî dinivîsin. Ew, xwediyê stîlekê ye. Ji ber wilo helbestên wî hêsan tînin naskirin.

Zimanê Arjen Arî zimanekî taybet e. He-

ger mirov li gora pîvanên ku Celadet Bedirxan danîne bipîve, di hin tiştan de ji rexneyan xelas nabe. Lê dîsa jî divê bê gotin ku ziman, bi jîriyeke ku hêjayî pesindayîne ye hatiye hûnandin. Zimanekî ku him tîr e û him jî wê piraniya kurdan bi hêsantî fam bikin e. Bi bendeke biçûk, hisrekeke salên dirêj tevî ji mirov re dibêje. Bi yeke din a wîlo, bûyereke mezin li ber çavên mirov radixe. Bi yeke din, rewşa welêt a deh salên dawî şanî mirov dike.

Zimanê Arjen Arî, kurdiyeke xas e. Rêzên helbestên xwe bi adetên kurdan, bi gotinên adetên kurdan ên xas xweş kirine, xemilandine. Ev yek, helbestên wî û zimanê wan xweştir dike. Arjen Arî, hûna ciwan e, lê bi hîlbijartina gotin û awayê hûnandina zimanê xwe, zaniyarî, ya jî herika zimanê kurdekî mezin (kal) ê ku ji her babet asîmîlasyonê paqij maye derdixe. Ev jî biserkerîneke din e.

Gelek caran mirov li helbestên ku ji serî heta dawî bi gotinên ne di mana rast de hatine gotin, rast tê. Bi gotinên wek, germa sar, serma germ, şeva ruhnî, roja tarî û olana sirûdên evîna jibîrbûyî, tîr nivîsîn. Rêzên wîlo dikarin balkêş xuya bikin, lê nikarin rast bin. Gotin, bi wî awayî mala jiyane û tiştan xerab dikin, êrîşî sedem û mecala hebûna wan dikin. Ji ber ku bingehê fizîka hebûnê, jiyane û afirandinê, spehîbûn, harmonî û sîmetrî ye, ger û peydekirina mecala lihevkerin û jiyane ye. Nakokî û paralêlbûn, piştî hebûna harmoniyê tîr, ji bo ku harmonî bikaribe hebe, ew hene. Hebûna wan

bi xwe harmonî ye.

Edebiyat afirandineke jîndarên xwedî hiş û aqil e. Divê harmonî û spehîbûn di edebiyatê de hebin. Harmoniya edebî, harmoniya zimên û fantazyên ku bûyer û hebûnan rave dikin e. Ji xwe helbest bê harmonî qet nabin. Ew harmonî di gotin û rêzên Arjen Arî de heye û bingeh e. Arjen Arî gotinan di hingivê helbestvanîyê dadike, wan di mana wan a rast de, bi jîrî bi cîh dike û hevokên xwe wîlo dihûne. Gotin û hevok nayên du maneyên cuda. Ji bo ku mirov wan fam bikin, ne mecbûr in tîkêvin nav serêş, dudilî û sergêjekeke kamax.

Gelek caran, gava mirov hin helbestan baş nexwîne, mirov di xweşiya hûnandina wan dernaxe. Ji xwe gelek caran awayekî xwendinê yê taybet dixwazin. Wek klaman in, şiklê nivîsandinê, melodyekê ji helbestan re dixwaze. Ez çiqasî dêna xwe didimê û dixwînim, ez dibînim ku rêzên Arjen Arî wîlo hatine nivîsandin. Melodiyeke wan heye. Bi wî awayî jî, ez bi xwe bawer im ku wê tu kes nikaribin wek nivîskêr xweş bixwînin.

Helbestên Arjen Arî helbestên hisretê, ên spehîbûna xwezayê, ên dilêriyê, ên jihevderxistina dîrokî û ên agahdariyê ne. Jiyanekê zinde di wan de heye. Wêneyên çiya û deştên me ên spehî nîşanî mirov dike. Bereketî dar û ber û rezên me dîsa tîne bîra mirov û ji mirov re rave dike. Adetên kurdan ên human, di ber wan tiştan re, bilind radigire. Ên ku êrîşî wan dikin, rexne dike. Û li gora baweriya wî, kurd kûçikan didin xatirê



xwediyan û wan nakujin. Lê bala min dikişîne û ez bawer im ku wê bala gelean bikişîne bê ma Arjen Arî çima egîtên ên ku kûçikan nadin xatirê xwedî û wan dikujin, dipesînîne, çima di pirtûka xwe de bi giramgirî cîh daye navên wan. Herdu tişt li hev nakin. Di helbestên Arjen Arî de qet li hev nakin. Harmonî di vê derheqê de têk diçe.

Bêguman gava ku mirov bi nêta analîzîkirinê li helbestên Arjen Arî bikole, mirov dê bikaribe gelek gotinên ku navên hêjayiyên edebî ne, ji bo wan binivîse. Her wilo mirov dê bikaribe çend gazinekî din jî peyde bike. Lê armanca min ne herdu jî ne. Ez dixwazim bixêrhatinekê bidim pirtûka wî û wî bi xwe pîroz bikim.

”ketibî ser zimanan tu bi Zînî  
û Memê te ez bim heke  
şerm meke  
veke deriyê dubask  
paxila xaxxask li min veke  
û piştekekê bide ber derî  
ta ferwerdîneke din  
vem -mekel!”

Ez herî dawî dixwazim bibêjim ku helbestên wî, wek hevoka li jor, bi mantiqê kurdî yê xas in. Xwestin û bêfikirîneke bêwestan di wan de heye. Rêz û gotin, rêberên dilovan û dost yê birina warê helbestan, quntara çiyayê Parnansso in.

**Silêman Demir**

## Marê di tûr de

**M**arê di tûr de romaneke Medenî Ferho ye ku li Stembolê derketiye û vê dawiyê gihîştîye me. Medenî Ferho di vê romana xwe de bi zimanekî dewlemend, bi zimanekî bi gotinên pêşyan û îdyoman ve mişt, behsa herêmeke welêt ya piştî avabûna komara Tirkîyeyê dike û resimekî

welêt yê giştî bi mîrxasî, xayîntî û dostaniya kurdan ve radixe ber çavan.

### Marê di tûr de Medenî Ferho

Weşanên Enstîtuya kurdî  
ya Brukselê-Pêri

## Hêvî û jîyan

**D**erwêş M. Ferho serokê Enstîtuya kurdî ya

Brukselê ye û şair e. Digel ku ev zêdeyî bîst salî ye ku Ferho li derveyî welêt, li Brukselê dijî jî, dîsa mirov di şîrên wî de pêrgî hîsên germ, zimanekî herikbar û dengêkî li dû azadiyê tê.

### Hêvî û jîyan

Derwêş M. Ferho

Weşanên Enstîtuya kurdî  
ya Brukselê-Pêri

# Danasîna kitêban bi kurtî

## Ristemê Zal

Mîna tê zanîn gelek versiyonên Ristemê Zal hene û ji bilî kurdan ew di nava hin miletên din de jî tê gotin. Ew bi taybetî jî li ba farisan navdar e. Lê nivîskarê kurd Xurşîd Mîrzengî ku em wî ji romana bi navê "Sînor" nas dikin, ev destana nemir, bi çend versiyonên cihê ji devê Qasimê Mehmed Keyayê Helhelê û Eliyê mala Babê guhdarî kiriye û bi kirasekî edebî yê nû pêşkêş kiriye.

**Ristemê Zal**  
*Xurşîd Mîrzengî*  
Weşanên Rewşen

## Şûjin

Şûjin kitêba Dr. Cuwan Batû ya pêşî ye. Cuwan Batû bi xwe bi-jîjk e, lê ji mêj ve ye di nava karê çapemeniyê de ye. Ew redaktorê kovareke bi navê "Rojbaş" e û di dema weşana *Kurdistan Pressê* de jî yek ji nivîskarên wê yê berdeham bû. Dr. Cuwan Batû bi zimanekî edebî û naverokekê îronî, civat û karakterê kurdan li bêjîngê dixê.

**Şûjin**  
*Dr. Cuwan Batû*  
Weşanên APECê

## Filozof

Filozof romana serpêhatiya Fehmiyê Bîlal ê Licî ye.

Jiyan û têkoşîna Fehmiyê Bîlal wek şeweya romanê li hevdu hatiye hûnandin. Di berga paşîn a pirtûkê de nivîskar Lokman Polat dibêje: "Mîna di vê berhemê de behsa serpêhatiyên edîp, zana û ronakbîrê kurd, katibê Şêx Seidê nemir, filozof û welatparêzê mezin, Fehmiyê Bîlal kiriye. Ev tiştên ku min behs kirine hemû jî tiştên rast yên dîrokî ne. Lê gelek tiştên xeyalî jî tê de hene."

**Filozof**  
*Lokman Polat*  
Weşanên Çanda Nûjen

## Çil Hedîs

Selman Dilovan kitêba **Newlewî** ya bi navê Çil Hedîs ji erebî wergerandiye kurdî û tevî erebiya wê daye çapê. Ji bilî Quranê Hedîs jî ji bo misilmanan çavkaniyên pîroz yê bingehîn in. Ev kitêba biçûk bi sedsalan e ku li medreseyan tê xwendin û gelek şagirtên medreseyan wan ji ber dizanin. Mîna tê zanîn gelek Hedîsên Cenabê Pêxember hene û Kamran Bedir-Xan jî di dema xwe de zêdeyî heftsed hedîs wergerandibûn kurdî.

Selman Dilovan bi lêhûrbûneke cidî ev Hedîs kirine malê zimanê kurdî.

### Çil Hedîs

*Imamê Newlewî*  
Wergera ji erebî:  
*Selman Dilovan*  
Weşanên Nûbiharê

## Gotina mêrê kurd gotin e

Nivîskarê pirtûkê Elî Cefer binxetî ye, di gelek kovarên kurdên binxetê de nivîsên wî hatine

weşandin û niha li Almanayê dijî. Ev berhema ha mîna çîrok berhema wî ya pêşî ye. Elî Cefer di vê berheme de zimanekî hêsan bi kar aniyê.

### Gotina mêrê kurd gotin e

*Elî Cefer*

Weşanên Çanda Nûjen

## Kurdên Haymanayê

Kurdên Konyayê kî ne,? Kengî li wir bi cih bûne? Ji ku koçî wir kirine? Ev pirsên wilo hê jî li bersivan digerin û kurd bi xwe jî hê baş bi ser dîroka wan û sebebê koça wan venedûne. Lê rastiyeke heye ku li der û dora Konya û Ankarayê bi hezaran kurd hene, gundên wan hene û wan kurdan zimanê xwe, kultura xwe û rabûn û rûniştina xwe parastine. Bi taybetî jî piştî weşana kovara Bîrnebûnê em hê bêtir di derbarê wan kurdan de haydar bûn.

Ev kitêba Georges Perrotê fransî ku Fawaz Husên ji zimanê fransîzî wergerandiye kurdî gotareke dîrokî ya di derbarê kurdên Haymanayê

de ye. Bi riya vê kitêbê mirov hindik be jî di derbarê kurdên Haymanayê û karaktera kurdan de dibe xwe-diyê agahdariyan.

### Kurdên Haymanayê

Georges Perrot  
Weşanên APECê

## Çîrokên kurmançî

Pirtûka Aleksander Jaba (Çîrokên Kurmançî) 140 sal berê li St. Petersburgê hatiye weşandin. Ev cara yekem e ku bi tîpên latînî-kurdî jî nû ve tê weşandin. Pirtûkeke balkêş e. Berî bi 140 salî kurd bi çî awayî dipeyivîn û di wê demê de kîjan peyv bi kar anîne, hemû jî di pirtûkê de hene. Di pirtûkê de 40 çîrokên kurdî yên ku di wê demê de di nav gel de hatine gotin hene. Aleksander Jaba ev çîrokên gelêrî ji nav gel kom kirine, civandine ser hev û wek pirtûk weşandiye. Ev pirtûka Aleksander Jaba jî aliyê Cankurd ve bi alfabe-ya kurdî-latînî hatiye amadekirin.

### Çîrokên kurmançî

*Aleksander Jaba*  
Weşanên Çanda Nûjen

# Ji weşanên Nûdemê du kitêbên nû

## MIRCANA QELEW

Guy de Maupassant



NÛDEM

### Mircana Qelew

Guy de Maupassant (1850-1893) yek ji nivîskarên fransîz yê bi nav û deng e. Wî di jiyana xwe ya kurt de berhemine nemir li dû xwe hiştin; cildêk şîr, sê cildê gername, sêsed çîrok, şeş roman û komêk gotarên rojnameyan... Mircana Qelew çîroka Maupassant ya pêşî ye û bingehê nivîskariya wî ye. Wî bi vê çîroka xwe li seranserî Fransayê deng da û rexnegirên wê demê mezinahiya wî di vê çîroka wî de dîtin. Serdar Roşan ew mezinahî kiriye malê zimanê kurdî jî. Weşanxaneya Nûdemê ku bi avakirina pirek xurt ya di navbera zimanê kurdî û edebiyata dinyayê de mijûl e, bi weşandina vê berhemê dixwaze careke din balê bikişîne ser zimanê kurdî û deriyê zimanê kurdî jî edebiyata dinyayê re veke.

## LAWKÊ XERZÎ

Mahmûd Baksî



NÛDEM

### Lawikê Xerzî

Ev kitêba Mahmûd Baksî berê bi zimanê Eswêdî derketibû lê bi alîkariya Firat Cewerî ew li kurdî hatiye wergerandin. Mahmûd Baksî di vê kitêba xwe de behsa zaroktiya xwe dike û berhem bi forma şexsê yekemîn nivîsandiye. Mahmûd Baksî di siya serpêhatiya zarokê kurd de resimekî welêt yê sosyo-psîkolojîk radixe ber çavan; hatina kapîtalîzmê û bi wê re berberiyên siyasî û civakî bi hostetî tîne zimên.

Weşanên Nûdemê

Box 177

177 23 Järfälla-SWEDEN

E-mail: nudem@telia.com

of the study. The authors are grateful to the staff of the Department of Health, Education and Welfare, Government of the Hong Kong Special Administrative Region, for their assistance in the data collection. The authors also thank the staff of the Department of Health, Education and Welfare, Government of the Hong Kong Special Administrative Region, for their assistance in the data collection.

## References

- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 1995. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 20 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 1996. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 21 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 1997. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 22 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 1998. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 23 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 1999. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 24 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 2000. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 25 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 2001. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 26 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 2002. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 27 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 2003. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 28 (1): 1-14.
- Abma, J. C., and J. A. Schmitz. 2004. "The Health and Retirement Study: A National Longitudinal Study of Health and Retirement." *Journal of Health Politics, Policy and Law* 29 (1): 1-14.

## Authors' Biographies

**Joseph S. H. Cheung** is an associate professor and teaches Health Economics in the Department of Health, Behavior and Society, Johns Hopkins University. He is also a senior research advisor at the Center for Communications Programs, Johns Hopkins University.

**Joseph A. Schmitz** is an associate professor and teaches Health Economics in the Department of Health, Behavior and Society, Johns Hopkins University. He is also a senior research advisor at the Center for Communications Programs, Johns Hopkins University.

**John A. Franks** is an associate professor and teaches Health Economics in the Department of Health, Behavior and Society, Johns Hopkins University. He is also a senior research advisor at the Center for Communications Programs, Johns Hopkins University.

**John A. Franks** is an associate professor and teaches Health Economics in the Department of Health, Behavior and Society, Johns Hopkins University. He is also a senior research advisor at the Center for Communications Programs, Johns Hopkins University.

**John A. Franks** is an associate professor and teaches Health Economics in the Department of Health, Behavior and Society, Johns Hopkins University. He is also a senior research advisor at the Center for Communications Programs, Johns Hopkins University.

**John A. Franks** is an associate professor and teaches Health Economics in the Department of Health, Behavior and Society, Johns Hopkins University. He is also a senior research advisor at the Center for Communications Programs, Johns Hopkins University.

**John A. Franks** is an associate professor and teaches Health Economics in the Department of Health, Behavior and Society, Johns Hopkins University. He is also a senior research advisor at the Center for Communications Programs, Johns Hopkins University.

WAR

WAR

# HAWAR

2

Hejmar 24-57  
(1934-1983)

1

2

NODEM